# *Lokman Polat*

# *Girîna Kurdî*

***Novel***

**Helwest Förlag**

Helwest Förlag

ISBN : 978 - 91 - 89224 – 85 - 8

Editor : M. Beşîr

Çap : Peknotryck ofsset

Çapa yekem : 2009 – Stockholm

Adres / Navnîşan
Tensta Alle 43. 2tr.
16364 Spånga / Sweden

lokmanpolat-1@hotmail.com

helwestforlag@hotmail.com
lokmanpolat2000@yahoo.se

## *PÊŞKÊŞÎ*

Edebiyat qalkirin û ravekirina însan e.
Di berhemên edebî de behsa însanan, jiyan, serborî û serpêhatiyên wan û herweha têkiliyên wan ên bi civakê re bi şêweyeke edebî tê ravekirin.
Min jî di vê pirtûkê de vî tiştî kir.

Kurtenovelên di vê pirtûkê de ne, neweke çîrokên gelêrî yên kurdan e. Weke ''masal'' a tirkan jî nîn in. Ev kurtenovel novelên nûjen – modern - yên ku li ewropayê jî jê re dibêjine novel. Bi kurdî jî mirov dikare ji yên kin re bibêje kurtenovel û ji yên dirêj re jî bibêje novel.

Di van novelên nûjen de dîmenek ji rewşa sosyal û civaka kurdan tê pêşkêşkirin. Hinek hêlên realîteya civaka kurd bi şêweyeke edebî hatiye ravekirin.
Girîna kurdî û novelên ku di pirtûka ''Girîna Kurdî'' de ne, bixwînin û bila dilê we bi halê kurdên koçber bişewite. Rewşa kurdên bakur, feqîrî û belengaziya gundiyên kurd ên reben, zahmetiya kurdên koçber û zilm û zordariya dewleta dagirker ji bîr nekin.

Ji bo azadiya gel û rizgariya welat çi pêwîst be divê kurd wê bikin. Divê edebiyata kurdî jî bibe haceteke ragihandinê û parastina ziman, çand û edebiyata netewa kurd û di xizmeta wê dozê de be.

*Lokman Polat*

# GIRÎNA KURDÎ

Ez di nav parka ciwanan (genclik park) ya Ankarê de digeriyam. Ez ber bi alî daran ve çûm, min xwest ku ez di bin siya dareke de rûnîm. Dengê girînê hate min.

Min li derûdora xwe mêze kir, kesek nedît. Li wî aliyê din dareke mezin hebû, qurmê wê qalind bû û deng ji pey qurmê darê dihat. Dema dengê girînê tê min, kezeba min dişewite, ez gelek xemgîn dibim û giriyê min tê.

Ez ber bi qurmê darê ve çûm. Dengê girînê ji wir dihat, lê girîn girîna kurdî bû. Hûn ê bibêjin girîn girîn e, ma girîna kurdî jî heye? Belê, girîna kurdî heye. Girîna kurdî ji girîna xelkên din cudatir e. Girîna kurdî taybetiyeke xwe heye. Girîna kurdî wek lorîyên stranan, wek melodiya muzîka bi huzn û keder, bi êş e. Di girîna kurdî de awazên derbirînên ji dil heye. Girîn, qêrîn û hawara jinên kurd, dil û kezeb li mirov dipirtîne. Jinên xelkên din nikarin û nizanin weka keç û jinên kurd bigrîn.

Ez çûme nîk qurmê darê, min mêze kir ku waye keçeke ciwan li ber wê darê rûniştiye, pişta xwe daye darê, digrî û dilorînê. Lorandina giriyê wê bi kurdî bû. Ew hem digrîya û hem diloriya û digot :

”Haware dayê,
heware bavo,
ez pepûka reben,
ez ê çi xwelî li serê xwe kim,
ez ê çawa li rûyê we binêrim,
ay bavo, ay dayê.”

Min li keçika ciwan mêze kir û hinek gohdariya lorîyên wê yên bi êş, bi derd û kul kir, dil û kezeb li min şewitî. Ez jî pir dilşewat im. Dilê min jî pir şewitî. Hêstirên çavên min herikîn. Ez jî girîyam. Ez li cem wê rûniştim. Ew girîya û ez girîyam. Ji girîna wê min zanibûm ku ew keçeka kurd e û di rewşeke xirab de ye. Wê ferq kir ku ez jî pê re digrîm, wê hêstirên çavên xwe paqij kir û ji min re bi tirkî got :

- Çima tu digrî?

Min bi kurdî bersîva wê da û got :

- Çima ez negrîm? Ez bi halê te û bi halê kurdên feqîr, reben, belengaz û koçber digrîm. Rewşa kurdan, halê kesên wek te min digirînin.

Ji bo ku min bi kurdî jê re van gotinan got, wê jî dest pê kir û bi min re bi kurdî axifî. Wê got :

- Tu jî weke min kurdî û li xerîbiyêyî. Vî bajarê roma reş me xwar, ecêba nedîtî anî serê me.
- Belê, bajarê xelkê ji me re nabe cih û war. Em kurd li van bajaran perîşan bûn. Xuyaye bûyereke xirab hatiye serê te. De ka derdê xwe ji min re bibêje. Ez jî bibim şirîkê derd û kulên te. Belkî ez bikaribim bi te re bibime alîkar.
- Birako, derdê min pir e. Ez li ber malbata xwe dikevim. Ez ê çawa li rûyê dê, bav û birayên xwe binêrim?...
- Ka rabe, em ji bin vê darê biçin li kafeteryayê rûnîkin û tiştek vexwin. Belkî tu birçîyî. Em biçine aşxanê.
- Na, spas. Ez birçî nînim. Lê, em biçin û çayek vexwin. Ez ê ji te re serpêhatiya xwe qal bikim.

Em ji bin darê rabûn, çûn û li kafeterya parkê rûniştin. Min û dostekî xwe wext dabû hevûdu. Me dê di saet pêncan de hevûdu li ber deriyê parkê bidîtana û em ê bi hevre biçûna li cihek rûniştana û sohbet bikira. Dostê min li Ankarê doktor bû. Ez ji bo dîtina birayê xwe ê ku li zindanê hepisxaneya f- tîpî ya li Sincanê bû û 36 sal ceza lê hatibû birîn, 12 salên wî qediyabû ku ew anîbû Ankarê. Min li hepisxanê birayê xwe didît û li nav Ankarê jî min hinek nas û dostên xwe ên din didîtin. Keça apê min jî li Ankarê avukat bû û ez li mala wê dimam.

Ez û keçika ku di bin darê de digrîya çûn, li kafeteryayê rûniştin. Me ji xwe re çay xwest. Garsonê qahwê çaya me anî. Min ji keçikê re got :

- Navê min Lokman e. Ez ji Amedê – Diyarbekirê – me. Ez wek mêvanî hatime vir, ez ê ji vir jî biçime Stenbolê.

Wê jî got :

- Navê min jî Dîlan e. Em ji Serhedê ne. Lê, niha di vî bajarî de dimînin.
- Ka bibêj, çibû? Çi hatiye serê te?

Keçikê dest pê kir û yekoyek ji min re bahs kir. Dema wê behsa serpêhatiya xwe dikir, ji çavên min histêr dihatin xwarê, ez bêdeng digrîyam. Keça kurd ku navê wê Dîlan bû, weha got :

- Malbata min ji ber zilm û zordariya dewleta romê ji gund koç kir. Li Ankarê dostekî bavê min hebû. Em hatin cem wî. Navê wî Xalê Mihemed e. Wî ji me re xaniyekî ku li vir jê re dibêjin "gecekondî" dît. Xanî kevn bû û kiriya xanî erzan bû.

  Bavê min li kar geriya, lê tu karekî nedît. Wî carna ameletî dikir û pê debara me dikir. Lê, roj hebû ku nan tunebû em bixwin. Em du xweşkin û birayekî min heye. Bapîra min jî kale û li cem me dimîne. Em şeş nifûz, me li destê bavê min dinêriya.

Birayê min bû tolaz. Ew li kuçan bûbû aware û di kuçan de beredayî digeriya. Wî dizî kir û kete hepisê. Bavê min mecbûr bû ku wî di hepisxaneyê de xwedî bike. Birayê min li hepisxanê bi kesên siyasî ên ku doza kurdan diparêzin re têkilî danîbû û bûbû hevalê wan. Piştî ku ew ji hepisê derket, çendeke li malê ma û paşê malê terk kir û çû. Ew bi kuve çû, em nizanin. Hinek dibêjin çûye çiya û ketiye nav hêza çekdaran, hinek jî dibêjin di bajarekî din de xebata siyasî û rêxistinî dike. Lê, me tu xeberek jê wernegirt.
Piştê çûna birayê min, bavê min nexweş ket. Bavê min ji birayê min gelek hez dikir û lewre jî wî meraq dikir. Ji bo ku bavê min nexweş ket û êdî nikaribû ameletî bike, min û diya xwe, me karê paqijî û cil şûştinê kir. Mala ku me ji wan re paqijî dikir, ji bo min di atolyeke cildirûnê de kar dîtin. Min di atolya cildirûnê de dest bi kar kir. Meaş baş bû, me pê îdara xwe dikir. Dema ez li atolyê bûm û dişûxuliyam, min bala şefê atolyê kişandibû. Wî çav berdabû min û ew tim bi min re mijul dibû. Wî carekê pereyeke baş da min û got “ev îkramîye ye, te heq kiriye. Tu baş kar dikî, lewre jî îkramîye heqê te ye.” Dema min perê îkramiyê girt, min ji diya xwe re fistan û ji bavê xwe re pantor û ceket kirî. Ji bo kirîna van diyariyên min gelek keyfa dê û bavê min hat.

Piştî koçberiya me, ev cara yekem bû ku bavê min rûken bû. Ji keyfan hêstir di çavên wî de hatin xwarê. Wî ez hemêz kirim, eniya min ramîsa û got : "Min ê van rojan jî bidîtana. Ez nexweş û li destê keça xwe dinêrim, mihtacê wê me. Xwezî birayê te jî li vir bana û wî jî ji xwe re karekî bikira."

Ez li atolyê dixebitiyam, lêbelê şef min rehet nedihêşt. Wî xwarin didane min, ji min re diyarî dikirî û digot : "Ez ji te hez dikim. Dilê min ketiye te. Ez bûme aşiqê te." Min jî wî îdare dikir. Min newêrbû li dijî derkevim. Ew dikaribû behaneyekê bibîne û min ji kar bavêje. Pêwîstiya min jî bi kar hebû. Ez mihtacê kar bum, malbata min li destê min dinêriya, ew bi hatina min anku bi meaşê min xwedî dibûn.

Şefê atolyê yekî navsal bû. Temenê wî çilûpênc salî bû. Ew zewicandîbû û zarokên wî hebûn. Wî ji min re digot : "Erê, ez zewicandîme, lê nekû ez te weke jina duyem tînim. Ez ê wê berdim. Min ji bo veqetandinê mahkeme vekirîye, ez ê ji jina xwe veqetim û bi te re bizewicim."

Wî rojeke min ji atolyê bi xwe re bire malekê. Wî malê bi min nîşan da û gote : "Ev mala me ye. Êdî tuyê bi min re di vê malê de bijî." Min jî jê bawer kir. Wî digot : "Mahkeme biryara

veqetandinê bide, ez ê te bi fermî ji malbata te bixwazim û emê bi adet û ûsûl bizewicin." Hevaltiya min û wî dom dikir. Lê, wî hêj qet destê xwe nedabû min, bi min re ranezabû. Wî carna min maçî dikir û hew.

Rojeke ew hat, min ji cihê kar girt û ji min re got : "Mizgînî, mahkemeyê biryar da, ez ji jina xwe veqetiyam. Hevalekî min jî li benda me ye. Em ê niha biçine mala we û te ji bavê te bixwazin."

Ev mizgîniya wî gelek keyfa min anî. Wî ji sukê –çarşiyê – diyarî kirî, hevalê xwe dît û em çûn mala me. Wî û hevalê wî, min ji bavê min xwestin. Lê, bavê min ez nedam. Di nav me de temeneke mezin hebû. Ez bîst salî û ew çilûpênc salî. Di gel vê jî hinek sedemên din hebûn ku bavê min ez nedam.

Bavê min di metbexa me de ji min re got : "Ev zilamekî tirk e. Ez naxwazim keça xwe bidime tirkekî. Wekî emir – temen – ew ji te bîstûpênc sal mezintir e. Ma keça min di malê de maye ku ez bidim vî zilamê navsalî." Diya min jî razî nebû û got : "Min ji der û ciranan û ji kurdên koçber ên ku hatine vir bihîstiye. Dibêjin tirk pir li jinên xwe dixin. Jina ku ji mêrê tirk lêdan nexwe tune. Kurd zû bi zû dest li jinan ranakin, lê tirk

newihane. Ji xwe çavên min jî vî zilamî nebrî. Ev zilamekî dexes xuya dike. Dibe ku bêbext be." Diya min sedemên din jî got ku divê min nede vî zilamê tirk. Diya min got : "Keça min bi vî zilamî re bizewice, dê zarokên wan bibin û hemû bi tirkî biaxifin. Ez ê nikaribim bi wan re biaxifim." Diya min tirkî nizane. Min li dibistana gund xwendibû û ez fêrê tirkî bûbûm.

Welhasil, malbata min ez nedame zilamê tirk ê şefê atolyê. Şef gelek aciz bû, qeherî, bi min re şer kir û got : "Min ji bo te jina xwe berda. Ez ê te ji kar bavêjim û paşê jî ez ê te birevînim û bi zorê xirab bikim. Ez nahêlim tu bibî yara yekî din."

Min mêze kir, ew dê min ji kar biavêje, em ê perîşan bibin. Ew dê paşê dest bavêje namûsa min, ez ê rezîl û riswa bibim. Min dev ji malbata xwe berda û ez çûm cem wî. Beriya ku ez biçim, min ji diya xwe re got ku ez diçime. Lê, ez ê ji we re her meh pere bişînim.

Li cihê kar, jineka kurd hebû. Em bûbûn heval. Min wê dît û ez bi wê re şêwirîm. Wê got : "Tu şaşî dikî. Pên li malbata xwe neke û li pey vî zilamî neçe. Dev ji malbata xwe bernede û nekeve pey

zilamê xelkê. Ew ê bi te re demeke bilîze û paşê pêhn li te xe, te bike der. Lê, heger tu îla dixwazî bi vî zilamî re bijî, qet nebe jê daxwaz bike, bila nîkaha zewaca fermî çêbike."

Ji naşînî û neçariya xwe, ez çûm bi şef re – ku navê wî Zeydîn bû – jiyam. Min daxwaza nîkaha fermî lêkir. Min jê re got : "Heta ku tu nîkaha fermî çênekî, ez bi te re nazewicim û ranazim." Wî xwest ku min biewqîne, lê dît ku înada min kurd înadîye, mecbûr ma nîkaha fermî çêkir, em zewicîn.

Xwezî ez pê re nezewiciyama. Wê zewacê jiyan li min heram kir, di firnikê min de derxist. Wî hertim li min dixist. Roja ku min jê lêdan nexwarana ji bo min cejn bû. Wî araq vedixwar, serxweş dibû û li min heqaret dikir, bi kulm û sîlan li min dixist. Carna weke mirovên sadîst bi min eşkence dikir. Derdê wê lêdana nedihate kişandin, lê ez ji neçariya xwe pê re dimam. Cihê min ê ku ez biçim tunebû. Malbatê min ji ewladiya xwe avêtibû. Di hêlek de min heq kiribû ku ez vê eşkence û cefayê bikşînim.

Cîraneka me hebû. Jinik tirk bû lê bi yekî kurd re zewicî bû. Wê zanibû ku mêrê min ê tirk tim li min dixe. Min hewya xwe bi wê dianî. Jinikê

digot ”Mêrê min heta niha qet yek carek jî li min nexistiye. Xuyaye ev lêdana jinan li cem tirkan weke adetî ye. Xweşka min bi yekî tirk re zewiciye ew jî ji mêrê xwe lêdan dixwe. Xwezî ew jî bi yekî kurd re bizewiciyana.”

Heft, heşt meh di ser di ser zewacê re derbas bûn. Piştî du mehên pêşîn ez hemîle mam. Min pêşî jê re negot ku ez hemîle me. Paşê ku zikê min mezin bû, wî ferq kir ku ez hemîle me. Wî xwest ku ez hamlê xwe anku bebikê ji ber xwe bikim. Kurtaj bibim. Min qebûl nekir. Piştî zewaca me, heşt meh derbas bû, tayina wî derket bajareke din.

Wî ji min re got ku tayina wî derketiye û divê biçe. Wî hinek pere dan min û ji min re rastiya xwe got. Ew ji jina xwe veneqetiyabû. Wî ez xapandibûm. Nîkaha me ya fermî jî saxte bû. Wî xwest ku êdî têkiliya xwe ji min bibre. Xaniyê ku em têdebûn, kirê bû û wî xanî teslîmê xwedî kir. Wî bêbextî li min kir û ez xapandim. Wî ez li erdê hêştim û çû. Niha ez li kûçê mame. Derdê min giran e. Girîna min ji bo vê yekê bû. Ez newêrim biçim mala bavê xwe. Piştî ku ez ji malê reviyam û li hemberê malbata xwe derketim û çûm cem vî zilamê bêbext, bavê min ji min qehirî û ez ji ewladiya xwe avêtim. Wî gotibû ”êdî ew

keça min nîn e.” Ez ê reben, niha çi bikim. Di zikê min de pîçê wî bêbextî heye.

Min bi meraq gohdariya wê kir. Dil û kezeba min bi halê wê şewitî. Ez ji xwe re fikirîm, ez ê çi bikim? Ez ê çawa ji vê keça kurd re – ku ecêb û sosret hatiye serî – alîkarî bikim? Wexta hevûdu dîtina min û hevalê min ê doktor jî hatibû. Ez ji bo li parkê bigerim zû hatibûm û rastê girîna keçikê hatibûm. Niha wexta hevdîtinê bû. Divê me hevûdu li ber derîyê parkê bidîtana. Min ji Dîlanê re got :

- Binêr, bi qasê ku ji destê min bê, ez ê bi te re bibim alîkar. Divê niha ez û hevalekî xwe î doktor hevûdu li ber deriyê parkê bibînin. Tu jî were, em bi wî re jî bişêwirin. Heger tu bixwazî ew dikare bibe alîkar ku tu hamlê –bebikê- ji ber xwe bikî. Paşî jî em dikarin bi malbata te re biaxifin û wan îqna bikin ku te dîsa wek ewlad qebûl bikin.
- Baş e. Gelek spas. Ez hêvîdarim ku hûn ê bi min re bibin alîkar.

Em ji kafeterya nav parkê rabûn, çûn û li devê deriyê parkê sekinîn. Doktor hat. Me hal û hewalên hev pirsî. Min Dîlanê pê da nasîn. Em çûn li restoranteke rûniştin. Me xwarin xwar. Min mesela Dîlanê ji doktor re bahs kir. Ew jî gelek li ber ket, dilê wî pê şewitî. Wî soz û

peyman da me ku ew dê bi her awayî bi Dîlanê re bibe alîkar. Em ji restorantê rabûn, çûn û li mala doktor man.

Me bi alîkariya doktor, pêşî hamil –bebikê- ji ber Dîlanê girt, wê kurtaj kir. Di gel ku rewşa min a aborî nebaş bû jî, min heqê mesrefa kurtajê da. Doktorê hevalê min wê kurtaj nekir, yekî din kir û lewre jî me heqê wî da. Yanî yê ku wê kurtaj kir doktorekî din bû û bi erzanî be jî dîsa min heq da, ew derman kir û min gelek derman kirî.

Ez ji bo du rojan çûbûm Ankarê, lê ji ber problema keça kurd Dîlanê, ez li wir heftêk mam. Min rewşa Dîlanê ji keça apê xwe ya avukat re bahs kir. Wê got : "Ez dikarim dawa li zilam vekim. Lê, divê şahid hebin."

Ez û doktor, me Dîlanê da pey xwe û em çûn mala bavê wê. Bavê wê nexweş bû, di nav livînan de bû. Doktor wî muayene kir, receta dermanan nivîsî. Paşê min mesela keça wî vekir û me wî îqna kir ku ew keça xwe qebûl bike, wê di kuçan de nehêle.

Bavê Dîlanê got :

- Ew keça min nîn e. Wê me red kir û li pey zilamê tirk çû. Tirk romî ne, bêbextin. Waye wê li erdê hêşt û çû.

Min jî jê re got :

- Keça ciwan bû, naşîn bû, şaşiyeke kir. Lê, wê ji bo we vê şaşiyê kir. Ew ji bo we xwedî bike, xwe avêt nav agir.

Min mesela gotinên şefê atolyê ku ji Dîlanê re gotibû ”ez ê te birevînim û xirab bikim” jî ji bavê Dîlanê re got. Ew hêrs bû, mêraniya wî ya kurdîtiyê wî girt û got :

- Sedbavê wî jî rabana nikaribû keça min birevîne. Wî hewldana tişteke weha bikira, min ê heft gule di serê wî de vala bikra. Wî nikaribû bi me xirabî bike, lê keça min vê xirabiyê kir. Keça min bi lingên xwe çû cem wî segbavî. Ez ji bo vî tiştî qehirîm.
- Xalo di van bajarên mezin de mêrxasiya kurdan pere nake. Li vir fen û fûtên ruviyan pere dike. Li van bajaran şêr bi kuçik û ruviyan didine xenqandin. Wî zilamî dikaribû bi keça te xirabiyek bike. Heger wî wê birevandana, xirab bikirana û bi serde jî bifrotana, bidana tacirên jinan yên ku laşê jinan difroşin, yan jî bifrotana kerxanê û kaxiz pê bi zorê bidana îmze kirin û wê bixistana bin deyn, te dê wê çawa xilas bikira? Yan jî, wî bekaretiya wê xirab bikira û di ser te de bişiyandana, dê te bigota ev mesela namûsê ye û te dê keça xwe bikujtana.

Min ji bavê Dîlanê re behsa gelek neheqiyên ku li keçên kurd hatine kirin wek mînak got û min wî îqna kir ku divê ew keça xwe qebûl bike, wê li derve nehêle. Her weke ku mêr kir û mêrê wê ew berda û ew jî vegeriya mala bavê xwe.

Bavê Dîlanê qebûl kir ku dîsa weke berê keça xwe di mala xwe de bihewîne û ew bi hevre bijîn heta ku keçik ji xwe re mêrekî din bike û ji nû ve bizewice. Keçik û diya xwe li metbexê bûn. Me bangê keçikê kir, ew hat, destê bavê xwe maçî kir, bavê wê jî eniya wê maçî kir û weha li hev hatin.

Ez ji Ankarê çûm Stenbolê. Li wir jî heftêk mam û hatim Amedê. Demeke derbas bû, rojeke zengila telefona destê min a destan lêxist. Min telefonê vekir, Dîlan bû. Wê hal û hewalê min pirsî û paşî ji min re got :

- Spas ji bo alîkariya te. Ez başî û çeyiya te qet ji bîr nakim. Ez bi kurê apê xwe re zewicîm.”

Dîlanê ji min re spas kir ku min wê ji kuçan xilas kiribû û malbata wê îqna kiribû. Nexwe dê li kuçan gelek xirabiyên din bihatana serê wê.

Min zewaca wê pîroz kir û jê re serfirazî xwest.

# AX KEÇA MIN

Min Nêrgizê di mala dostekî xwe de dît. Ez çûbûm Stenbolê. Dostê min Hemdîn li Stenbolê bû. Dema min wî dît, pir keyfa wî hat û gelek îsrar kir ku ez bibim mêvanê wî. Min xatirê wî neşkand û ez ji bo şevekê bûm mêvanê wî.

Em ber bi êvarê çûn mala wî. Xanima wî hinekî nexweş bû, lê Nêrgizê ji bo karê nav malê bi wan re alîkarî dikir. Nêrgiz jineka navsal bû, feqîr û belengaz bû. Ji bo kar û paqijiya malê heftê çend rojan dihat û di mala Hemdîn de dixebitî. Hemdîn heqê wê didayê.

Hemdîn di mala xwe de li gor adetên mêvanperweriya kurdan, ji min re îzet û îkram kir. Wî zanibû ku ez bi karê nivîsê re mijul dibim. Loma jî wî ji min re got :

- Ev jina ku paqijiya mala me dike, gelek derd dîtiye û êş kişandiye. Tu gohdariya serboriya wê bike, tu dikarî ji ber serpêhatiya wê çîroka wê binivîsî.
- Belê, di çavên wê de diyare ku ew bi derd û kul e.
- Pê re biaxife. Bila ew ji te re behsa xwe bike.
- Ew dê qebûl bike? Belkî şerm bike yan jî nexwaze ku behsa xwe bike.
- Ka ez jê re bibêjim bê çi dibêje...

Nêrgiz li metbexê bû. Em li salonê rûniştibûn. Dema tiştek pêwîst bana, wê dianî û dîsa diçû metbexê. Hemdîn çû metbexê û pê re xeber da. Piştî çend deqîqeyan Hemdîn hat û ji min re got :

- Min pê re xeber da. Wê qebûl kir, ew dê derdê xwe ji te re bêje. Tu hinek alîkariya wê bikî û pere bidî pê baş dibe.
- Temam. Baş e, ez ê pere bidime wê.

Hemdîn dîsa çû metbexê û ew bi xwe re anî salona rûniştinê. Min lê mêze kir, bi rastî jî ew pir bi derd, kul û keder bû. Min jê re got :

- Xweşka min, diyare ku te gelek derd dîtiye. Ka ji min re derdê xwe bêje. Belkî ez karibim ji te re bibim alîkar.
- Spas. Tu rojnamevanî?

- Na, ez rojnamevan nînim. Lê, ez bi kurdî pirtûkên çîrokan dinivîsim. Heger tu bixwazî ez ê çîroka serpêhatiya te binivîsim. Lê, ku tu nexwazî ez nanivîsim.
- Binivîse. Bila kurd zanibin bê wê şerê qirêj, zilm û zordariya askerê romê û koçberiyê çi anî serê me gundiyên reben. Gohdarî bike, ez ê ji te re qal bikim.

Nêrgizê dest pê kir û derd û kulên xwe ji min re gotin. Dema wê qal dikir, ew digriya û digot "wax li min porkurê, wan çi anî serê me." Min jî gohdariya wê dikir û ez gelek xemgîn bûm. Ji ber xwe ve ji çavên min hêstir hatin xwarê. Xwedêyo bê ev şerê qirêj yê li dijê gelê kurd û koçberiya ji gundên kurdan çi felaket anîbû serê malbatên gundiyên kurd.

Niha binêrin bê çi hatiye serê Nêrgizê.

Navê min Nêrgiz e. Ez ji gundê Xerzan im. Di dema şer de hinek gundiyên me bûn cerdewan û hinek nebûn. Yên ku nebûn, ji destê cerdewanan û hêzên dewletê zilm û zordarî dîtin. Mêrê min û tiyê min nebûbûn cerdewan. Yê tiyê min çar zarokên wî hebû. Şevekê çekdarên çiya hatin gund û bûn mêvanê me û mala tiyê min. Cerdewan û muxtarê gund pê hesiyan ku komek çekdar hatine gund. Muxtar bitelefon û têlsizê xeberê dabû askeran.

Wê şevê çekdar neçûn çiya û li nav gund di mala me û mala tiyê min de man. Destê serê sibê, askerê romê hatin gund, çarmedorê gund girtin. Di navbera wan û çekdaran – wan ji xwe re digot gerîlla û me ji wan re digot pêşmerge û dewletê ji wan re digot terorîst– de şer derket. Dawiya şer çend asker hatibûn kuştin, du cerdewan û çar çekdar hatibûn kuştin. Me cendekê hemû askeran nedît loma ez nizanim hejmara askerên kuştî çend bûn. Wan bi helîkopterê askerên birîndar û yên mirî radikirin û dibirin.

Ji bo ku du cerdewan hatibûn kuştin, mirovên cerdewanan me sucdar kirin û gotin "heger we wan nehewandana, li mala xwe nekirana mêvan dê ew li gund nemana û biçûna. Dê herdu zilamên me jî nehatana kuştin. Sebebê kuştina wan hûn in."

Dewleta romê fenker e, kurdan bi kurdan dide kuştin. Wan cerdewanên gundan pêk anîn, bi maeşeke hindik weke hestî biavêjî ber kuçikan hinek pere dane wan û wan li hemberê birayê wan dane şerkirin û kurd bi destê kurd dane kuştin. Gundiyên cerdewan û yên necerdewan bûbûn dijminê hevûdu. Ev jî li hesabê dewletê dihat. Di gelek gundan de gundiyên cerdewan yên ku çekên dewletê hilgirtibûn bi wan çekan gundiyên ku nebûbûn cerdewan dikujtin, malên wan talan dikirin, erd û zeviyên wan dişewitandin, keçên wan

direvandin û tecawizê namûsa wan dikirin. Wan dixwest ew ji gund birevin û biçin û malên wan ji cerdewanan re bimîne. Yên ku nediçûn jî cerdewanan dest didane ser mal û milkên wan. Yên ku koç kiribûn ji xwe malên wan ji cerdewanan re mabû.

Dewletê jî zor didane gundiyên necerdewan ji bo bibine cerdewan û yan terka gund bikin. Em jî neçar man ku emê yan bibine cerdewan û yan ji gund koç bikin. Ji bo ku çekdar hatibûn mala me û di gund de şer derketibû û gelek hatibûn kuştin, askeran mêrê min girtibûn û kiribûn hepisxaneyê. Mêrê min çend meh li hepisê ma û wî berdan. Muxtar di mahkemê de gotibû "sucê wî tune. Çekdar bi zorê li mala wî mane. Wî bi dizîka xeberê daye min û min jî xeber daye qereqola askeran." Loma jî mêrê min berdan.

Erê, mêrê min berdan, lê vêca çekdarên çiya bûn dijê me. Qey li adliyê zilamên wan hebûye û xeberê daye wan ku xwedêgiravî mêrê min îxbara wan kiriye û bûye sedemê kuştina çar gerîllan. Lê, ev nerast bû. Mêrê min îxbara wan nekiribû. Wan biryar dabû ku mêrê min û muxtar bikujin.

Me xwe amade kir ku em ji gund koç bikin. Nasekî tiyê min li Stenbolê bû. Tiyê min çû cem ku li wir du xanî bibîne, kirê bike û bê me bibe wir. Tiyê min heta ku çû Stenbolê û hat, mêrê min li biniya gund kete kemîna

hinekan û hate kuştin. Me nizanibû bê kê ew kuşt. Gelo cerdewanên gund yan çekdarên çiya ew kuştin? Me nizanibû. Piştê kuştina mêrê min, du roj paşê vêca muxtarê gund kuştin. Muxtar ji alî çekdarên çiyê ve û bi eşkere hate kuştin. Çekdaran ji me re gotin ku wan mêrê min nekujtine. Cerdewanan ew kuştine.

Tiyê min ji Stenbolê vegeriya û hate gund. Ew gelek li ber kuştina birayê xwe ket. Wî mala xwe û a min barkir û bire Stenbolê. Kurê tiyê min ê mezin bi me re nehate Stenbolê. Bavê wî sond xwaribû ku divê heyfa –tola- birayê wî bê stendin û loma jî wezîfa tolhildanê dabû kurê xwe ê mezin ku tola apê xwe hilîne. Hetefa wî serekê cerdewanan bû. Wî dê serekê cerdewanan ikujtana û biçûna çiya, biketana nav hêza çekdaran.

Piştî çûyina me ya Stenbolê, kurê tiyê min tola apê xwe hilda, serekê cerdewanan û cerdewanekî din, du kesan li ser hevûdu kuşt û çû çîyê. Li Stenbolê em di xaniyekî ku li vir jê re dibêjin gecekondî de bun. Tiyê min tu karekî nedît ku bixebite. Sê zarokên wî, ew û jina xwe, ez û keça xwe, em heft kes bûn û piştî demeke rewşa me ya aborî xirab bû. Perê me qediya, me zêrên xwe hûr kir, firot, ew jî qediya. Tiyê min û kurê xwe dest bi hemaltiyê kirin. Lê, tiyê min kal bû, nikaribû barê giran hilgire ser milê xwe. Me bi hatina kurê wî ê ciwan debara xwe dikir.

Piştî demekê ez li karê paqijiya malan geriyam û min li ber du malên dewlemend karê paqijiyê dît. Min dest bi kar kir. Hatina min çêbû. Mala ku em lê diman ji bo heft kesan teng bû. Min ji tiyê xwe îcaze stend û xanîke din kirê kir. Ez biroj diçûm kar. Keça min li malê tenê diman. Keça min hêj duwanzdeh salî bû. Kurê tiyê min hijdeh salîbû. Min û tiyê xwe, me soz û peyman dabû hevûdu ku keça min hinek mezin bibe, em wê bi kurê wî re bizewicînin. Lê, keça min û kurê wî nedixwestin bi hevre bizewicin. Wan weke xweşk û bira li hev dinêriyan.

Min keça xwe bi tenê li malê dihêşt û ez diçûm kar. haya min ji keçikê tunebû bê çi dike, çi nake. Wê di mehalê de kurikekî dîtiye û pê re bûye heval. Xweşka kurik li gazînoyê dixebite. Wê mala xwe kiriye weke kerxane. Jinik hepçî bûye. Li gazînoyê araq vedixwe û hep dixwe. Kurik jî bûye tolaz û hepçî. Hinek dibêjin kurik – yê ku bûye hevalê keça min – birayê jinika gazînoyêye û hinek dibêjin dostê wê ye. Welhasil, rojeke kurik keça min dibe mala xwe. Jinika qahpe a gazînoyê pê re xweş xeber dide û coca cola îkramê wê dike. Jinik hep davêje nav colayê. Keça min cola vedixwe û bêheş dibe. Kurik tecawizê wê dike, bakîretiya wê xirab dike. Piştê bûyera tecawizê ew keça min bernadin, wê di mala xwe de hepis dikin. Her roj hep didinê û wê dikine muptelayê heban.

Ji ber wendabûna keça xwe ez gelek qehirîm, şaş û ferc bûm, perîşan bûm. Min xeberê da mala tiyê xwe. Ew jî gelek li ber ketin ku keça min winda ye. Me xeber da hinek nas û dostên xwe yên kurd. Ew bi me re bûn alîkar û me xeberê da qereqola polîsan jî ku keçik wenda ye. Me temamê mahalê pê hesand ku keça min wenda ye. Dikandarê mahalê kurd bû. Wî ji me re got ku, wî çend car keça min bi filan kes re dîtiye. Kurik yekî tolaz e û esrarkêş e. Lê, dikandar navê kurik û mala kurik nizanibû. Lê, zanibû ku ew di vê mehalê de rûdine û gelek caran wî di mehalê de dîtiye.

Li ser windabûna keça min deh roj derbas bûbû. Serê sibê ez ji mal derketim ku biçim mala tiyê xwe û em li keçikê bigerin. Çawa min derî vekir ku waye keça min li ber derî dirêjketî ye. Min wê dît keyfa min hat, lê dema min halê wê ê nebaş dît, kezeb li min şewitî. Min kir qêrîn û hewar, min got "wax keça min, ev çiye hatiye serê te."

Keça min ji ber xwarina heban bêheş bû. Min wê rakir û bire hundir. Li hundir ez têr û tije girîyam û paşê min heşê xwe civand, xwe aş kir û ez rabûm, min serê wê şûşt, cilên nû lê kir. Heşê wê jî hate serî. Keçikê ji min re meselê qal kir ku pê çikirine, çi anîne serê wê. Paşê em çûn mala tiyê min. Min ji wan re jî bûyerê bahs kir. Ji wir jî em çûn û me gilî kir. Polîs kurik û jinika qahpe girtin bin çav.

Tiyê min qayil nebû ku em biçin cem polîs û gilî bikin. Wî digot "ew kurikê segbav bi namûsa me lîstiye. Lewre jî divê ew bê kuştin. Bila kurê min wî bikuje. Ew wî nekuje, ez ê biçim û wî segbavî bikujim."

Ez qayil nebûm. Min qebûl nekir ku kurê wî mêr bikuje. Kurekî wî ji bo mêrê min mêr kuştibû û bûbû mahkûm û li serê çiyan bû. Ew ê rojeke li serê çiyan bê kuştin yan jî bê girtin û gelek salan hepis raze. Ev kurê wî jî ji bo keça min mêr bikuje, dê bê girtin û di hepis û zindanan de birize. Mala tiyê min jî li destê karê kurê xwe dinêrin. Aboriya wan li ser kur bû. Kurik, hemaltî û ameletî dike û çend kurişê ku qezenc dike ji bo mesrefa malê xerc dike. Nabe ku ew bibe mêrkûj û mala tiyê min perîşan bibin.

Polîs li ser giliyê me wan herduyan girtibûn, lê heşê min li ser keça min bû. Keça min bûbû muptelayê heban û bêheş bû, di krîzê de bû. Heb tunebû ku bi xwe û lewre jî piştê demekê keça min heşê xwe wenda kir û dîn bû. Dil û kezeba min bi halê wê dişewitî. Tiyê min û kurê wî jî gelek li ber diketin. Tiyê min digriya û digot "ew keça birayê min e, emanetê min bû, min nikaribûm lê xwedî derkevim, nikaribûm wê biparêzim." Tiyê min ji ber hal û rewşa keça min qahr dibû.

Keça min dîn bûbû û herweha perê me jî tunebûn ku em wê bibin cem doktoran, li nexweşxanan razînin û tedawî bikin. Piştê du, sê mehan ew kurik û jinik hatin berdan. Tiyê min ji dostekî xwe demançe kirîbû û pêşiya mala wan kemîn danîbû. Tiyê min herduyan jî li ser hevûdu kuşt û nehate girtin, xwe berşê da. Wî biryara xwe da ku biçe çîyê, xwe bigihîne kurê xwe û li dijê askerên romê şer bike û têbikoşe.

Tiyê min bi saya kurdekî ku li Stenbolê bûbû dostê me, bi hevalê berpirsiyar ê hêza çekdaran re têkilî danî. Hevalên vir wî şiyandin welêt. Jina wî û hersê zarokên wî li vir man. Kurê wî ameletî dike û ez jî karê paqijiyê dikim. Em nanozik îdara xwe dikin. Perê me tune ku ez keça xwe li nexweşxanê razînim û wê tedawî bikim. Dibêjin yên ku bibine muptelayê heban, heger li nexweşxanê razin û tedawî bibin, dikarin rehet bibin û dev ji xwarina heban berdin.

Min gotinên Nêrgizê birîn û jê re got :

- Ez ê bi te re bibim alîkar. Ez ê keça te li nexweşxanê razînim û mesrefê nexweşxanê ez ê bidim.
- Wey xwedê ji te razî be. Heger tu wiha bikî, ez tu car vê qenciya te ji bîr nakim.
- Ez ê keça te rehet bikim. Piştî ku ew rehet bû, wê bi kurê tiyê xwe re bide zewicandin.
- Kurê tiyê min jî çû çiyê.

- Na lo...Çima? Ew çima çû?
- Tiyê min diçe çiyê û kurê xwe ê mezin dibîne. Ew di nav yek komeke çekdaran de bi hevre ne. Şer derdikeve, kurê wî tê kuştin. Ew jî ji ber qahrê kurê xwe nexweş dikeve. Ew bi wê nexweşiya xwe, bi komek çekdaran re êrişê ser qereqola askerên romê dike. Tiyê min gelek asker bi destê xwe dikuje û tola kurê xwe hiltîne, lê ew jî li wir şehîd dikeve. Em paşê pê hesiyan ku ew herdu şehîd ketine. Kurê wî jî sond xwar ku ew jî biçe çîyê û tola bav û birayê xwe hilîne û di riya bav û birayê xwe de bimeşe.
- Him...Diyare ku we gelek êş kişandiye. Jina tiyê te û herdu zarokên wan yên din li vir in?
- Belê, ez wan xwedî dikim. Çiyê min hebe ez bi wan re parve dikim. Niha em di yek malekê de dimînin. Lê, ji bo ku keça min dîn e, jin û zarokên tîyê min jê ditirsin. Em keça min li malê girê didin ku zirarê neda wan.
- Wax, wax...Keçik guneh e. Hûn jî bêhemdê xwe pê eşkence dikin.
- Em çi bikin. Tişteke din ji destê me nayê.
- Em wê sibê bibine nexweşxanê.
- Temam, baş e. Gelek spas.
- Spasxweş.

Ez wê şevê li mala dostê xwe mam, li wir razam. Sibha din me keçikê bire nexweşxanê û wê da razan. Min heqê

muayenê û temamê mesrefê nexweşxanê da. Min ji Nêrgizê re got "ji niha û pê ve jî çi mesref pêwîst be, ez ê bidim. Heta ku keça te rehet bibe."

Min jimara telefona xwe a mobîl û ya malê a li amedê da Nêrgizê û Hemdîn. Ez çend rojan li Stenbolê mam û paşê hatim Amedê. Keçika Nêrgizê li nexweşxanê du hefte ma û baş bû. Nêrgizê telefonî min kir û mizgînî da min. Keyfa min hat, ez dilşad bûm ku bi wan re bûm alîkar.

# GUNDIYÊ KOÇBER

Ez li qehwa Yalova'yê rûniştim. Min ji garsonê qahwê qahweyeke bi şîr xwest. Di çante destê min de rojnama "Radîkal" û pêveka wê "Radîkal Kîtap" hebû. Min rojnamê kirîbû, lê hêj nexwendibû. Min rojnamê ji bo pêveka wê "Radîkal Kîtap"ê dikiriya. Di wê de nirxandina pirtûkan û danasîna pirtûkên nû derketî hebû. Qahwa min hat, min cixara xwe pêxist, qurtek li qahwê xist û rojnamê ji çentê derxist û xwend.

Wî alî hinek ji min dûr, du kes rûniştîbûn. Dengê axaftina wan hate min. Wan bi hevre bi kurdî xeber didan. Dema dengê axaftina kurdî hate min, keyfa min hat. Li ciheke weke Yalova ku nêzîkê Stenbolê ye û cihê dewlemendan e, du kes bi hevre bi kurdî diaxifin....Min di dilê xwe de ji bo wan got "Aferim, hûn li kur bin jî bi

kurdî biaxifin.” Min bala xwe da ku herdu bi kurdî diaxifin. Ji wan yekê ziq li min mêze dikir. Piştî demekê, ew herdu rabûn, yek çû derve û yê din ber bi min ve hat. Wî silav da, min jî silava wî ragirt û min jê re bi kurdî got :

- Kerem bike, rûne.
- Spas. Te ez nas kirim?
- Na...Lê, de ka rûnê, em biaxifin. Belkî ez te bi bîr bînim.
- Min xîçek berê ji hevalê xwe re got ”Ez vî zilamî dinasim.” Tu Elî yê Licî nîn î?
- Li Licê gelek Elî hene, ez jî yek ji wan Elî’yan im. Ji axaftina te jî diyare ku tu ji Lîcê yî.
- Yanî çawa?
- Te got ”xîçek berê” ji xeynê Licîyan kes nabêje ”xiçek”. Kurdên din dibêjin ”piçek”.
- Ha....Belê, min fêm kir.
- Di esasê xwe de ”xîçek” jî rast e û ”piçek” jî rast e. Herdu peyvên hevmane ne, anku sînonîmên hev in. Di nav qûmê de kevirên pir biçûk hene, em ji wan re dibêjin ”xîçik”.

Min dê gotinên xwe dirêj bikira, lê kete bîra min ku mêrik gundî ye û karê wî bi mesela ziman nîn e. Ez hêj nû ji ewropayê hatibûm û di bin tesîra ewropayê de mabûm. Min dev ji mesela peyvê û zimên berda û min jê re got :

- Bibexşîn. Min behsa peyvên hevmane kir. Peyv peyvên kurdî ne û mirov kîjan jî bi kar bîne ferq nake. De ka bibêje, tu min jikur nas dikî?
- Ez ji filan gundê Licê me. Di dema şer de em nebûn cerdewanên gundan û loma jî askeran gundê me şewitandin, me jî ji gund koç kir û em hatin Stenbolê. Lê, xwezî em nehatana...

Min li serûrûyê wî, li çavên wî mêze kir, diyar bû ku ew gelek xemgîn e. Di rûçikê wî de êş, derd, kul û keder xuya dikirin. Min jê re got :

- Hatina we ya Stenbolê ji cerdewantiyê çêtir e. Hûn li gund bimana, bibûna cerdewan, dê we û çekdarên çiyê hevûdu bikujtana. Hûn jî kurd û ew jî kurd. Dê kurd bi destê kurd bihatana kuştin. Ne wisan e?
- Belê, wisan e. Ji xwe ji bo vî tiştî em nebûn cerdewan û bûn koçber. Lê koçberiyê mala me xerab kir.
- Te ez xistim meraqê. De ka bahs bike, bê çi hatiye serê we.
- Ez ê ji te re qal bikim. Lê, pêşî ez bibêjim ku min te çawa nas kir.
- Kerem bike, bibêj. Belkî bikeve bîra min.
- Beriya salên heştêyî, di navbera gundê me û gundê cîranê me de mesela avê hebû. Gundê jorê, ava ku ji cem wan dihate gundê me, birîbûn. Wan nedihêştin ku av bê gund.

Serkaniya avê li ber gundê jor bû. Wan jî bend dabûn pêşiya cuwa avê û nedihêştin ku av bê û em pê erd û baxçeyên xwe û dewarên xwe av bidin. Li ser mesela avê em û gundê jor bûn dijberên hev. Hindik mabû em li hev xin, hevûdu bikujin. Me ji hev mêr bikujta, dê bibana mesela xwînê û bi salan bidomana û dê ji herdu aliyan gelek kes bihatana kuştin..

Em herdu gund weha li ber hev bûn, diyar bû dê şer derketana. Rojeke tu digel xortekî din, hûn hatin gundê me û li ser mesela pirsgirêka avê, we em civandin û em bi hevre axifîn.
Dema wî van gotinan got, hate bîra min ku ez û Evdilbarî çûbûn gund. Min jê re got :

- Belê, niha hate bîra min. Ez û hevalekî xwe hatibûn gundê we. Paşê jî em çûn gundê din û me mesela av çareser kir.
- Erê, ew mesele ji xêra we re hel bû. Ew hevalê te jî xortekî baş bû. Niha ew likur e?
- Ew hevalê min çû ser heqiya xwe.
- Na lo...Xwedê rehma xwe lê bike. Çima mir? Nexweş bû? Nexwaşiya wî çibû?
- Em li sirgûnê bûn. Ew nexweş ket. Nexweşiya wî xedar bû. Ew qanser bû û li sirgûnê, li welatê dûr, li xerîbiyê mir, çû ser heqiya xwe. Te derdê min taze kir. De neyse, ka tu derdê xwe bibêj.

- Birako, derdê min pir e. Vî bajarî mala min xerab kir û malik li min şewitand. Ez ji malbata xwe bum, ecêbên nedîtî hatin serê min.
- Derd û kulên bajarên mezin pir in. De ka bibêje, bê çibû? Çi bi serê te hat?
- Ez ê bibêjim, lê baş bû ku min te bi tesadûfî dît. Êdî ez dev ji te bernadim. Divê tu bibî mêvanê min.
- Ji bo mêvandariê spas. Cihê ku ez lê dimînim heye. Havîngeha xwuşka min li vir, li Yalova ye. Ez li wir dimînim. Ez bi tenê me. Dixwazî tu were bibe mêvanê min.
- Na, spas. Min xwest ku tu bêyî û halê me bibînî. Em ji gundê xwe koçber bûn û li vî bajarî di nav xizaniyê de, nanozik, zikbirçî dijîn. Roj heye em nikarin parîkek nan, somunek bibine mala xwe. Zarokên me êvarî nan naxwin û bişev bi zikê birçî radizin.

  Di gund e erdê min, dehl û darîstanên min, dewarên min hebûn. Xaniyê min du qat bû. Askeran xanî û dehlê şewitandin, dewaran kuştin û me ji gund siktir kirin. Niha cihê ku ez lê dimînim weke koxa mirîşkan e.
- Wisane ji bo ku ez cihê te bibînim, ez ê bêm û bibime mêvanê te. Em ê îşev bi hevre sohbet bikin.
- Temam. Gelek spas ji bo ku tu têyî. Ez ê ji te re derd û kulên xwe rave bikim.

- Mala te li vir li Yalova ye.
- Na heyran, Yalova çi halê çi. Ez likur, ev derê hanê cihê dewlemendan likur. Ev cihê zengînan e. Em carna têne vir û karê ameletiyê dikin, paleyî dikin. Me îro kar nedît, wexta me li qahwê ji bêsebeb derbas bû. Gundiyên ku ji gundên xwe hatine qewirandin, bûne koçber û hatine van deran, bi nanozikî debara xwe didomînin. Gundî nikarin bibin karmend û li fabrîkan jî kar nabînin. Em karê ameletiyê yê rojane dikin û perê ku qezenc dikin, didine nan, tiştên xwarinê û dibin mala xwe. Heger em çend roj li ser hev karê ameletiyê nebînin û nexebitin, em birçî dimînin.
- Belê, wisane. Ez zanim gundiyên kurd ên koçber ku hatine bajarên mezin, di van bajarên metropolên tirkan de gelek zahmetî dikşînin û ew di nav feqîrî û belengaziyê de dijîn.
- Xwezî rewş baş bibana û em ji xwe re vegeriyana gundê xwe û li ser axa bav û kalên xwe bijiyana.
- Xwezî ku weha bibe. Lê, dê ew roj jî bê. Hûn ê vegerin welatê xwe û li ser axa xwe azad bijîn.
- De ka rabe em biçin. Mala me dûr e.
- Em dê rabin. Lê, ka te negot navê te çiye?
- Bibexşîn! Eqilê gundîtiyê. Min navê xwe negot. Navê min Emîn e.

Ez û Xalê Emîn ji qahwê rabûn. Em li dolmîşê siwar bûn. Miawînê dolmîşê pere civand, min heqê me da. Xalê Emîn xwe aciz kir, wî xwest ku ew heqê dolmîşê

bide. Bi vî halê wî yê feqîriyê jî wî dixwest comerdî bike. Lê, min bi rewşa wî zanibû. Di rê de min jê pirs kir ku zarokên wî ên biçûk hene yan na? Wî bersîv da, got : ”Belê hene.” Min ji dikan ji bo zarokan diyarî wek çoqolat, şekir û biskivît kirî û em çûn mala wî.

Mal, mal nebû. Bi rastî jî wek koxa mirîşkan û axurê deweran bû. Maleke ”gecekondu” , yek qat û yek ode bû. Xalê Emîn bi jin û zarokên xwe ve di vê odê de radizan. Min di dilê xwe de got : “Feqîro, heger bixwaze bi jina xwe re şadiman bibe, dê çawa li ber çavên van zarokan ewk bike.”

Em li malê runiştin. Xalê Emîn ji jina xwe re got ku, nan û xwarinê amade bike. Li pişt odê, cihekî gelek biçûk hebû. Ew der kiribûn metbex, xwarina xwe li wir çêdikirin. Jina malê ji me re hêkerûn çêkir û pê re çay anî. Dema min hêkerûnê dît, dema berê kete bîra min. Xwarina gundiyan a sereke hêkerûn bû. Em biçûna kîjan gund, ji me re yan hêkerûn çêdikirin yan jî heger havîn bana û bostanê wan hebana firîng, bacik û balîcan di rûn de diqelandin.

Min û Xalê Emîn hêkerûnê bi çayê xwar. Me piştê xwarinê dest bi sohbetê kir. Hate heşê min ku, heger ez îşev li vir bim, dê jina wî û zarokên wî çawa razin? Likur razin? Tenê yek menzeleke razanê hebû û nedibû ku jina wî li cem me razê. Min ji Xalê Emîn re got :

- Binêr, ez hatim û bum mêvanê te. Min rewşa te jî bi çavên xwe dît. Niha ez îşev li vir bim, dê şeva zarokên te biherime. Dê jin û zaroyên te nikaribin razin. Ew dê bêxew bimînin. Were ez û tu, em li texsiyê siwar bin û biçin cihê ku ez li wir dimînim. Em li wir sohbet bikin. Li vir li ber dengên sohbeta me jin û zaroyên te nikarin razin. Tu bi min re bêyî, ji bo sibê jî baxçê vîlaya ku ez lê dimînim karekî bexçevaniyê heye. Ez ji heqê karê baxçe dernakevim. Tu wê karî jî pêk bîne, heqê ameletiya rojeke normal çibe, ez ê bidime te. Bila jin û zarokên te jî îşev ji xwe re rehet razin.

Min Xalê Emîn îqna kir ku em rabin û biçin. Em rabûn. Min herkê hinek pere da zarokan. Keyfa wan hat. Em derketin, çûn, li texsiyê siwar bûn û hatin Yalovayê.

Xalê Emîn havîngeha ku ez lê dimam dît û ji xwe re heyirî ma. Bi rastî jî havîngeheka xweş bû û li ber bahrê bû. Zavayê min baş kiribû ku vê havîngehê kirîbû. Di dolaba qeşayê de vexwarinên cemidî û bîra hebû. Min ji Xalê Emîn pirsî ku ew dixwaze çi vexwe? Wî xwest ku cocacola vexwe. Min ji wî re cocacola û ji xwe re bîrake cemidî anî û me dest bi vexwarin û sohbeta xwe kir.

Xalê Emîn ji min re behsa serpêhatiyên koçberiya xwe kir. Min jî bi dil û can û bi meraq gohdariya wî dikir. Wî

ji bûyerên ku li gund qewimîbûn dest pê kir û qal kir. Gelek tişt hatibû serê wî, serê gundîyên wî û birayên wî. Leşkerên dagirkerên ordiya tirk li ser gundîyan zilm û zordariyeke nedîtî kiribûn û ew mecbûr mabûn yan dê cerdewaniya gund bikira û yan jî dê gund terk bikirana û bibûna koçber. Ew nebûbû cerdewan û li dijê çekdarên kurd şer nekiribû. Ew bûbû gundiyê koçber. Ez gelekî xemgîn bûm û dilê min bi halê gundiyên koçber şewitî.

# JI MALÊ NEREVIN!

Xwezî em ji gundê xwe nehatana vî bajarê mezin û bêyewm. Mala leşkerên romê xirab be, agir bi mala wan keve, bila ocaxê wan kor be, mal û milkên wan bişewite, gund û navçên wan wêran bibe, bextê wan reş be. Wan gundê me xirab kirin, dar û baxçeyên me, dehl û daristanên me şewitandin û em mecbûrî koçberiyê kirin.

Em koçber bûn û hatin vî bajarê mezin. Vî bajarî malik li min xerab kir, jiyana min herimand. Derd û kulên jiyanê, bêbextiya însanan û hemû cure xirabî min di vî bajarî de dîtin. Piştî ku gundê me hate şewitandin, malbata min koç kir û hatin Stenbolê. Bav, dê, birayê min û ez, em çar kes di xaniyekî biçûk ê xurbe de bûn. Me xanî kirê kiribû. Bavê min li qahwê kar dît û di qahwê de xebitî. Perê ku wî qezenc dikir, têra xwarina me ya

rojane nedikir. Birayê min bûbû tolazê kuçan. Bi şev hetanî serê sibê li kuçan beredayî digeriya. Diya min tim li malê bû, xwarin çêdikir, cil û lîbasên me dişûştin. Min bi saya cîraneke me karê paqijiyê dît. Jinika cîranê me li cem malbateke dewlemend karê paqijiya malê dikir. Ji bo ku mal mezin bû, wê carna min jî bi xwe re dibir, me bi hevre malê paqij dikir û wê heqê min dida.

Dema jinika cîranê me nexweş bûna, yan jî karekî wê ê din hebûna, min bi tenê dişyand wir û ez diçûm, min paqijiya wê malê dikir. Rojeke ez li wê malê bum, min erdê paqij dikir. Xanima malê jî li wir bû. Kurê malê xortekî ciwan bû, ew jî li mal bû. Xanima malê ji min re got : "Ez diçim berberxanê. Dema te karê xwe qedand, here." Ew çû. Min hêj kar neqedandibû. Kurê wê ji odê derket û hate salonê. Wî ez dîtim, li min mêze kir û bi dengê bilind fîsikand û got : "Hela lê binêr, çi keçek xweşik e. Heta niha çavên min kor bû, çawa min rindiya wê nedîtibû."

Min ji hal û hareketê wî derxist ku nîyeta wî xerabe. Wî dixwest ji xwe re bi min re bilîze û dest bavêje namûsa min. Lê, min nehêşt ku ew destê xwe bide min. Ew roj, ew têkilê min nebû, lê diyar bû ku wî çav berda bû min û dixwest bi min re bilîze, bi min xerabiyê bike.

Piştî wê rojê, êdî ez tirsiyam û min newêrabû bi tenê biçim paqijiya wê malê. Ez û jina cîran bi hevre diçûn.

Kurê malê ku navê wî Engîn bû, dihat cem min û digot : ''Tu gelek rindî. Dilê min ketiye te. Ez bûme evîndarê te. Ez ê bi te re bizewicim..'' Wî min û jinika cîran bi hevre li texsiyê siwar dikir û dibir aşxanê, nan, xwarin û vexwarina cocacola didane me. Jinika cîran zanibû ku kurik çav berdaye min. Wê jî digot : "Şansê te heye. Engîn beg çav berdaye te. Tu daxwazên wî qebûl bikî, ew ê te di nav peran de xenî bike." Lê, min qebûl nedikir, min digot : "Ez keçek bakîre me û hetanî nezewicim bi kesekî re ranazim. Em malbateke xwedî namûs û şeref in.''

Dema me ji gund koç kiribû, mala meta min çûbûn li navçê bi cih û war bûbûn. Bavê min ji qahwê hat û got : ''Meyrem –navê meta min Meyrem bû- telefon kir, ew jî dixwazin ji navçê barkin û bêne vir. Divê ez ji wan re li vê mehalê xaniyekî kirê bibînim.'' Keyfa min hat ku mala meta min jî têne vir. Kurekî meta min hebû û em hevalên hev ên biçûkiyê ne. Li gund biçûkiya me bi hevre derbas bûbû. Wî ji min hez dikir, bûbû aşiqê min, lê ez aşiqê wî nebûm, min wekî evîndarekî jê hez nedikir. Ez tenê pê re heval bûm û hew.

Bavê min ji bo meta min xaniyekî kirê dît û ew jî hatin. Rewşa wan a aborî nebaş bû. Mêrê meta min nexweş bû û kurê wê bêkar bû. Me alîkariya wan kir, heta ku kurê meta min ji xwe re li karxaneke kar dît.

Ez diçûm karê paqijiyê û kurê malê Engîn pere didan min û ez digerandim. Di encama têkiliyên me de, dilê min jî ketibû Engîn. Ez jî bûm aşiqê wî. Min jê hez dikir. Lê, min hêj xwe nedabû pê û ez pê re ranezabûm. Engîn misaletê min bûbû û dixwest demek zû bi min re raze û şadiman bibe. Lê, min pê re pevşabûna zû nedixwest û herweha min nedixwest ku ew destê xwe bide min. Wî çi dikir, nedikir, gelek waad, soz û peyman didan, lê min qebûl nedikir. Min jê re digot : ”Heger tu min dixwazî û ji min hez dikî, bi min re bizewice. Dema em zewicîn, êdî tu serbestî, çi dikî bike.” Wî jî digot : ”Ji bo zewacê acele neke. Diya min û bavê min qaîl nabin, qebûl nakin ku ez bi te re bizewicim. Ew dixwazin min bi keça xalê min re bizewicînin. Ez jî wê qebûl nakim. Ka bisekine, hetanî ku ez wan razî bikim.”

Di wê navberê de, meta min bi fermî min ji bo kurê xwe xwest û bavê min jî, bê kû ji min bipirse, min da. Lê, min qebûl nekir û min ji diya xwe re got : ”Ez ji kurê meta xwe hez nakim û naxwazim bi wî re bizewicim. Hûn zorê bidine min, ez ê ji malê birevim û biçim.”

Diya min ji bavê min re got ku ”keçik naxwaze bi kurê meta xwe re bizewice.” Lê, bavê min wek xwe kir û got : ”Carekê gotin ji devê min derketiye û min wê daye. Êdî ew bi dergistiye.” Ez mam neçar, bê ez dê çi bikim? Min Engîn dît û jê re meselê qal kir. Ez bi wî re şêwirîm. Wî pêşî got : “Ez te birevînim. “ Min got : “Tu bi adetên

me kurdan nizanî. Keçika destgirtî ji alî yekî ve bê revandin, dibe mesela namûsê, xwîn tê rijandin û mêr tê kuştin. Dê, bav û dergistiyê min têkevin pey me û me herduyan jî bikujin.'' Van gotinên min, Engîn tirsand. Lewre jî wî dev ji mesela revandinê berda.

Demek derbas bû. Nîşana min çêkirin. Êdî hindik mabû ku dawetê çêkin. Min mesela nîşanê jî ji Engîn re bahs kir. Ew jî neçar bû û newêrabû. Wî disxwest riyeke çareseriyê bibîne û bi min re bibe alîkar, lê, nizanibû bê bi min re çawa bibe alîkar. Min jê re got : ''Ez ê ji malê birevim û rêça xwe winda bikim. Lê, divê tu bi min re bibî alîkar. Tu ji min re cihê mayinê peyda bike. Bila kesek nizanibe ku têkiliyên me bi hevre hene. Dema malbata min ji malbata te pirsîn, bila bibêjin haya me jê tune. Em nizanin bi ku ve çûye û likur e. Êdî ew karê paqijiya me nake. Ez bi ra jî êdî neyêm karê paqijiyê. Lê, divê tu min xwedî bikî.''

Ev pêşniyara min di heşê Engîn de rûnişt. Wî qebûl kir û ji min re li cihekî dûr, devereke derî bajêr, xaniyek kirê kir, tiştên nav xanî kirî. Wî min bi texsiya xwe bire wir, xanî bi min nîşan da û got : “Tu ji malê bireve were û êdî li vir bijî. Ez ê temamên pêwîstiyên te tedarik bikim. Ez ê te xwedî bikim û kiriya xanî bidim. Tuyê weka sultanan bijî. Êdî ez nahêlim tu li ciheke din kar bikî. ''

Piştî ku mesela xanî jî hel bû, ez fikirîm û min biryara xwe da ku ji malê birevim. Şeva dawî, ez li malê hetanî

serê sibê ranezam. Ez carna girîyam û carna fikirîm. Min ji malbata xwe hez dikir, lê wan li gor xwe kirin û bê dilê min ez dane kurê meta min. Ez di berbanga sibê de ji malê derketim, hinekî li sukê geriyam û paşê min telefonî Engîn kir. Ew hat û min bir mala ku kirê kiribû û êdî ez ê li wir bimînim.

Engîn hinek pere da min û ji min re got :

- Ez ê du, sê rojan carekî bême cem te û biçim. Nabe ku ez her roj bêm. Niha bûyera reva te germ e. Bila hinek sar bibe, ji bîr bibe, êdî ez ê her roj werim cem te.

Demekê derbas bû. Engîn carna dihat û diçû. Wî ji min re got ku jinika cîranê me a paqijî dike gotiye : ”Esma ji malê reviyaye. Bav û bira û dergistiyê wê li pey digerin. Heger wê bibînin dê wê bikujin. Wan çûye li ba polîs jî gilî kiriye. Polîs ji bavê wê re gotiye : ”Tu araq vedixwî, helbet dê keçik bireve.” Bavê wê gotiye ”Min di jiyana xwe de araq venexwariye.” Polîs gotiye ”Wisane qey te xwestiye tu wê bidî yekê ku nebidilê wê ye, belkî ji bo vê tiştî reviyaye.” Welhasil polîs bavê wê aciz kiriye û wî jî gilîya xwe paşve girtiye.”

Navê min Esma ye, lê Engîn ji min re tim digot “Esmer, Esmera min.” Wî got : “Ji bo ku gilî tune, êdî polîs li te nagere. Engîn dihat û diçû, lê wî hêj jî dest nedabû min. Wî carna min maçî dikir, dest li laşê min digerand, memikên min tev didan, lê min nedihêşt ku pêşve here.

Min jê re gotibû ku hetanî ew mahra olî –dînî- û fermî zewacê çêneke, ez nahêlim ku ew destê xwe bide min.

Engîn di nav heftê de min ji malê girt û bire cihek din. Wî got : ''Ev der cihê daîra nîkaha fermî ye. Em ê nîkaha xwe çêkin û paşê biçine cem mella, mahra dînî –olî- jî çêkin û bi dizî bizewicin.'' Em çûne wê derê. Yekî ku xwedêgiravî karmend bû, defterê anî û tê de navê me nivîsî û hinek tişt pirsî û paşê got : "Temam, min nîkaha we fermî çêkir. Ha binê navên xwe îmze bikin. Me îmze kir. Keyfa min hatibû ku nîkaha me fermî çêbûbû. Ji ber ku êdî direng bû, me ew roj mahra dînî li cem mella çênekir. Engîn xwest ku ew şev bi min re raze û şadiman bibe. Min pevşabûnê qebûl nekir û nehêşt ku ew ewk bike. Min jê re got : ''Mahra dînî çênebe, gunehe, ewk kirina me dibe weke zinya.''

Engîn çû û roja din yekî bi şaşik bi xwe re anî. Wî got "Ev zatêmuhterem Îmamê camiyê ye. Ew dê mahra me a olî bibire.'' Îmam mahra me birî û çû. Ez û Engîn ew şev bi hevre zewicîn.

Piştî zewacê, Engîn heftê du, sê car dihate cem min û bi min re radiza, me pevşabûnê pêk dianî, em şadiman dibûn. Paşê, êdî ew heftê careke dihat. Paşê bû panzdeh rojan careke. Ez hamîle mam, lê min di serî de jê re negotibû ku ez hamîle me. Ez ditirsiyam, heger min bigotana, dikaribû bibêje kurtaj bike, zarokê ji ber xwe

bike. Bebika zikê min bûbû çar, pênc mehî, min jê re got. Wî tu reaksiyon nîşan neda. Wî got :

- Heger tu dixwazî biwelide, bebikê bîne, heger naxwazî neyne, wê/wî ji ber xwe bike.

Min jê re got :

- Na, ez dixwazim biwelidim. Dinya rabe ez kurtaj nakim, nabim qatîlê ewladê xwe. Ez ji te hez dikim û ev zarok ji te ye, diyariya min a herî giranbiha ev zaroke.

Piştî demeke, Engîn min bir nexweşxanê. Wî got :

- Divê doktor bebikê kontrol bike. Bebik çawaye, ji hêla sîhet ve baş e nebaş e. Em dikarin fêr bibin bê bebik keç e yan kur e.
- Kur û keç bûn îşê Xwedê ye. Doktor çi zanê?
- Tip pêşketiye, êdî dizanin ku zarok di zikê diya xwe de keçe yan kur e.

Em çûn nexweşxanê, doktor ez muayene kirim, bi makînê fîlma zikê min kişand, aletek dan ser zikê min û di ekrana kompîturê de lê mêze kirin û paşê doktor got : "Zarok keçik e. Ji we re dê keçek bibe."

Neh meh û neh rojên min derbas bûn, ez welidîm û ji min re keçek çêbû. Engîn kur dixwest, keç nedixwest. Lewre jî moralê wî nebaş bû. Wî ji keçika me hez nekir. Êdî Engîn mehê, carek, carna jî du mehan careke dihate cem min. Paşê êdî ew ji binî ve nehate cem min û ji min

re pere jî neşiyand. Ez bi bebikê xwe ve mam bi tena serê xwe. Engîn li me bêbextî kiribû û li min û li keça xwe xwedî dernediket.

Cîrana min ku navê wê Nahîde ye, jineka pir baş e. Wê bi min re gelek alîkarî kir. Lê, rewşa min a aborî wisa xirab bû ku, êdî min nikaribû heqê kiriya xanî bidim. Min gulîsk û bazina xwe yên zêr firot. Ew jî têr nekir. Dawî cîrana min Nahîde got :

- Diyare ku zilamê te bi te re bêbextî kiriye. Êdî ew bi alî te ve nayê. Ji te re pere jî naşîne. Tu bi tena serê xwe û bi vê zarokê ve, tuyê perîşan bibî. A baştir ev e ku, tu ji xwe re vegerî û biçî mala bavê xwe, cem malbata xwe.
- Ez ji malê reviyame. Ez ê bi çi rûyî biçime wir. Bav û birayê min likur min bibînin dê min bikujin.
- Na lo...Ma çawa destê bavê te diçe ku te bikuje.
- Dikuje, dikuje. Li herêma me gelek jin bi destê mêrên xwe û gelek keç bi destê bav û birayên xwe hatine kuştin.

Çend meh bû ku min nikaribû kiriya xanî bidim. Xwediyê xanî her meh kiriya xwe dixwest, lê min wî dixapand, roj roj dikir. Rojekê xwediyê xanî hat ber derî û ji min re got :

- Ev bû çar mehe ku te kirêya xanî nedaye. Ez zanim rewşa te nebaş e. Lê, qet nebe ji xanî

derkeve. Ez xanîyê xwe bidime yekî din ji bo kirê. Pêwîstiya min jî bi perê kirê heye.

Ez neçar mam û ji xanî derketim. Ez bi keça xwe a biçûk ve çûm mala Nahîdeyê. Wê min hewand û rê nîşanê min da ku ez li mahkemê doz li mêrê xwe Engîn vekim û daxwaza nefeqe lê bikim. Nahîdê rewşa min ji avukatekî nasê xwe re got. Ji bo ku ez doza nefeqe bikim û ji Engîn nefeqe bixwazim. Lêbelê piştî lêpirsîna avukat diyar bû ku Engîn wek fermî bi min re nezewiciye. Ew wek fermî bi keça xalê xwe re zewicandiye. Nîkaha ku ji bo min çêkiriye saxte ye. Wî ez xapandime.

Ez çend rojên din jî li mala Nahîde mam. Rojekê mêvanekî wan ji ewropayê hatibû û bi mêrê wê re hate malê. Nahîde û mêrê wê ji mêvan re behsa min kirin ku çi hatiye serê min. Mêvanê wan kurd bû û ji Amedê – Diyarbekirê – bû. Wî serpêhatiya ku hatibû serê min meraq kir û ji min xwest ku ez jê re bahs bikim.

Min ji serî hetanî dawî behsa xwe kir. Wî bi balkêşî gohdariya min kir. Paşê wî ji min re got :

- Nabe ku tu wiha bi keça xwe ve li holê bimînî. Li cem kurdan, heger keçek ji malê bireve û bi yekî re bizewice, paşê ji wan re zarok çêbibe, hinek dikevin navberê û wan li hevûdu tînin. Ji bo ku keça te heye, dê malbata te, te qebûl bike. Mêrê te li holê tune, lê xem nîn e. Mirov dê ji

wan re bibêje mêr winda ye, kesek nizane ku ew bi kuve çûye. Belkî ji alî qesasên nediyar ve hatiye kuştin. Tu dikarî bibêjî mêrê min yekî şoreşger bû, polîs lê digeriya û niha winda ye.

Ev gotinên mêvan kete heşê min. Min jê rica kir ku ew min bibe cem malbata min û ew bi xwe bi wan re biaxife, ji bo ku min qebûl bikin û min nekujin. Zilamê mêvan qebûl kir û got :

- Em ê sibê biçine mala bavê te.

Sibehtirînê, me xwe amade kir û em çûn. Di rê de ez bi meraq bûm. Gelo mala bavê min hêj jî li cihê xwe bû. Engîn carna behsa wan dikir û digot"mala bavê te hêj jî di wî xanî de ne û bavê te jî li qahwê kar dike."

Em gihîştin ber derî. Dilê min qulpequlp bû û ez bi heyecan bûm. Me li derî xist, diya min derî vekir. Çawa wê ez dîtim, gelek keyfa wê hat. Diya min zaroka bersingê min û zilamê bi min re dît û keyfxweş bû. Wê bebikê ji bersingê min girt, wê maçî kir. Dibêjin nevî şêrîn e, wê jî ji nevîya xwe hez kir. Em derbasî hundir bûn. Bavê min jî li malê bû. Du xortên ciwan jî li cem runiştîbûn. Xuyabû ew herdu ciwan mêvan bûn, loma bavê min îro neçûbû qahwê.

Wan em dîtin, rabûn bixêrhatina me kirin. Diya min zaroka min da destê bavê min û jê re got : "Ha, ev newiya

te ye.” Bavê min keça min girt û wê maçî kir. Ez çûm destê bavê xwe, lê wî ez maç nekirim. Em rûniştin. Bavê min qet reaksiyoneke negatîv nîşan neda û nekire qêreqîr û ji min re gotinên nebaş negotin. Bav û diya min gotin qey ev zilamê ku bi min re ye, mêrê min e. Zilam jî bi rastî zilam bû. Mirovekî navsal, lewend, cil û lîbasên giranbiha lê bû û diyar bû kurdekî tam kurd bû û dirobê efendiyan lê diket. Nahîdê gotibû navê wî ”Alî Bedirxan”e û ji Amedê ye. Ez ciwan bûm û Alî bedirxan zilamekî navsal bû. Temenê wî ji çilî zêdetir bû. Zilam, bavê min û mêvanê wî hal û hewalên hevûdu pirsîn. Herdu mêvanê bavê min ji zilamê ku bi min re hatibû re gotin : ”Em te nas dikin. Tu helbestvanê kurd Dilperîn î. Me pirtûkên te, nivîs û helbestên te xwendine.” Zilam jî ji wan re got : ”Belê, ez bi nasnavê Dilperîn helbest dinivîsim û diweşînim. Lê, navê min ê esil Alî Bedirxan e û ez ji Amedê me, lê li ewropayê dimînim.”

Bavê min mirovekî welatparêz bû. Dema bihîst ku ev zilamê bi min re ji nivîskarekî kurd e û ji ewropayê hatiye, keyfa wî hat û rûken bû.

Paşê, zilamê şaîr ku bi min re hatibû mala bavê min dest bi axaftinê kir û behsa gelek tiştên taybetî kirin. Wî zilm û zora dewleta dagirker ya li ser kurdan, rewşa civaka kurd, neçariya gundiyên kurd yên ku kuçber bûne, derd û kulên koçberiyê yek û yek qal kir û meselê anî ser min û ji wan re rewşa min û bi taybetî hevûdu dîtina me ya

bi tesadûfî li mala Nahîdê qal kir. Wî bi bavê min re wisa xweşik sohbet kir û wî îqna kir ku ew min wek keça xwe qebûl bikin.

Bavê min vî nivîskarê kurdê baş neşkand. Hemû tiştan da bo xatirê şaîrê dîwana helbestan û bavê min ez qebûl kirim. Ez rabûm û çûm destê bavê xwe û wî jî enîya min maçî kir.

Yê şaîr, herdu mêvan û bavê min bi hevre gelek sohbet kirin. Herdu mêvan jî kurdên welatparêz û azadîxwaz bûn. Wan jî weke şaîr wekheviya jin û mêran diparast û li dijê zilm û zordariya li ser jinan û kurdan derdiketin, ji bo wê têdikoşiyan. Paşê zilamê helbestvan rabû û îcaze xwest ku biçe. Me wî heta ber derî rêwî kir. Min jê re gelek spas kir ku wî jiyana min xelas kire. Wî ji çenta xwe pirtûkek derxist û wek diyarî da min. Navê pirtûkê ”Çarînên Dilperîn” bû. Wî ji min re got : ”Heger tu dixwazî ji min re başî û qencî bikî, fêrê xwendina kurdî bibe, vê pirtûkê û pirtûkên min yên din ku hemû jî bi kurdî ne, bixwîne, ev ji bo min bes e û başiya herî xweş e.” Got û çû.

Paşê ez pê hesiyam ku kurê meta min gelek li ber windabûna min ketiye û bi keçek din re jî nezewiciye. Ew bi hatina min hesiyan, keyfa wan hatibû. Ew hatin serlêdana me. Ew gelek bi keyf bû. Min û wî, li derve, li ber derî bi hevre bi tenê xeber da. Wî ji min re got :

”Heger tu qebûl bikî, bixwazî, ez amade me ku bi te re bizewicim.” Min jê re got : ”Lê keçik....Ew çawa dibe?” Wî got : ”Ew jî keça me ye. Em ê wê xwedî bikin, mezin bikin.”

Ez bi kurê meta xwe re zewicîm. Gotina min ji keçên xame û ciwan re ev e ku; bila bi zilaman, bi kurên dewlemendan neyên xapandin û li pey wan nekevin. Bila ji mala xwe, ji malbata xwe nerevin û neçin cihek din.

# DIZÊ NEDIZ

Îsmaîl necarî dikir. Der û cîranan, nas û dostê wî jê re digot ”Îsmaîlê Necar.” Îsmaîl hetanî ku televîzyona Kurdî dest bi weşana xwe kir, qet televîzyon nestendibû. Ji xwe jina wî bi tirkî nizanibû, wan di nav malê de tim bi Kurdî xeber didan. Îsmaîl jî qet nedixwest ku li televîzyonên tirkan temaşe bike. Kurê wî û keça wî diçûn dibistanê û zimanê tirkî zanibûn. Wan çend caran ji bavê xwe re gotibû ji me re televîzyon bistîne, em li fîlman temaşe bikin. Lê, Îsmaîl gotibû:

— Na! Ez nastînim. Heger hûn dixwazin li fîlman temaşe bikin carna herin sînemayê.

Piştê ku televîzyona Kurdî, MED TV dest bi weşanê kir, jina Îsmaîl jê re got:

- Divê tu ji me re televîzyon bistînî. Min di mala cîran de li televîzyona Kurdî temaşe kir, gelek xweş bû.

Îsmaîl got:
— Baş e. Ez dê bistînim.

Di nav heftê de Îsmaîl çend caran çû dikanan, geriya ku ji xwe re televîzyoneke erzan bibîne û bistîne. Lê, televîzyon gelek biha bû. Hevalekî Îsmaîl jê re got di çarºiya kevn de dikanek heye, televîzyonên kevn yênku hatine bikaranîn difroşe û gelek jî erzan dide. Îsmaîl çû, ji wê dikanê ji xwe re televîzyonek kirî. Erzan bû. Îsmaîl perê wî da yê û televîzyonê anî malê.

Du roj derbas bû. Polîs hatin mala Îsmaîl û wî girtin binçav. Jê re gotin tu diz î, dizê televîzyonêyî. Te televîzyon diziye. Wan eşkence li Îsmaîl kirin. Lê, Îsmaîl dizîtiyê qebûl nekir. Wî ji wan re digot:

— Ez diz nînim. Kî ji we re gotiye, kî îxbara min kiriye li min derewan kiriye.

Piºtî heftekê polîsan mêze kir ku bi eşkencê bi Îsmaîl re nikarin biçin serî, pê nikarin bidin qebûlkirin ku ew diz e. Polîs ji Îsmaîl re got :

— Divê tu dizîtiya xwe qebûl bikî. Em zanin tu diz nîn î, lê divê tu dizîtiyê qebûl bikî. Heger tu qebûl nekî, em

ê biçin, keça te jî bigrin bînin vir û livir pê eşkence bikin, tecawizê wê bikin.

Îsmaîl dîsan jî qebûl nekir ku wî dizîtî kiriye. Ji wan re got :

— Ez diz nînim. Ez hesiyet û şerefa xwe ji bo televizyonekê naşkînim. Bila ez bimirim lê navê min diz dernekeve. Hûn bi çova zorê nikarin nedizek bikin diz.

Roja din polîs çû keça Îsmaîl girtin û anîn. Dema ku Îsmaîl keça xwe dît, ew bizdiya. Tirsek ket laşê wî û canê wî lerizî. Wî bi zalimtiya polîsên tirk zanibû. Heger li ber çavên wî bi keça wî eşkence bikin, dê ew çawan dayax bike, dê çawa li berxwe bide. Îsmaîl di nav neçariyê de bû. Ketibû nav du agiran. Di cihekî de keça wî, di cihek de qebûlkirina diziyê.

Polîsan dest pê kirin, bi keça Îsmaîl eşkence kirin. Polîsan li ber çavê Îsmaîl bi keçikê îşkence dikirin. Polîs ji Îsmaîl re got :

— Yan dê tu diziyê qebûl bikî û yan jî em dê eşkencê wê berdewam bikin.

Îsmaîl got :

— Bisekinin. Ew bêguneh e. Tu sucekê wê tune ye. Pê îşkence nekin. Nexwe ku di çavê we de ez diz im, bi min eşkence bikin.

Polîsan eşkenca keçikê berdewam kirin. Polîsek cil û lîbasê keçikê qetand e. Keçikê tazî kiribûn. Îsmaîl wexta ku dît keça wî tazî kirin, ji wan re got :

— Bisekinin. Destê xwe nedin keça min. Hûn çi dibêjin ez qebûl dikim. Keça min berdin bila biçe malê. Tenê dizîtî çiye, hûn dixwazin ez mêrkûjiyê jî qebûl bikim, hema bêjin min sed mêr, sed asker û polîs kuştiye.

Li ser van gotinên Îsmaîl polîsan dest ji eşkencê berdan, ewil çûn îfadek ku berê hatibû amadekirin anîn, bi Îsmaîl dane îmzekirin û paşê keça wî berdan.

Îsmaîl derxistin dadgehê. Dadgehê biryara girtina wî da û ew şandin zindanê.

# DEŞTA KÛR

Bahroyê simsar ji navça Wêranşehirê hatibû. Di gundekî navçeya Dêrika Çiyayê Mazî de, gundiyan li xwe civandibû û bi wan re diaxifî.
Bahro ji gundiyan re got :

— Askerên tirkan li her derî hemû gundên Kurdan xirab dikin. Ew dê bêne gundê we jî û xaniyê we jî xerab bikin. Hûn dê bê xanî, bê kar, bê xebat perîşan bibin. Bi min re werin, min kar dîtiye. Di deşta kûr (çûkûrova) de erd û zeviyên gelek mezin hene. Li wê derê axayek heye navê wî Mahmûd Axa ye. Mirovekî baş e. Di nav erdên wî de, hûn dê bixebitin. Hûn dê zebeş bicivînin û li qamyonan bar bikin. Hûn bi min re bên, gund vala bibe wê gavê dê asker xaniyên we neşewitînin. Dê xaniyê we xelas bibin. Paşê belkî rewş baş bibe, hûn dê vegerin gundê xwe.

Li ser vê axiftina simsar Bahro gundî bi hev şêwirîn, hinekan gotin em pê re biçin ji xwe re kar û xebat bikin, pere qezenç bikin, hinekan jî gotin em neçin, di gundê xwe de bimînin.

Simsar Bahro du roj di gund de ma û hinekan îqna kir, bi xwe re bir. Ji simsar Bahro re amele lazim bû. Wî sedî deh qomisyona xwe ji pişta van amelan derdixist.

Simsar Bahro çû, ji navçê qamyonek anî gund û gundiyan lê siwar kir û bire deşta kûrê. Li pêşberê gundê Mahmûd Axa, li aliyê jêr, li devê newala avê ji wan re kon (çadir) danîn û malbatên gundiyan bi jin û zarokan ve ketin konan.

Gundiyên amele çend roj di nav erd û zeviyan de xebitîn. Piştê hefteyekê xebata wan, baranê dest pê kir, bû şilî û şelepe, gundî nikaribûn di nav erd de bixebitin. Ava ku di newalê de diçû, çemekê piçûk bû, ji ber baranê naser rabûbû, av hatibû û ketibû nav çadiran. Gundiyên amele çûn cem Mahmûd Axa, jê re got in :

— Me li devê newalê, li ber çem çadiran daniye liwê xeter e, naser pirr rabibe dê çadirê me bi erzaqên me ve û bi zarokên me ve bibe. Divê em li cîhekî din çadiran daynin.

Mahmûd Axa vê pêşniyara gundiyan qebûl nekir, ji wan re got :

— Nabe! Xeynê wir cîhekî din tûne ye. Li cîhên din dewarên me diçerin. Hûn li wan deran çadir daynin, dê rehetiya heywanên me bireve, dê heywan baş û têr neçer in.

Di çavê Mahmûd Axa de qîmeta heywanên wî ji yên wan gundiyan pirtir bû. Wî heywanên xwe di ser wan gundiyan de digirtin.

Xalit gundî bû. Ev bûbû deh sal ku zewicîbû, tenê yek zarokek wî hebû. Navê kurê wî Akîf bû. Akîf heşt salî bû. Piştî Akîf zarok ji wan re çênebû.

Rojek Xalit û Jina xwe çûbûn nav erdan. Ew û gundiyên wî di nav erd de dixebitîn. Dîsa baran barî, naser rabû. Çadirên gundiyên amele di bin avê de man. Akîfê heşt salî di çadirê de bû. Ew di nav avê de ma û xeniqî.

Gundî ji nav erd hatin ber çadiran, dîtin ku hemû çadir di bin avê de mane. Xalit û jina wî kirin hewar û qêrîn, gotin kurê me di bin avê de xeniqîya ye. Yên ku avjêniyê dizanibûn çûn, termê-laşê- kurik ji bin avê derxist in derve. Gundiyan xeberê dan Axa ku zarokek piçûk xeniqîyaye û divê wî di gorîstana gund de bin ax bikin, bikin mezel. Mahmûd Axa nehêºt e ku ew vê zarokê

piçûk di nav gorîstana gund de bin ax bikin. Mahmûd axa ji wan re got :

— Livir, li devê vê newalê jê re mezelekî biçûk bikolin û wî binax bikin, bikine mezel.

Gundiyan nexwest ku li devê newalê kurikê piçûk defin bikin. Lewra heger liwê wî bin ax bikirana, li pêşberê çavê bavê wî bû. Bavê kurik dê her roj mezel bidîtana û li ber biketana. Gundiyên amele çûn ji gundekî çîranê wê gundî re gotin ku zarokek piçûk xeniqiye, ew dixwazin wî bînin, di gorîstana wan de bikin mezel. Wan gundiyan jî nehêşt e ku zarokê mirî di gorîstana gundê wan de bin ax bikin. Ew herdu gund jî gundên tirkan bûn. Ronişţvanên gund, tirkên şoven û nîjadperest bûn. Wan nedixwest ku mezelê Kurdekî di nav mezelê wan de be.

Li ser vê helwesta gundiyên tirk ên nîjadperest, amelê Kurd gelekî aciz bûn û biryara xwe dan ku cenazê xwe bigrin û bi hevre vegerin welatên xwe. Bavê Akîf, laşê kurê xwe ê mirî di nav lihêfê de lefand û ji gundiyên xwe re got :

— De heydê em jivir, ji vî welatê xerîb, ji vî welatê dagirkerên hov – barbar – birêbikevin, biçin welatê xwe yê ezîz û şêrîn. Ka wan digotin em bira ne. Hetanî niha li ser navê biratiyê û îslamiyê me dixapand in. Yên ku

nexwazin mezelên me jî li cem hev be, dê çawan bi me re biratî bikin. Lanet li wan û biratiya wan û derewên wan.

Gundiyekî din :

— Ji me Kurdan re dibêjin Kurd cudawaz in, cudaxwazên esil ew in, hukmata wan e, dewleta wan e, xelqê wan in.

Gundiyekî Xort :

— Gelek eşkera xuya dibe ku em bi tirkan re bi vê şêweyê nikarin bijîn. Hetanî niha bi hevre jiyandina me li ser esasê zorê bûye. Divê em xwe ji bin destê van zalîman, van nîjadperestên hov rizgar bikin. Ez jî dê ji bo azadiya gel û rizgariya welat têbikoşim. Ez ê qada xebata siyasî de bêrawestan bixebitim û bi şêweyekî aktîvî di nav têkoşîna netewî û demokratîk de cih bigrim.

Gundiyan cenazeyê xwe girtin û vegeriyan welatê xwe.

# WÎ EZ FIROTIM

Ez keçeka feqîrim, reben im. Tendirustiya min jî nebaş e. Ez ji bavê xwe keçek tenê me. Ji xeynê min keç û kurên bavê min tunin. Em li gund di halê xwe de dijîn. Diya min hêj ez biçûk bûme çûye rahmetê. Bavê min ez xwedî kirim. Ew ji bo min hem bû bav û hem bû dê. Wî ez mezin kirim. Ez bi bavê xwe re bûm alîkar. Min karê malê dikir. Ez ji cîranê me fêrî çêkirina xwarinê bûm. Çêkirina gelek xwarinan jî bavê min ez fêr kiribûm.

Temenê min gihîşt sî salan, hêj jî ez nezewicîm. Min nedixwest ku ez bizewicim û bavê xwe bi tenê bihêlim. Çend kesan hatin ez xwestin, bavê min jî dixwest ku min bide mêran, lê min qebûl nedikir. Bavê min êdî kal

bû û nikaribû bi tena serê xwe li malê bijî. Divê ez pê re bibûma alîkar. Min xistibû heşê xwe ku hetanî bavê min sax be ez ê nezewicim. Lê, piştî ku ew bi emrê Xwedê biçe ser heqiya xwe ez ê bi yekî navsal re bizewicim.

Bavê min kal bû û nexweş bû. Nexweşiya wî her diçû zêde dibû. Wî ez şandim cem muxtarê gund ku muxtar were mala me û bavê min jê re daxwazek xwe bibêje. Ez çûm, min bangî muxtar kir. Muxtar hate mala me. Bavê min jê daxwaz kir ku ew xeberê bişîne pey kurê apê min jibo were gund. Mala kurê apê min koçê bajar kiribûn. Adresa wan û nimra telefona wan bi muxtar re heye. Loma bavê min jê daxwaz kir ku ew xeberê bide kurê apê min.

Muxtar daxwaza bavê min bi cih anî û xeberê da kurê apê min. Navê kurê apê min Menduh e. Ew li ser daxwza bavê min û muxtar hate gund. Wî got ''Muxtar gote apê te nexweş e, loma ez hatim serdanê.'' Bavê min jê re wesiyet kir ku ew li min xwedî derkeve. Bavê min li cem min jê re got :

- Lingê min li devê gor e. Ez ê bimrim û dê keça min bi tena sere xwe bimîne. Mirovên me li gund nemane, koçî bajaran kirine. Tu kurê birayê min î û dive tu li keça apê xwe xwedî derkevî. Wê bêxwedî nehêlî. Mal û milkên min ên gund, erd û zevî, erd û baxçe bifroşe. Keça min bi xwe re bibe, wê bi zilamekî minasib re bizewicîne."

Kurê apê min hêj li gund bû, bavê min çû rehmetê. Menduhê kurê apê min û gundiyan wî li goristana gund defin kirin. Menduh mal û milkên me yên gund firote gundiya, peran girt û min da pey xwe, ji gund bire bajêr. Menduh zewicandîbû û du zarokên wî hebûn. Mala wan jî biçûk bû. Ez û herdu zarok li odekê diman. Menduh dixwest di demeke zû de min bi yekî re bizewicîne.

Mehla ku em lê bûn, mehla feqîran bû. Jê re digotin ewder mehla "gecekondî"yan e. Di mahlê de dikandarekî navsal ê topal heye. Dikana wî biçûke lê piraniya mahelê ji wir tişt dikirin. Car caran jina kurê apê min ez dişyandim dikên û min tişt, mişt dikiriya. Dikandarê topal çavberdabû min. Wî jineka jinebî a mahlê şiyand mala kurê apê min. Jinik hate ji jina birayê min rewşa min pirsî, ka gelo ez bi mêr im, bê mêr im. Dema wê bihîst ku ez nezewicîme, wê daxwaza dikandarê topal ji jina birayê min Nazemînê re got. Nazemînê jî jê re got "Divê ez ji mêre xwe re bibêjim. Heger ew qayil bibe, ez ê xeberê bidime te." Jinika jinebî çû. Bû êvar, kurê apê min ji kar hat. Xanima wî jê re hatina jinika jinebî û daxwaza dikandar got. Wî jî got "Ez bi dikandar re biaxifim, dawî ez ê biryar bidim."

Kurê apê min bi dikandarê topal re diaxife. Ew hevûdu kanih dikin û bê ku ji min bipirse soz û peyman dide dikandar. Herçiqas riza dilê min tunebû jî, min kurê

apê xwe neşkand û zewacê qebûl kir. Ez keçeka bakîre a sî salî û zilamê topal ê dikandar mêrebîyekî pêncî salî bû. Wî jinek anîbû û berdabû.

Zilamê topal ê dikandar ku navê wî Memet bû, bi jina jinebî ve hatin mala birayê min û wan ez xwestin. Kurê apê min jî ez dam wan. Bê dawet û dîlan wan min birin mala zilam. Di şeva pêşîn de ez pir êşiyam. Vî zilamê topal weke heywanan kete ser min û bi zorê bakîretiya min xirab kir. Êdî ez bûbûn hevsera wî. Kîngê dilî bixwestana, geh biroj ji dikan dihat û geh bişev weke ku tecawizê min bike weha bi zorê bi min re seks dikir û ez dêşandim. Wî digel vê kirina xwe ya heywanî, herweha tiştan yan jî gotinek dikir bihane û li min dixist. Di ser lêxistinê de jî li min heqaret dikir û digot ”min gelek pere daye kurê apê te û min te kirîye.”

Gotinên wî yên ku gotibû ”Min te kirîye” gelek bi min zor hat û ez rojeke çûme mala kurê apê xwe û min bi wî û bi jina wî re şer kir. Min ji kurê apê xwe re got ”Te ez firotim e. ” Piştî vê pevçûna min a bi kurê apê min re, êdî ez ji wî xeyidîm û bi alî mala wan ve neçûm. Ji xwe ew qet yek carekê jî nehatibû mala min.

Min bi zilamê xwe ê pîs re îdare dikir, lê dema wî vedixwarin qet derdî wî nedihate kişandin. Dema ew serxweş dibû hem tecawizê min dikir û hem min jê lêdan dixwar. Demek hat ku êdî min nikaribû wî derdî

bikşînim. Ez ji ber reviyam. Min malê terkir û ez çûm ku biçime mala kurê apê xwe û jê daxwaz bikim ku ji min re riyek çareseriyekê bibîne û min ji lêdana vî zilamê serxweş û sadîst xelas bike.

Ez çûm mala kurê apê xwe, lê wan ji wir bar kiribû û di şûna wan de yekî din li wir bû. Gotin ku ew kiraciyên nû ne û yê berê bi kuve çûye em nizanin. Ez adresa wî ya nû nizanim û ji xwe ez nizanim ku bi kuve çûne. Ez mam bi tena serê xwe. Ez ê bi kuve biçim? Çi bikim? Likur bimînim? Di nav kuçeyên bajêr de wek însaneke bêkes melûl melûl meşiyam.

Rêveçûn, meş ez westandim. Ez çûm li nav parkekê li ser kursiyê parkê rûniştim û ji xwe re bi halê xwe giriyam. Jineka ciwan di ber min de derbas bû û wê dît ku waye ez digrîm, hate û li cem min rûnişt û xwest min aş bike. Wê ji min re got :

- Çima tu digrî? Çi derdê te heye, bibêje, ez ê ji te re bibim alîkar.

Min hal û rewşa xwe, derd û kulê xwe jê re qal kir. Piştî qalkirinê wê ji min re got :

- Tu hêj ciwanî. Neçe nebe jina zilamê topal ê pêncesalî ku her roj jî lit e dixe. Bi min re were, li mala min bimîne. Heta em çareseriyeke bibînin.

Min bi bawer kir û êdî ez neçûm cem zilamê xwe ê topal. Navê wê Sîbel bû û jineka baş û bi rehm xuya dikir. Ez bi jinika ciwan re anku bi Sîbelê re çûm mala wê. Beriya ku biçine mala wê, em çûn aşxanê û me xwarin xwar. Paşî wê ez birime sînemayê. Me fîlm temaşe kir û ji sînemayê em çûne mala wê. Xaniyê wê du ode bû. Wê got di odeyek te tu û di ya din de ez ê razim. Lê, niha îşev em ê bi hevre li odeyek di nav livîneke de razin. Di oda din de livîn tune. Ez ê sibê doşek û lihêf bikirim û daynim oda din."

Ez westiyabûm û xewa min dihat. Min ji Sîbelê re got ku xewa min tê û ez dixwazim razim. Wê got "kerem bike, livîn amade ye, raze." Min cilên xwe derxistin û ez ketim nav ciyan. Hinek paşê ew jî hate cem min û xwe dirêj kir. Wê destê xwe li laşê min gerand, xweşa min çû, min jî destê xwe li laşî gerand û destê min çû li penîsê wê ket, ez veciniqîm û tirsam. Ez rabûm ser xwe û min ziq lê mêze kir, serûrûyê wê û porên wê yên dirêj dişibiya jinan, lê ew mêr bû. Wê li ser şaş û ecêbmayina min, meselê ji min re qal kir; ew travesty bû. Erê mêr bû lê xwe wek jin didît. Wê yan jî wî ji min re got "Heger bi riza dilê te nebe, ez destê xwe nadime te. Lê heger tu bixwazî em îşev bi hevre şadiman bibin. Ez bawerim tuyê ji pevşabûna me tehm û lezeteke xweş werbigrî." Min daxwaza wî qebûl kir. Wî şadimaniyeke wisa xweş bi min re pêk anî ku, ev cara yekem bû ku min ji pêkanîna seksê zewq distend. Wî ez mest kirim.

Ji wê şevê û pêve êdî ez li cem wî mam. Ez û ew hem weke du dost û heval bi hevre dijiyan û dema dilê me dixwest wek jin û mêr me bi hevre şadimaniyê pêk dianî. Sîbelê – ku nave wî yê eslî Seyhan bû – weke hinek travestiyên din laşê xwe difrotin. Wî ji min re rewşa xwe bi şêweke vekirî û eşkere got. Wî ji min daxwaz nekir ku ez jî vî karî bikim. Wî got "Ez ji te re nabêjim îlla weke min bike. Heger dilê te bixwaze bike. Niha tu azadî û laşê te aide te ye."

Demeke min laşê xwe nefrot. Wê/wî laşê xwe difrot, pere qezenc dikir û me bi hevre dixwar. Piştî demekê wijdanê min qebûl nekir ku ew min xwedî bike û bi perê laşfirotina xwe zikê min têr bike. Rojeke zilamekî anî malê, zilam homofobî bû, nexwest pê re ji paşve ewk bike, zilam min li malê dît û jê re got "ez te naxwazim wê dixwazim." Sîbelê jî jê re got "Ew vî îşî nake." Zilam got "Ez ê du qatê te pere bidime wê" Min jî qebûl kir û ji wê rojê ve ez jî bi Sîbelê re derketim û min laşê xwe firot. Bi laşfirotinê me debara xwe dikir. Lêbelê ez nerehet bûm. Min bêriya gundê xwe kiribû. Min dixwest ez biçime gund û biçim li ser mezelê bavê xwe têr û tije bigrîm. Lê, ji ber karê şev û rojê ê laşfirotinê min firsend nedidît ku ez herim gund.

Rojekê Sîbel bi zilamekî re hate malê. Li gor ku Sîbelê ji min re got "ev zilam nivîskar bû, li ser travestiyan, homoseksuelan û bîseksuelan lêkolîn dikir. Hevalekî

Sîbelê ew şandibû cem Sîbelê ku ji bo lêkolîna wî jê re bibe alîkar.” Zilam derheqê jiyana wan a rojane de pirs dipirsî û dinivisî. Zilam got qey ez jî travestî yan jî homoseksuelim, lê piştî ku min jê re got ez jinim, bala wî kişand ku ez çima bi yekî travestî re dijîm.

Zilamê nivîskar însanekî baş xuya dikir û ew jî weke min kurd bû, bi kurdî zanibû. Dema ew fêr bû ku ez kurd im, wî ji min pirsî ku ez bi kurdî zanim yan na û wexta ku min got ”belê ez bi kurdî zanim” êdî wî dest pê kir û bi min re tenê bi kurdî axifî.

Min ji nivîskar re çîroka serpêhatiya jiyana xwe yek û yek qal kir. Ev bûbû çend sal jî ku min laşê xwe difrot û êdî ez westiyabûm. Yê nivîskar bi îsrar xwest min kanih bike ku ez dev ji karê laşfirotinê, fahîşetiyê berdim û vegerim gundê xwe. Wî digot ”here gund, bi yekî gundî re bizewice û li gundê xwe bijî. Tu hêj sihûpênc saliye û ciwanî. Mêrên ku bixwazin bi te re bizewicin, hene. Li gund here cem muxtarê gund û jê re bibêje ez carekê zewicîm, min û mêrê xwe hevûdu berda. Min ji jiyana bajarvaniyê hez nekir û ez vegeriyam gund. Ez dixwazim li gund bijîm û heger zilamekî minasib hebe ez ê pê re bizewicim.”

Nivîskarê baş vê fikrî xist heşê min û wî ez îkna kirim ku ez vegerim gund. Min bi xebera nivîskar kir û ez vegeriyam gund. Min li bankê hinek pere civandibû ser

hev. Min perê xwe kişand û ez çûm gundê xwe. Pêşî ez çûm li ser mezelê bavê xwe têr û tije giriyam û paşê ez çûm cem muxtar. Ji xwe muxtarê berê bû û wî min û bavê min nas dikir. Wî ez kirim mêvan û bi min re bû alîkar. Bi saya wî ez bi gundiyekê sih salî ku jina wî çûbû rehmetê û ew mêrebî mabû re zewicîm û bûm xwedî mal û zarok. Niha ez bi mêrê xwe û zarokên xwe re li gundê xwe bi dilşadî dijîm.

# AX JINBÛN AX

Ev zor û zehmetiya ku ez dikşînim hemû ji ber jinbûniya min tê. Heger ez jin nebama, min ê ewqas zilim bidîtana, ewqas zehmetî bikşandana. Ez çi bikim, Xwedê min wek keç xuliqand. Ez ê derd û kulê xwe ji we re qal bikim. Hûn jî bibin şirîkê derdê min. Binêrin bê ji ber jinbûna min çi hatiye serê min.

Mêrê min li min zilim dikir û herî dawî min ji balkonê avêt. Ez nemiram, birîndar bûm, li nexweşxanê çend roj mam. Bavê min ê bêwijdan ji min re got ”here, geber bibe.” Wax li min pepûkê, ma ev çiye tê serê min. Ez ê çawa ji van derd û kulan xelas bibim? Bav ji zarokên xwe re zû bi zû nabêjin ”Bimêr” lê, dema pirsa namûsê û adetên tradisyona çandî û civakî yên paşverû li holê be, dibêjin ”bimir” û heta bi destê xwe zarokên xwe dikujin, dibin qatîlê ewladê xwe. Hetanî ev adet û

tradisyonên çandî, civakî ji holê ranebe ji keç û jinan re rehetî tune.

Mêrê min xwest min bikuje, ez nemiram, bavê min ez red kirim, li min xwedî derneket, ez mame bêxwedî. Bi alîkariya hevala xwe ez çûm navenda jinan, min xwe spart wan. Hêj jî ez ji kuştina xwe ditirsim.

Ez bi dilê xwe nezewicîm. Min ne beriya zewacê û ne jî piştî zewacê ji mêrê xwe hez nekir. Ez bi zora malbata xwe bi mirovekî xwe re zewicîm. Ez keçeke çardeh salî, naşîn bûm û wan ez bi vî halê min ê ê zarokî û naşênî zewicandin. Dema min bi destgirtî kirin, min ji bav û diya xwe re got ku ez naxwazim bizewicim. Lêbelê bavê min ê zalim û bêwijdan li min xist. Li ser lêdana bavê xwe ez qehirîm, girîyam. Ne careke, çend car min ji bavê xwe lêdan xwar. Carekê bavê min li cem destgirtiyê min û xezûrê min li min xist.

Piştî ku malbatê ez bi zorê zewicandim, ez xemgîn bûm. Mêrê min jî ji bo ku min wî nexwestibû ji min re xerab bû û wî jî dest pê kir û li min dixist. Ji roja ku ez pê re zewicîm hetanî roja ku min ji balkonê avêt, min ji destê mêrî lêdan xwar. Roja ku wî li min nexistana ew roj ji bo min roja xweşiyê bû. Wî kar dikir û nedihêşt, nedixwest ku ez jî kar bikim. Lêbelê, dema êvarê ji kar dihat malê, digot ''ez kar dikim û tu dixwî.''

Di dema zewacê de min got heger ez zarok bînim, belkî ji bo xatirê zarokan ji min re baş bibe û êdî li min nexe. Min zarok anî. Lê, zarok welidandin jî feyde nekir. Ew zilamekî wisa pîs bû ku, zarokên wî jî jê ditirsin. Ew ji zarokên xwe jî hez nake. Mirovekî pir xerab e.

Mala me di qata duyem de bû. Wê rojê wî dîsa li min xist. Wî ne tenê li min xist, herwiha li zarokan jî xist. Ez ji ber lêdana wî reviyam ser balqonê. Ew li pey min hate balqonê û li wir dîsa li min xist û min ji balqonê avête xwarê. Dema ez ji balqonê ketim xwarê, wî qet li min nenêriya bê ez mirim yan sax im. Jineka cîrana min gelek baş bû, wê alîkariya min kir. Ew hate cem min û dît ku ez nemirime, wê min kir texsiyê û bire nexweşxanê. Ez li nexweşxanê bûm, kesek nehate serdana min. Karmendên nexweşxanê xeberê dabû bavê min ê bêwijdan, lê ew jî qet bi aliyê min ve nehat. Min telefonê bavê xwe kir, wî ji min re got : ” Heger tu venegerî cem mêrê xwe, bimre, geber bibe.” Ez ji xwe re şaş û ezêb dimînim bê ev çi tewir bav e?...

Ez li nexweşxanê mam bi tena serê xwe. Hevala min a cîran ji min re gelek alîkarî kir. Ez bi xêra wê filitîm. Lê, ez ketim nav rewşeke xerab. Ez vegerim cem mêrê xwe, ew ê bi lêdanê min bikuje. Ez venegerim cem mêrî, vêca dê malbat bibêje ”keça me kete kûçan û bû qehpik. Divê em namûsa xwe paqij bikin.” û ew ê biryara kuştina

min derxin û yan bav yan bira min bikuje. De ka ez ê çi xwelî li serê xwe bikim.

Baş bû ku rêxistina parastina jinan li min xwedî derket û min ji bajarê ku mêr û malbata min li wir in, şiyandin bajarekî din û min rêça xwe winda kir. Êdî ew li pey min bigerin jî zû bi zû nikarin min bibînin. Ez pir bi tedarek tevdigerim.

## DIYA MIN BI PERA EZ FIROTIM

Min ji derdê diya xwe bê çi kişand û çi nekişand. Min ji bavê xwe pir hez dikir. Lê, çi heyf ku bavê min zû mir. Dema bavê min çû ser heqiya xwe ez keçek sêzdehsalî bûm. Ez mam di bin destê diya xwe de û diya min piştî du salan min bi zorê bi zilamekî navsal re, ji bo pera-diraf- da zewicandin. Diya min, bi pera ez firotim. Zilam pere –qalind, next- da diya min û min jê kirî.

Piştî mirina bavê min û zewaca min, diya min jî ji xwe re mêrekî dît û êdî pê re dima. Mêrê min ji min 20 sal mezintir bû. Me lihevûdu nedikir. Min jê hez nedikir. Piştî zewaca me, wî dest bi karên xerab kiribû. Wî qumar dilîst, araq vedixwar û li min dixist. Wî wekî kole min di malê de digirt û qet nedihêşt ku ez biçim derve yan jî biçim mala cîranan mêvaniyê. Mal ji bo min tam bûbû zîndan, bûbû hepisxane.

Ji bo ku mêrê min qumar dilîst û araq vedixwar, pere têrî nedikir. Lewre jî nikaribû heqê fatura av û eletrîkê bide. Beledîyê av û eletrîkê girtin. Wî bi bîdonê ji derve av dianî û bişev em li ber ronîya mûmê rûdiniştin.

Min mêze kir wiha nayê kişandin. Ez di malê de aciz bûbûm. Ji bo ez xelas bibim min di malê de şewat derxist û ji firsenda şewitandina xanî, ez ji malê xilas bûm, reviyam, çûme cem diya xwe. Diya min aciz bû ku ez ji cem mêrî reviyame. Wê digot "dê ew zilam bê û perê xwe yê next ku weke qalind daye, paşve bixwaze." Zilamê ku diya min pêre dima, pişta min kir û wî diya min îqna kir ku zilam nikare doza qalind bike. Qalind stendin û qalind dayin qedexeye û zilam bi fermî pere nedaye diya min û nikare îspat bike ku pere daye.

Bi rastî keyfa min hat ku zilamê bi diya min re dimîne, piştgiriya min kir. Lê, min feqîr a reben çi zanibû ku zilam çav berdaye min. Wî rojeke ku diya min li malê nebû û çûbû sûkê – çarşiyê - dest avêt min û bi zorê tecawizê min kir. Piştî tecawizê ez ji wir jî reviyam û çûm cem jineka dostê xwe û bi alîkariya wê ez bi cih, war bum û paşê jî bum xwedî kar.
Heger mirov di hêla aborî de mihtacê kesekî nebe, karê mirov hebe û mirov bikaribe îdara xwe bike, mirov dikare serbest û bi şêweke azad bijî. Paşî jî bi dilê xwe dikare bi zilamekî ku mirov ji hevûdu hez bike re bimîne, bi hevre bijî.

# HESÛDIYA MÊRÎ

Ew çi mêrekî pîs, xerab, çikûd, bêwijdan û zalim bû ku ji bo kuftê, hindik mabû bi çarşefê min bixeniqîne. Ez hemîle bûm, dilê min kufte xwarin xwest û di malê de şerê kuftê derket. Wî bi vê halê min ê hemîle li min xist. Ez jî ji malê reviyam û çûm cem hevala xwe ku me berê hevûdu nas dikir. Mala wê ava, wê gelekî bi min re alîkarî kir.

Min bi wasita nasekî mêrê xwe nas kiribû. Piştî hevaltî û dergistiyê em bi hevre zewicîn. Em herdu jî ne bi zorê, bi dilê xwe zewicîn. Lêbelê di şeva pêşîn de problem derket. Bi min re tirs hebû û loma jî min nehêşt ku ew bi min re temasa cinsî pêk bîne. Min rewşê jê re got. Wî jî got : "Tiştên wiha dibin. Em biçin cem doktor û pê bişêwirin." Piştî du rojan em çûn cem doktor. Bi alîkariya doktor me wê meselê hel kir. Em zewicîn, anku bakîretiya min ji alî mêrê min ve hate xerab kirin.

Lê, mêrê min ji min kete şikê ku ez ji wî hez nakim, ez naxwazim pê re têkiliyên cinsî pêk bînim. Dema ez ji malê derdiketim sûkê, wî ji min şik dikir bê ez diçim cem zilamekî, gelo ez yekî dibînim. Şevekê di xewa xwe de min di xew de xeber daye û navê zilamekî gotiye. Ji ber gotina wî navî ew hîn bêtir ji min kete şikê.

Şikbûnê wî kire hesûd, dilpîs, dilxerab û bi canê min ket. Hesûdî jî tişteke pir xerab e. Di nav malê de hesûdî hebe, êdî tehm û hizûr li wê malê namîne. Mêrê min wisa hesûd bû, wisa bi şik bû ku, min newêrabû li yekî binêrim. Di malê de hertim perde girtîbû, pencera metbexê girtîbû. Em bi hevre biçûna cihekî wî digot : "Serê xwe bixe berxwe. Li kesekî nenêre. Ev zilamê hanê çima li te dinêre." Em bi mêvanî biçûna mala nas, dost û hevalên xwe, divê min serê xwe ji berxwe ranekirana.

Zarokên me çêbûn, lê xû û exlaqê wî, hesûdî û şikbûna wî negehurî. Ew ji bo zarokan jî nebaş bû. Roja ku şer û pevçûn li ser kuftan derket, wî zarokan kire menzelê û êrişê ser min kir. Ew roj, ji ber hemîlebûna xwe dilê min çû kuftê û min kufte çêkir. Min pêşî xwarin da zarokan. Paşî em li ser sifra xwarinê rûniştin. Ji bo kufte sar nebin, min hemûyan di rûn de sor nekiribû. Wî dest bi qêrînê kir. Çima ku min hemûya sor nekiriye û hêk lê nexistiye. Ez çûm metbexê ku hêk li kuftan xim û kuftan di rûn de sor bikim. Wî zarokan kiribû odê û çarşevê girtibû destê xwe û hat, êrişê min kir, xwest bi çarşevê min bixeniqîne.

Ez bi zor ji destî filitîm. Ez ji malê reviyam û çûm mala nas û dosteka xwe.

Dosta min jineka baş û pir qenc bû. Wê alîkariya min kir. Bi saya wê, min ji doktor rapor wergirt û bi saya leşkerên qereqolê min zarokên xwe ji mêrî girtin û min xwe spart navenda spartina jinan.

Mêrê min bi cihê ez lê dimînim hesiya. Wî ji min re name şiyand û poşmaniya xwe anî zimên, doza lêburînê kir. Ew di nameya xwe de dibêje : "Ez ji te hez dikim. Min kir, tu neke." Min carekê pê re xeber da. Ew hêj jî dibêje "Te mexsûs kuftan sor nekiribû. Tu ji zarokên xwe hez dikî, ji min hez nakî. Ji zarokên xwe re tiştên xweş dipjînî, ji bo min tiştên nexweş." Tu dibêjî qey zarokên min tenê ne, yên wî nîn in. Diyare ew ji hêla ruhî ve nexweş e.

Lê, ew poşman be jî, çi bike jî, êdî ez venagerim cem. Ez ê ji xwe re kar bikim û zarokên xwe xwedî bikim.

# ÇIMA ZERYAYÊ XWE ELIQAND?

Ez li Parîsê mêvanê hevalêkî xwe bûm. Em ji malê derketin ku biçine çarşiyê. Jê re telefon hat. Wî bi telefona xwe axifî û piştê ku telefonê girt, ji min re got :

- Jineka kurd xwe eliqandiye. Heval dixwaze em biçin wir.
- Baş e, em biçin. Gelo negot ji bo çi xwe eliqandiye?
- Meselê malbatiyê ye. Em biçin wir, em ê jê bipirsin, ew ê bi teferuat bahs bike.

Em çûn wir. Me hevalê hevalê min dît. Ambulans hêj li wir bû, hatibû ku cesetê jinikê bibe nexweşxanê û paşê li Parîsê defin bikin yan jî bişînin welêt.

Hevalê min navê wî Amer û navê hevalê wî Îbrahîm bû. Min wî berê nas nedikir. Hêj nû me hevûdu nas kir. Piştî ku cenaze birin, em jî ji wir çûn li kafateryayê rûniştin. Amer gelek li ber mirina jinikê ketibû. Wî ew nas dikir û bi çîroka serpêhatiya wê zanibû. Min jî meraq dikir ka gelo jibo çi wê xwe eliqand. Hêsan nine ku mirov bi destê xwe dawî li jiyana xwe bîne. Gelo ev çi sedem bû ku wê wiha kiribû.

Min ji Îbrahîm pirsî :

- Ka bibêj, gelo çima wê dawî li jiyana xwe anî?
- Jib o derdê merê xwe wê xwe kuşt.
- Çawa yanî? Ka ji min re behsa serpêhatiya wê bike.
- Baş e, ez ji re behs bikim.

Îbrahîm dest pê kir û behsa serpêhatiya wê kir.

- Jinika ku xwe eliqand navê wê Zerya bû. Jineka ciwan û pir rind bû. Mêrê wê li vir li Parîsê penaber bû. Jin û zaroka wî li welêt bûn. Keçeka wan hebû û navê wê jî Derya bû. Keçik hêj çar, pênc salî ye. Mêrik navê wî Husein e. Piştî ku wî li vir heqê rûniştinê wergirt, wî bi riya kaçaxgeran jina xwe û keça xwe anî vir. Jinik, anku Zerya û keça xwe bi qaçaxgeran re di riya Bosna Hersekê de hatibûn. Wan di rê de gelek zahmetî kişandibû. Ew heşt saet peya rê çûbûn, paşî derbasî Arnawidê bûbûn. Li wir jî gelek zahmetî

kişandibûn, hênek zêr û perê wê hebû Arnawidên qaçaxger wan jî jê stendibû. Paşê hatiye Îtalyayê û piştî gelek zahmetiyan bi saya alîkariya kurdekî welatperwer hatiye gihîºtiye Fransayê. Mala wan nêzîkê mala me bû. Hevsera min û Zerya bi hevre bûbûn nas û dost. Em car caran bi malbatî diçûne malên hev û dihatin. Zerya jineka pir baş bû, lê mêrê wê ji pênc kuruş nedikir. Ew zilamekî nebaş û gundîyekî nedîtî bû. Herwiha doxînsist bû. Pêşî bi keç û jinên kehpe re rabû û rûnişt, paşê ji xwe re jineka navsal a fransî dît û pê re weke dost jiya. Wî Zerya îhmal kir. Ji xwe jê re gotibû ''Min te ji bo keça xwe anî vir. Nexwe ez ê bi te gundiya reben çi bikim.'' Zerya ji hal û hareketê wî diqehirî. Wê jê hez dikir. Dema wê dît ku waye mêrê wê bi jinika fransî re ye, xirûra wî qebûl nekir, qehirî û kete krîzê û paşî dawî li jiyana xwe anî. Çîroka wê ev bû.''

- Spas ji bo te qal kir. Ez jî li ber ketim. Xwezî xwe nekujtana. Xwezî ji mêrê xwe veqetiyana û vegeriyana, biçûna gundê xwe yan jî li vir ji xwe re bi alîkariya kurdên wekî we demeke li ser lingê xwe bisekiniyana û paşê ji xwe re bizewiciyana.

Jiyan xweş e. Nabe ku mirov bi destê xwe dawî li jiyana xwe bîne. Ev ne baş e, ne rast e û li xwe neheqîye. Ji ber derd, kul û keserên dine nabe ku mirov xwe bikuje. Divê mirov li berxwe bide, li hemberê neheqîyê, bêdadiyê, xerabiyê serîhilde, têbikoşe. Jin û mêrên ku ji hevre nabin bila ji bo hev, ji bo neheqiyên li hevûdu kirine xwe nekujin, neeliqînin, bila weke însanên modern dev ji hevûdu berdin û herkê ji xwe re li jiyaneke nû bigere û bi kesên nû re şad û bextiyar bibe. Gelek jin û mêr hene ku piştî hevûdu berdanê ji nû ve bi yekî/a din re dizewicin û zewaca wan ya duyem ji bo wan dibe serfîrazî û bextewarî.

# WAX LI MIN PEPÛKÊ

Hemê Mehmo gundiyekî feqîr û belengaz bû. Leşkerên artêşa – ordiya – dagirker a dewleta tirk gundê wan şewitandibû û gundiyan koç kiribûn, herkê çûbûn bajarekî Kurdistanê û Tirkiyê. Birayê wî jî di çiya de şehîd ketibû.

Pitî şewitandina gund, wî jî jina xwe, kur û keça xwe girtin û koçî bajarê Îzmîrê kir. Navê kurê wî Mahmûd bû. Hemê Mehmo navê bavê xwe li kurê xwe danîbû. Navê keça wî jî Pepûk bû. Jina wî ji keça xwe re tim digot ”Pepê” lê, bavê wê jê re digot ”Pepûkam, delalam, narînam.” Bav jê gelek hez dikir.

Ji gund koçkirina bajêr û li bajêr jiyan gelek zahmet bû. Hemê Mehmo ji xwe re ameletî, paleyî, hemalî dikir û pê malbata xwe xwedî dikir. Wî carna kar nedidît û pê re pere tunebû ku ji mala xwe re nanek somûn bikire. Rewşa aboriya wan gelek xerab bû. Jin, kur û keça wî jî tu karek nedikirin. Debara malê bi temamî di stuyê wî

de bû. Kurê wî 19 salî û keça wî 14 salî bû. Di navbera kur û keçikê de du zarokên wan çêbûbûn, lê miribûn. Êdî wî nedixwest ji wan re zarok çêbibe. Du zarok bes in. Ji xwe ew nikare jin û herdu zarokên xwe xwedî bike.

Mahmûd di kuçên bajêr de tolazî dikir, ew bi xort û ciwanên xerab re bûbû heval û ew jî wek wan bûbû beredayî û tolaz. Wî dest bi dizîyê kiribû û paşê di çalakiyeke dizîyê de hatibû girtin. Dadgehê 6 sal hepis dabûne pê. Hemê Mehmo gelek ber girtina kurê xwe diket. Wî ji jina xwe û keça xwe re digot : ”Li gund rewşa me baş bû, halê me xweş bû. Aboriya me têrê debara me dikir. Heger segbavên dewleta romê gundê me neşewitandana û em koçên van deran nebûna, dê çima kurê min biketa vî halî.”

Hemê Mehmo heftek, deh roj li ser hev kar dît, kar kir, xebitî, hinek pere qezenc kir. Wî ji bo kurê xwe hinek diyarî kirîn ku bibe hepisxaneyê û bidiyê. Wî dê hinek jî pere bidana kurê xwe. Wî li hemberê kurê xwe, xwe bi xwe sucdar didît û ezabê wijdanî dikşand. Wî ji xwe re di dilê xwe de digot ”Sedemê ku kurê min ket riya xerab û bû diz, ez im. Heger min malbata xwe neaniyana vir, heger min bikaribûma debara wan baş bikrana û ez li kurê xwe xwedî derketama, wî bêserûber bernedana, ew ê çima bibûna diz û çima bihatana girtin.”

Hemê û malbata xwe di xaniyekî yek qat û du menzel de – ku bi tirkî jê re gecekondu dibêjin – diman. Kirê hindik bû, lê xanî tu xanî nebû. Ev xanî li ber xaniyê wî ê gund wekî axurê, wekî xerbe bû.

Roja hevûdu dîtina hepisxaneyê, Hemê neçû li kar negeriya. Wî ji jina xwe re got : ”Îro ez naçim kar. Ez ê biçim hepisxanê, kurê xwe bibînim.”

Jina wî jê daxwaz kir ku ew wê jî bi xwe re bibe hepisxanê. Wê gelek bêriya kurê xwe kiribû. Hemê wê neşkand û got ”Xwe amade bike, em bi hevre biçin.” keça wan Pepûkê jî daxwaz kir ku wê jî bibin, lê diya wê got : ”Hepisxane dûr e. Divê em bi arebê biçin. Perê bavê te tune ku heqê me sê kesan bide. Heqê çûn û hatinê gelek digre. Tu neye. Careke din ez ê naçim, tu bi bavê xwe re here.”

Pepûkê ji neçariya rewşa aborî, qebûl kir, bi gotina diya xwe kir û li malê ma. Hemê û jina xwe ji malê derketin û çûn. Dema ew çûn, diya wê jê re tembîh kir û got :

- Em diçin. Tu ji malê dernekevî û neçî ciheke. Li malê be. Hetanî em neyên, yek bê li derîxe, derî veneke.

Pepûk, keça ciwan a çardehsalî di malê de ma tenê. Wê li pey dê û bavê xwe av rijand û paşê deriyê malê ji paşve girt. Wê li metbexê firaqan şûşt, çû û di oda

runiştinê de runişt. Bû êvar dê û bavê wê nehatin. Bû nîvê şevê nehatin. Tirs û xofek kete dilê wê. Gelo çima ew nehatin? Çi bi serê wan hat? Ji tirsan xewa wê nehat û ew hetanî serê sibê bi tirs di oda runiştinê de ma. Bû nîvro, hêj jî dê û bavê wê nehatibûn. Wê ji xwe re mitale dikir û carna jî digriya.

Demeke din jî derbas bû, êdî bûbû esr. Wê hew dît derî lêket. Ew bi keyf rabû û çû pey derî û pirs kir, bê ew kîye li derî dixe. Yên derve bi tirkî gotin ”Em polîs in. Derî veke.”

Wê bi tirs derî vekir. Dema wê polîsan dît, hîn pirtir tirsiya. Polîs jê re got :

- Divê tu bi me re werî.

Pepûk baş bi tirkî nizanibû. Lê, wê tirkî fêm dikir. Ew li dibistana gund du sal çûbû dibistanê. Lê, paşê ku şerê çekdarî dest pê kiribû, dibistana gundê wan hatibû girtin. Ew di du salan de hinek fêrê tirkî bûbû, lê ne ewqas baş.

Polîsan li oda malê û metbexê mêze kirin, tiştek nedîtin û wê girtin, birin kirin texsiya xwe û birêketin. Texsî li ber avahiyeke mezin sekinî. Ew ji texsiyê hatin xwarê. Di avahiyê de gelek kes hebûn. Karmendên wir hemû cil û lîbasên spî li xwe kiribûn. Pepûkê fêm kir ku li vir

nexweşxaneye. Ew careke bi diya xwe û bavê xwe re çûbû nexweşxanê. Lê, ew nexweşxane ne ev bû.

Polîsan wê birin hundir. Wan bi karmendekî ku cilê spî lêbû re xeber dan û karmend da pêşiya wan, ew birin qata jor. Li wir, polîsan du cenaze bi Pepûkê nîşan dan. Çawa wê ew dîtin, wê kir qêrîn û hewar. Cenazên bav û diya wê bûn. Ew hinek girîya, polîsan wê aş kirin û jê re gotin :

- Divê tu tesdîq bikî ku ev diya te û bavê te ne.

Pepûkê bi kelegirîn got :

- Belê, ev diya min û ev bavê min in.

Polîs wê ji ber cenazan anî oda jor. Li wir hinek kaxiz pê dan testîq kirin. Wê nizanibû îmza xwe biavêje, lê zanibû navê xwe binivîse. Dema polîs jê re got :

- Navê xwe binivîse û binî îmze bike.

Hate heşê wê ku, bav jê re digot ”Pepûk” û diya wê jê re digot ”Pepê”. Gelo navê wê Pepûk bû yan Pepê bû? Wê ji bavê xwe gelek hez dikir û loma navê ku bavê wê lê deng dikir, anku wê Pepûk nivîsî. Wê binê nav îmze nekir. Polîs tiliya wê li hibrê xist û wek mohrê li bin nav xist.

Polîs jê re got ku ”Diya wê û bavê wê di qeza trafîkê de mirine.”

Pepûka reben, keça ciwan, bê dê û bav mabû bi tena serê xwe. Wê dê çi bikira? Çawa bijiya? Çawa xwe xwedî bikira? Çawa kiriya xanî bidana? Ew bi tena serê xwe mabû neçar û  belengaz.

Di vî bajarê mezin de, tu nas û mirovên wê tunebûn. Dê û bav çûbûn ser heqiya xwe û ew bi tenê hêştibûn. Tenê birayê wê hebû û ew jî li hepisxaneyê bû.

Polîs ji bo definkirina cenazan serî li belediyê xistibû û karkerên belediyê wan li cihê mezelên bêkesan binax kirin. Pepûka reben, di malê de bi tena serê xwe bû. Polîs pereyê ku li ser bavê wê derketibû dabû pê. Bavê wê perê kiriya xanî jî danîbû malê. Pepûkê dê bi wan peran kiriya mehekê jî bidana. Lê, meha din, dê çawa kirê bidana?...

Pepûk wisa li ber mirina bav û diya xwe ketibû ku, qehr bûbû û tim digriya. Du roj nan di qirika wê de neçû xwarê. Roja sêyem wê ji xwe re çay çêkir, nan û çay xwar û fikirî ku dê çi bike? Ew gelek fikirî û wê biryara xwe da ku biçe cem birayê xwe ê hepisxanê. Rewşê jê re qal bike û jê bipirse ka dê çi bike, çawa bike? Çawa bijî? Wê bi tena serê xwe nizanibû biçe hepisxanê. Di mehela wan de dikandarek hebû, dikandar wê û bavê wê nas dikir. Wan tiştên xwarinê ji wî dikandarî dikirîn. Wê biryara xwe da ku biçe, ji dikandar bipirse, bê mirov çawa diçe hepisxanê. Bavê wê ji dikandar re gotibû ku

kurê wî di hepisxaneyê de ye. Dikandar miheqeq zanibû hepisxane likure û çawa mirov diçe wir.

Pepûk çû û ji dikandar pirs kir ku hepisxane likur e û mirov çawa diçe wir. Dikandar jê re navê hepisxanê û cihê wê di kaxiz de nivîsî û got :

- Tu vê adresê bi şoferê dolmîşê nîşan bide, ew dê te li wir dayne.

Dikandar jê re cihê ku dolmîş radibin û diçin jî got. Wê ji dikandar re spas kir û rasterast çû cihê dolmîşê. Ew li dolmîşê siwar bû û kaxiz bi şofer nîşan da. Şofer jê re got :

- Tu runî. Ez ê te li ber hepisxanê daynim.

Mişteriyên dolmîşê tije bûn û dolmîş birêket. Wê li pêşiya hepisxanê danîn. Ew çû ber hepisxanê. Li ber derî leşkerên nobedar û gardiyan hebûn. Wê ji wan re got ku birayê wê li vir di hepisê de ye û ew dixwaze wî bibîne. Gardiyanekî jê re got ku ”îro roja hevdîtinê nîn e. sibê ye. Here û sibê were.”

Pepûk korpoşmanî ji wir vegeriya. Ew dîsa li dolmîşê siwar bû û hate mehela xwe. Lingên wê nedigirt ku biçe malê. Ji xwe di malê de, bi tena serê xwe ditirsiya. Ew ji xwe re di nav meheleyê de hinek geriya û paşê ji neçarî çû malê. Mal xalî bû. Cihê dê û bavê wê xuya dikir. Ew

çu di oedê de runişt û ji xwe re têr û tije girîya. Xwedêyo, ev çibû hatibû serî?...

Roja din, serê sibê Pepûk ji malê derket û raste rast çû hepisxanê. Wê birayê xwe dît û jê re rewşê qal kir. Birayê wê nizanibû ku bav û diya wî mirine. Ew jî li ber ket, qeherî û girîya. Wî ji xweşka xwe Pepûkê re got :

- Tu zanî hêj ez çend salan jî li hepisxanê me. Divê tu li ser lingê xwe bisekinî.
- Ma ez ê çi bikim? Çawa kiriya xanî bidim? Çawa perê nan û xwarinê peyda bikim?
- Piştî heftekê, eynê ev roj dîsa were vir. Hevalekî min heye. Ew niha li menzelê ye. Ew piºt du mehan derdikeve derve. Ez ê pê re biaxivim. Ew ê bi te re bibe alîkar.
- Baş e, ez ê hefteyek paşê bême vir.

Pepûk wê heftê li malê ma. Ew ji malê dernediket, newêrabû biçe derve û bigere. Ji du rojan careke diçû ji dikanê nan û tiştên xwarinê dikirin. Ew li benda roja hevûdudîtinê bû ku here û birayê xwe bibîne.

Ew li malê, ji xwe re diramiya û difikirî, dê çawa bibûna? Ji berdana hevalê birayê wê re mabû du meh. Wê dê van du mehan çi bikira? Gelo hevalê birayê wê yekî çawabû? Baş bû, xerab bû, diz bû, dirûst bû? Çibû?

Roja hevdîtina hepisxanê Pepûk çû cem birayê xwe. Yekî navsal jî bi birayê wê re hatibû hevdîtinê. Temenê mêrik navbera çil, çil û pênc salan hebû. Birayê wê wan bi hevûdu da nasîn û jê re got :

- Xalê Hemîd du meh paşê ji hepisxanê derdikeve. Ew dê te bibe mala xwe. Te xwedî bike, ji te re karekî bibîne, heta ku ez derkevim.

Pepûk mehekê di malê de bi tena serê xwe ma. Êdî perê wê qediya bûn. Pere tunebû ku ew xwarin bikire û nikaribû heqê kiriya xanî jî bide. Ew dîsa çû cem birayê xwe û rewşê jê re got. Birayê wê ji hevalên xwe yên hepisê hinek pere deyn kir û danê.

Du meh derbas bû. Hevalê birayê wê ku navê wî Hemîd bû hate berdan. Hemîd li bajêr nedima. Mala wî li navçê bû. Ew ji hepisxanê rasterast hate mala Pepûkê.
Hemîd ji Pepûkê re got :

- Ez ê van eşyayên mala we bifroşim û te bi xwe re bibime mala xwe. Mala min li navçê ye. Ew der qezake biçûk û xweş e.

Pepûkê jî jê re got :

- Birayê min ez teslîmê te kirime. Tu çawa zanî weha bike.

Hemîd tiştên nav male firotin û kilîta xanî da xwediyê xanî û Pepûkê bi xwe re bire mala xwe. Jina Hemîd û sê

zarokên wî hebûn. Yek keça biçûk û du xortên ciwan bûn. Jina Hemîd ji hatina Pepûkê aciz bû. Pêşî ew tirsa, wê got qey “Hemîd bi va keça ciwan re zewiciye û wê wek hewî di ser de aniye.” Lê, paşê wextê ku wê rewş fêm kir, nerm bû.

Pepûk çendek di mala Hemîd de ma. Ew hêj çardehsalî bû û bi serê xwe nikaribû karekî bibîne ku bixebite. Hemîd çi kar dikir, kes nizanibû. Jina Hemîd carna bi mêrê xwe re şer dikir û jê re digot :

- Tu nikarî min û sê zarokên me xwedî bikî, te vê keçikê jî anî û li me zêde kir.

Ji minaqeşên jin û mêrî, Pepûkê fêm kir ku Hemîd dizî û qaçaxgerî dike. Rewşa wan a aborî nebaş bû lewre jî ew ji Pepûkê ketine aciziyê. Pepûk ji xwe re li riyeke, li çareseriyek digeriya.

Rojekê Hemîd û hevalekî xwe hatin malê. Hemîd hevalê xwe bi pepûkê da nasîn. Navê wî Cengiz bû. Li gor ku Hemîd jê re got; ew û Cengiz jî hevalên hev ên hepisxaneyê ne. Cengiz li bajêr dimîne û aşxana wî heye. Hemîd xwest ku Pepûk bi Cengiz re biçe û di aşxaneya wî de kar bike, maeş bigre û pê xwe û birayê xwe ê hepisxanê xwedî bike.

Pepûkê ji neçarîyê pêşniyaza Hemîd qebûl kir. Cengiz ew şev li wir ma û serêsibê wî û Hemîd di odê de bi

hevre bi dizî bi qasê nîv saet axifîn û paşê Cengiz wê da pey xwe û bire bajêr. Ew li bajêr çûn malekê. Li malê tu kes tunebû. Cengiz ji Pepûkê re got :

- Êdî ev mala te ye. Binêr! Min ê dawet –dîlan – jî çêbikira, lê perê min tunin ku ez dawetê çêkim.

Pepûk ji van gotinan ma şaş û ecêb. Ew ji gotinên wî gelek hêrs bû, wê xwe aciz kir û ji Cengiz re got :

- Tu çi dibêjî? Daweta çi? Ma ez bi te re zewicîme ku tu dawetê çêbikî?
- Belê, min te ji Hemîd xwest û wî jî te da min.
- Ev derew e. Wî ji min re got aşxaneya Cengiz heye, tu dê li wir kar bikî.
- Na, newisan e. Ji bo ez bi te re bizewicim min te xwest û min qalindê te jî dayê.
- Qalindê çi? Ma ew bav û birayê min e ku qalindê min bigre?
- Hemîd rewşa te ji min re bahs kir. Birayê te jê re gotiye : ”Yekî bibîne û wê bizewicîne.” Wî jî te zewicand. Ma wî xerabî kir?
- Belê, xerabî kir. Bêku haya min jê hebe, wî ez firotim.
- Firotin, mirotin, êdî tu bûyî jina min.
- Ez qebûl nakim. Hetanî birayê min ji hepisxanê dernekeve ez nazewicim. Min paşve bibe cem Hemîd.
- Nabe. Ez te paşve nabim.

- Tu min nebî, ez ê bi tena serê xwe biçim.
- Hemîd mala xwe ji wir bar dike. Ew sibê ji wir diçe bajarekî din. Tu biçî jî, tuyê wî nebinî. Min gelek pere dayê û ez te bernadim.

Pepûka reben, runişt û giriya û di dilê xwe de got : "Xwedêyo, ev çibû hate serê min?" Mêrikê bêbext wê firotibû. Ew hêj digiriya, Cengiz rabû û jê re got :

- Niha ez diçim. Ez ê êvarê werim. Tu li benda min be.

Cengiz deriyê odê li ser kilît kir û ji malê derket. Wî deriyê malê ê alî derve jî kilît kir û çû. Pepûk di odê de mabû hepiskirî. Ew geh digriya û geh ji xwe re diramiya û difikirî. Wê ferq kir ku êdî xelasiya wê tune. Ew mecbûr mabû ku ji qedera xwe a xerab re serî bitewîne.

Bûbû êvar. Derî vebû. Cengiz hatibû. Di dest de torbe û paket hebûn. Wî hinek tiştên xwarinê kirîbûn. Wî ji Pepûkê re jî cil û lîbas, etek û blûz kirîbûn. Cengiz wê ji odê derxist û bire metbexê. Wî li ser masê tiştên xwarinê rêz kirin û ji wê re got :

- Xwarina xwe bixwe. Min ji te re diyarî kiriye.

Pepûk birçî bûbû. Wê hinek xwarin xwar, lê nan di qirika wê de neçû xwarê. Piştî nanxwarinê, Cengiz paketê vekir û etek û blûzê danê û jê re got :

- Min vana wek diyarî ji te re kirîn. Here odê û li xwe bike, ka ez binêrim li te dibe û bi te dikeve an na.

Pepûkê etek û blûzê girtin û çû odê. Wê cil û lîbasên ser xwe derxistin û wan li xwe kir. Ew di nav van cilên nû de gelek rind xuya dikir. Cengiz jê re got :

- Binêr, çiqas li te ket, te xweşik kir. Ez ê hêj gelek cilên nû û diyariyên xweş ji te re bikirim.

Xaniyê ku Pepûk li wir bû û bi zora Cengiz lê hatibû hepiskirin, du ode û salonek bû. Di salonê de dîwan, koltix û televizyon hebû. Di odekê de livîna razanê û di odeyeke din de jî livînek din, kursî û masa makyajê hebûn. Cengiz ji bo ku wê bixapîne, ji hezar kaniyan av anî. Wî dixwest wê îqna bike ku ji ber rewşa wê ya neçar, ev zewac ji bo wê xêr e. temenê Cengiz bîstûbênc salî hebû. Cengiz ji wê re digot :

- Tu biçûkî jî xem nîne. Ma qey ez pir mezin im. Ez jî bîst salî me. Tuyê bibî jina malê. Em ê mehê carekê biçine cem birayê te ê hepisxanê. Ez ê pere jî bidime wî. Ew jî dê bi zewaca me qayil bibe. Tu bi min re nezewicî, tuyê çi bikî? Bi kuve biçî? Çawa xwedî bibî? Keçek wek te biçûk, rind û xweşik li kuçan bikeve destê guran, dê te parçe bikin. Binêr keçek ji mala bavê xwe revîbû, di kuçan de deh kesan tecawizê wê kiribû. Tu bixwazî jî, êdî nikarî Hemîd bibînî. Tu wî bibînî

jî, ew dê te bifroşe yekî din. Ew mirovekî nebaş e, diz e, qaçaxger e.

Cengiz bi van gotinan û bi gelek gotinên din Pepûkê îqna kir ku tu riyek din li pêşiya wê tune û divê ew ji vî halê xwe razî be. Wan hetanî derengê şevê bi hevre xeber dan. Welhasil Cengiz wê îqna kir û ew şev pê re raza. Dema Cengiz pê re kete gerdekê û qîzaniya – bekareta – wê xerab kir, ew gelek êşiya. Pepûka reben ji xwe re digriya û di dilê xwe de digot "Wax li min Pepûka reben û belengaz. Ev çibû hate serê min."

Pepûkê digot qey êdî ew bûne jin û mêr. Lê, Cengiz herşev nedihat malê. Ew du, sê şevan carekê dihat li cem radiza, pê re şadiman dibû û diçû.

Di navberê de demek derbas bû. Rojek, berbiêvarê Cengiz û zilamekî navsal bi hevre hatin malê. Temenê zilam çil û pênc, pênce sal hebû. Cengiz ji wê re got :

- Ev bavê min e. Ji navçê hatiye vir. Ew dê îşev li vir be û sibê biçe.

Pepûka reben, çi bike, çi bibêje. Wê destê xwezûrê(!) xwe maçî kir, jê re xêrhatin got. Paşê ew çû metbexê, sifra xwarinê amade kir. Cengiz û zilam li metbexê xwarin xwarin. Piştê xwarinê Cengiz got karê min heye, ew ji malê derket û çû.

Pepûk û zilam man bi tenê. Zilanê ku xwedêgiravî bavê Cengiz bû û herweha xwezûrê wê bû, bi çavên wisan pîs li Pepûkê dinêriya ku, lênêrîna wî ne wek lênêrîna xwezûran bû. Pepûka belengaz a bêfam, bi çavên xwezûrê xwe li zilam dinêriya. Xwezûr û Xwesû ji bo bûkan wek dê û bavê wan bûn. Ji xwe gelek bûk ji xwesiya xwe re dibêjin dayê û ji xwezûrê xwe re dibêjin bavo. Diya Pepûkê jî ji wê re careke gotibû : ”Xwezûrê mirov jî wekî bavê mirov e.”

Zilam li televizyonê hinek temaşe kir û paşê ji Pepûkê re got :

- Araq, şerab yan jî bîra, tiştekî vexwarinê tune ku ez vexwim.
- Cengiz çend şûşên ku ava sor têde ye anîbû û danîbû dolaba qeşayê. Lê, ez nizanim çine.
- Ka here, bîne, ez lê binêrim.

Pepûk çû, ji dolaba qeşayê şoşeyek derxist û anî. Mêrik dît û got ”ev şerabe. Qedehe bîne û dayne ser masê.”

Pepûkê şûşa şerabê û qedeh anî danî û ser masê. Mêrik dest pê kir û şerab vexwar. Mêrik îsrar kir ku Pepûk jî bi wî re şerab vexwe. Lê, Pepûkê qebûl nekir û venexwar.

Di televizyonê de fîlm dilîst. Pepûkê li fîlmê temaşe dikir. Dema fîlm qediya, wê ji mêrik îcaze xwest ku biçe û raze. Mêrik jê re got :

- Baş e, tu here raze. Ez ê paşê bêm.
- Di odeya mezin de livîna mezin heye. Tuyê li wir razî. Ez ê jî di oda biçûk de bim.

Pepûkê van gotinan got, çû û di oda biçûk de, cilên şevê li xwe kirin, kete nav livînê û raza. Ew di xewa şêrîn de bû, hew dît ku destek li laşê wê digere. Wê got qey Cengiz hatiye malê û hatiye nav livîna wê. Lamba biçûk li ber serê wê bû. Wê destê xwe dirêj kir, çawa ku pêl li pişkoja lambê kir û lampê pêxist, dît ku waye ew zilamê ku xwedêgiravî bavê Cengize, di nav livîna wê de ye û dest lê digerîne.

Pepûk tirsiya û kir qêrîn û hewar. Mêrik destê xwe da ser devê wê. Wî nehêşt ku ew hewar û qêrînî bike. Mêrik bi zorê tecawizê wê kir û paşê ji ser rabû û jê re got :

- Binêr, ez ji te re rastiyê bibêjim. Ez bavê Cengiz nînim. Ew mirovekî diz e, qebrax e. Ew keç û jinan difroşe.

Dema Pepûkê van gotinan bihîst, dinya wê xerab bû, heş û eqilê wê çû. Wê kir qêrîn û hewar, giriya, giriya û giriya. Mêrik karê xwe pê qedandibû, ji malê derket û çû. Pepûka reben ma bi tena serê xwe. Hetanî serê sibê, ew raneza û giriya.

Piştê nîvroyê Cengiz hate malê. Wê êrişê Cengiz kir, pê re şer kir, pev çûn, gotinên nebaş jê re gotin. Cengiz

mecbûr ma û jê re rastiyê got. Pepûka reben fêm kir ku mesela zewacê derew e. Cengiz wê ji bo firotina laşê wê, anku wê wek qehpikan bi kar bîne, xapandiye û wê ji Hemîdê hevalê birayê wê kirîye.

Cengizê qebrax ê jinfiroş, piştî wê rojê, êdî şevê yekê dianî cem Pepûkê. Wî car caran wê dibire bar û pavyonan û li wir wê difrote zilaman.

Demeke dûr û dirêj wiha dom kir. Cengiz wê bifrotana kî, wê ji wan zilaman re çîroka xwe û malbata xwe bahs dikir û ji wan alîkarî dixwest. Lê, ji tirsa Cengiz kesekî newêrabû jê re alîkarî bike.

Ev rewş wiha dom kir, heta ku ew rastê vî zilamê baş hat. Cengiz di pavyonê de Pepûkê weke konsomatrîs didane xebitandin. Pepûk li pavyonê bû û wek konsomatrîs kar dikir. Cengiz û patronê pavyonê Pepûka panzdeh salî a spehî difrotin mişteriyên pavyonê. Wan navê Pepûkê guhertibû û kiribû ”Yelîz”. Ew diçû li ber masa mişteriyan rudinişt û paşê bi yekî ku wê bixwestana re diçû, pê re bişev radiza û heqê pêşabûna seksê jê werdigirt.

Şevekê du zilam hatin û li pavyonê runiştin. Dema ew herdu zilam hatin pavyonê, karmendê birêvebirê pavyonê Pepûkê anku ”Yelîz” şiyand cem van herdu mişteriyan. Pepûk çû, li cem wan rûnişt. Herduyan

cîntonîk vedixwarin. Wan ji Pepûkê – Yelîzê – re şampanya xwestin. Herduyan hem vedixwar û hem jî sohbet dikirin. Ji herdu zilaman yekî ji Yelîzê re got :

- Tu hêj pir ciwanî. Ma heyf nîne ku tu ketî vê riya xerab.
- Ez mecbûr bûm. Ji ber neçariya xwe ketim vî halî. Ez bi riza dilê xwe neketime vê riya xerab.

Pepûkê dest pê kir û çîroka xwe, serpêhatiyên ku hatibûn serî û rewşa malbata xwe û bêbextiya hevalê birê xwe ji wan re qal kir. Dema Pepûkê çîroka xwe qal kir, hêstir ji çavên zilam hatin xwarê.
Zilam ji Pepûkê re got :

- Ji çîroka te diyar dibe ku tu kurdî. Malbata te koçber bûye û hûn hatine metropolên bêbav û ev tişt hatine serê we. Ne wisane?...
- Belê, wisan e. ez bi kurdî zanim biaxifim. Em ji filan gundî ne. Gundê me gelek xweş bû, lê askeran gund şewitandin.
- Em herdu jî kurd in. Ez bîst sal li sirgûnê mam. Hêj nû ez hatime. Ez ê alîkariya te bikim û te ji nav vê çamorê xelas bikim.
- Teşekur dikim. Xwedê ji te razî be.
- Birayê te ji hepisxanê derketiye yan na?
- Ez nizanim. Haya min jê tune. Lê, divê niha derketibe.
- Tu çend salîyî?

- Ez şanzdeh salî me. Du, sê salin ku ez di nav vê bataxê de me. Min ji gelek kesan alîkarî xwest, lê kesekî bi min re alîkarî nekir.
- Xem nexwe. Ez ê alîkariya te bikim.

Zilamê ku ji sirgûnê vegeriyabû, bi hevalekî xwe ê berê re hatibû pavyonê. Hevalê wî ew anîbû pavyonê. Wî gotibû : ”Em biçin, li reqsa dansozan temaºe bikin. Li wir keçên xweşik hene. Em ê yekê bînin, bi şev pê re bimîne.” Loma ew çûbûn wir. Di heş û eqilê yê sirgûnkirî de, êdî ne bi keç meçan re razan hebû, ew difikiriya ku dê çawa alîkariya vê keçika rebena kurd ku şanzdeh salî ye û ketiye bar û pavyonan. Ew bi hevalê xwe rev ê rewşê şêwirî. Hevalê wî got :

- Xwediyê vê pavyonê zilamê mafyayê ye. Dê serê me bikeve teşqelê. Dikare şer û pevçûn pêk bê.
- Çi bibe, bibe, divê em alîkariya keçika reben a neçar bikin.
- Em ê çawa bikin?
- Divê em riyeke bibînin. Binêr, dema min vê keçikê dît, keça min hate bîra min. keça te jî heye. Tiştên ku hatine serê vê keçika kurd, dikaribû bê serê keçên me jî. Em kurd in. Bîst salên min ji bo bedêla doza kurd û kurdayetiyê bû.
- Temam. Em ê riyek bibînin.
- Keçik biçûke û li gor zagonên dewletê keçeka biçûk nabe ku karên weha bike.

- Belê, qedexe ye. Em polîs bixin dewrê. Wê demê em û ew nayên hemberên hev.
- Polîsên nasên te hene?
- Erê, hene. Hem jî gelek in. Amirê emniyeta vî bajarî bi xwe nas û dostê min e.
- Wisane tu rewşa keçikê ji wî re bibêj.

Wan biryar dan ku polîs têxin dewrê. Keyfa keçikê jî hat ku ew dê ji çamûra bar û pavyonan xelas bibe. Keçikê anku Pepûkê ji zilamê sirgûnkirî daxwaz kir ku ew jî îşev bi wan re were otelê û li cem wan bimîne.
Zilam jê re got :

- Tu wekê keça min î. Ez ê çawa te bibim û bi te re razim. Waye ez dixwazim te ji nav vê çamorê xelas bikim.
- Tu min nebî, kebraxê min ê ku min difroşe dide zilaman û ev der dê min îşev bi yekî din re bişînin. Êdî ez tehemûl nakim ku bêhna pîs û zilamên serxweş bikşînim û hetanî serê sibê di paşila wan de razim. Lewre jî ez dixwazim ku îşev bi we re werim. Hatina min ne ji bo pevşabûnê ye, anku ne ku em bi hev re razin. Ez di te de germîya bavê xwe dibînim. Loma ez dixwazim bi te re bêm.
- Heger wisane, temam. Were. Ez ê te bibim. Tu dê di otelê de, bi tena serê xwe rehet û êsa razî. Otêl otêla kurê apê min e. Li wir kes nikare têkilî te bibe.

Wan heqê şeveka Pepûkê dan zilamê pavyonê û wê bi xwe re birin otelê. Li otelê, zilamê sirgûnkirî ji Pepûka reben re got :

- Here oda otelê xwe bişo, banyo bike. Ez ê ji te re xwarin jî bişşînim odê. Xwarina xwe bixwe û rehet raze. Sibê, em ê te bişînin pavyonê. Tu li wir be, paşî dê polîs bên wir û te ji wir xelas bikin.
- Teşekur an jî bi gotina te spas. Tu gelek başî. Te ji êvarê ve navê xwe ji min re negot. Ez dixwazim navê te fêr bibim.
- Navê min Alî Bedirxan e. Ez ji Amedê – Diyarbekirê- me.
- Navê min jî "Yelîz" nîn e. Navê min Pepûk e.

Pepûk ew şev li oda otelê rehet raza. Roja din, wê kirin texsiyê û şandin pavyonê. Hevalê zilamê sirgûnkirî anku hevalê Alî Bedirxan ê Diyarbekirî çû cem komserê polîsan û rewşê jê re qal kir. Komser ekîbet polîs amade kir û ew jî bi wan re çû li pavyonê keçika pepûk girt û ji bo ku li pavyonê keçeka bi temenê xwe biçûk dane şixûlandan, loma jî pavyonê mohr kirin û girtin. Li ser îfada Pepûkê polîsan Cengiz jî girtin û dan mahkemê.

Dadgehê Cengýz tewqif kir û şiyandin hepisxanê. Pepûkê jî kirin dýbistana kesên bêxwedî. Ew hêj şanzdeh

salî bû, divê hetanî hijdeh salên xwe li dibistana bêkesan a dewletê de bimana.

Zilamê sirgûnkirî anku Alî Bedirxan ji bo ku keçikê ji nav çamora bar û pavyonan xelas kiribû, dilxweş bû, bi wijdan rehet bû.

# MEZELÊ AYŞE ŞANÊ

Li qereqolê kaxiz îmze kir û derket. Ev bûbû çend meh ku her roj dihatin vê qereqolê û îmze dikirin, xwe didan nîşandan ku waye ew li wir e, neçûye cihek din. Ew bûbû bîst û pênc sal ku li bakurê Ewropayê, li Swêdê bi cih û war bûbû.

Jiyana wî ya li Swêdê baş bû. Hêla aborî de rewşa wî normal bû. Zarokên wî li dibistanê bi zimanê zikmakî anku bi kurdî dixwendin. Digel zimanê Swêdî bi kurdî jî hebûna perwerdeyê weke welatparêzekî kurd wî şad û bextiyar dikir. Ev bûbû bîstûpênc sal yek rojeke jî polîs nehatibû û navêtibû ser mala wî, li mala wî kontrol pêk nanîbû, tiştek seh nekiribû. Ji xwe ew qet rojekê jî nebûbû girtiyê destê polîsan. Wî bi kesekî re li hev nexistibû, têkilê tişteke xirab nebûbû. Wî jiyana xwe ya sade weke welatparêzekî kurd domandibû.

Ew kurdekî Anadoliya navîn bû. Li gundekî navça Konya'yê hatibû dinê. Kurdên Kurdistanê ji wan re digotin kurdên Konyayî. Bapîrên wan di dema

Împaratoriya Osmaniyan de ji Kurdistanê hatine sirgûnkirin û encama koçkirinê de hatine Anadoliya navîn. Hinek kurdên koçber li derdora bajarê Konya'yê, hinek derdora Haymana, Polatlî û Ankara'yê, hinek li derdora Kirşehîrê bi cih bûne.

Di ser koçkirina wan de çend sedsal derbas bûye, lê wan hêj jî zimanê xwe yê dayikê, anku kurdî ji bîr nekirine û bi zimanê xwe yanî hêj jî bi kurdî diaxifin. Çerxa asîmîlasyonê herçiqas li ser ziman hinek tesîr bike û peyvên tirkî bikeve nav kurdîya wan jî, dewleta nîşadperest a tirk bi tevahî nikaribûye wan asîmîle bike. Malbata wî jî asîmîle nebûye û ew ji dê û bavê xwe kurdî fêr bûye û bi kurdan re tim bi kurdî dipeyive.

Dema wî li Swêdê – Li bajarê Stockholmê – kar dikir, salê carekê di meha havînê de diçû navça xwe ya girêdayê bajarê Konyayê. Lê, piştê ku teqawid bû, êdî salê çend caran diçû Tirkiye û Kurdistanê. Ew du car çûbû li temamê bajar û navçên bakurê Kurdistanê geriyabû û herî pir jî li Amedê mabû. Paşê ew çûbû bajarê Sêrtê. Wî dixwest bi çavên serê xwe here cihê ku laşê dostê wî Serdar Ararat avêtine wir ku ji wir re dibêjin "Newala Qesaban" bibîne. Serdar Ararat nasnavê serokê şaredariya – belediya- Agriyê bû. Navê wî ê rastî Urfan Alpaslan bû, lê wî navê Serdar Ararat bi kar dianî. Ew beriya 12 Îlonê wek namzetê serbixwe ketibû hilbijartinê û qezenc kiribû. Lêbelê dewletê ew rehet nehêştibû. Ew

hatibû girtin, ketibû hepisê, hatibû birîndar kirin û piştî reîstiyê –serokatiya belediyê- ji destî girtibûn û ew bûbû mahkûm.

Wan hevûdu li Swêdê nas kiribûn. Ew bi Serdar re gelek bûbû alîkar. Wî di mala xwe de kiribû mêvan. Ji xwe wî bi dil û can bi kurdên ku ji ber cunta faşîst a leşkerî reviyabûn û hatibûn Swêdê re alîkarî dikir. Serdar jî yek ji wan bû û piştê demekê ew vegeriyabû çûbû welêt ku di qada şerê çekdarî de cih bigre. Ew li serê çiyê di ºerekî de hatibû şehîd kirin. Piştî şehîdbûna wî, pê hesiyabû ku laşên gelek çekdarên li çiya hatine kuştin anîne û avêtine ”Newala Qesaban”. Loma jî wî dixwest li wir bibîne û wî di dilê xwe de digot ”dê roj bê, bakurê Kurdistanê jî weka başurê Kurdistanê azad bibe û em ê li ”Newala Qesaban” peykera şehîdên azadiya welêt çêkin û wir bikin cihê serlêdana gorîstana Şehîdên Kurdistanê.

Wî ji xwendina nivîsên kurdî hez dikir û wî bi xwe jî car caran gotarên bi kurdî dinivîsand. Herwiha wî ji gohdarîkirina kilam û stranên kurdî haz werdigirt. Stranên dengbêjên klasîk hest û ruhê wî xweşhal dikir. Dengê stranbêja jin Ayşe Şan pê pir xweş dihat û tim gohdariya stranên wê dikir. Dema ew pê hesiyabû ku Ayşe Şan li bajarekî metropolê tirkan de di nav xizaniyê de çûye ser heqiya xwe, ew gelek ber ketibû.

Wî biryara xwe dabû ku mezelê Ayşe Şanê ji bajarê Îzmîrê bibe Amedê – Diyarbekirê- û li wir ji bo Ayşe Şan gorîstaneke xweş çêbike ku bibe weke ziyaret û kurdên ku gorîstanê bibînin Ayşe Şanê tim bi bîr bînin. Ew ji bo pêkanîna vî tiştî kete nav hewldanê. Wî fikrê xwe ji kurdekî dostê xwe ê dewlemend re got. Kurdê dostê wî bazirgan bû, pereyê wî hebûn û wî jî soz û peyman da ku piştgiriya vê hewldanê bike.

Ew ji bo pêkanîna vê hewldanê ket hareketê. Wî berê xwe de welat. Ew çû bajarê dilê welatê xwe, anku çû bajarê Amedê. Li wir nas û dostên xwe dîtin, ji wan re behsa hewldana xwe kir. Hemûyan jî wî pîroz kirin ku wî dest avêtiye karekî wiha. Ew çû cem serokê şaredariyê û mesela anîna mezelê Ayşe Şanê ji wî re jî rave kir. Serokê belediyê gelek şad bû û piştgiriya hewldana wî kir. Serokê şaredariyê soz û peyman da wî ku ew ê bi her awayî piştgiriya wî bikin û ji bo dîtina cihê mezel ku lê gorîstaneke xweş bê çêkirin, bibînin.

Piºtî ku li Amedê cihê mezelê Ayşe Şanê hate diyar kirin, wî berê xwe da Îzmîrê û çû cem keça Ayşe Şanê û daxwaza neqilkirina goristana diya wê jê re got. Wî bi teferuat bahs kir ku ew ê li Diyarbekirê goristaneke pir xweş ji bo Ayşe Şanê çêbikin û ew der bibe wek ziyaretgeha hemû dengbêjên kurd.

Lê, çi heyf ku keça Ayşe Şanê vê daxwza wî qebûl nekir. Wê nedixwest ku mezelê diya wê bibine Amedê. Loma jî wî ji neçarî, mezelê Ayşe Şanê yê li Îzmîrê ji nû ve bi teht û nihîtên giranbiha çêkir. Her çiqas wî mezel neqlê Diyarbekirê nekiribû jî, wî daxwaza nûçêkirina mezelê Ayşe Şanê anîbû cih û bi hizûr çûbû navça xwe.

Lêbelê, mala sîxûr û îxbarciyan xerab bibe. Yekê sîxûr çûye îxbara wî kiriye û gotiye ”Ev zilamekî cudaxwaz e, piştgirê terorîstan e, mezelê stranbêja kurd ku bi kurdî kilam gotiye, çêkiriye, di înternetê de bi kurdî nivîs dinivîse û hwd.”

Destê serê sibê cendirman avêtin ser mala wî ya li navçê, ew girtin, destê wî kelepçe kirin û wî birin qereqola cendirman. Dema leşkerên ku bi navê cendirme têne binavkirin avêtin ser mala wî û herder seh kirin, jin û zarokên wî tirsiyan, qurifîn. Ew bîst, sî sal bû ku li Swêdê bû, hêj yek rojek jî leşker yan jî polîs nehatibûn mala wî seh nekiribûn. Ev cara yekem bû ku tiştekî wiha tê serê wan û lewre jî malbata wî gelekî tirsiyabû.

Wî bi destê kelepçekirî girtin û birin qereqolê û kirin nezaretê. Qumandarê qereqolê bi leşkerekî ve hat nezaretê, bi çavên dijminahî lê nêrî û ji katib re got ”Nasnameya wî bigrin, nav û adresa wî binîvîsin û wî bînin oda min.”

Qumandarê qereqolê lê pîs, pîs mêze kir û çû oda xwe. Leºkerê katib wî bire odekê û navê wî di kompîturê de qeyd kir. Katip nasnama wî jê stend, li nasnamê mêze kir û ji bo nav û paşnavî tesdîq bike, jê pirsî :
Navê te çiye?
Hesen
Paşnavê te?
Alê
Adresa te?
………………

Katib karê xwe qedand û jê re got : ''Were, em biçine hizûra Qomutan.'' Ew çûn ber derî, katib li derî xist û îcaze girt, ketin odê. Katib ji odê derket, ew û Qumandarê qereqolê man bi tenê.
Qumandarê qereqolê jê re got :
- Îxbara te kirine. Tu ji ewropayê hatî û li van deran rihet nasekinî.
- Min çikirîye ku ez rihet nasekinim?
- Êdî tu çi bikî, tu bolucîtî – cudaxwazî – dikî, tu piştgiriya terorîstan dikî, tu dixwazî vî welatî perçe bikî, ulan ji van tiştan xerabtir çi heye hi….
- Ev gotinên te ne di cî de ye. Tiştên ku tu min pê tawanbar dikî, nerast e. Ez wekî tu dibêjî nînim û min tu tiştekî xerab jî nekiriye.
- Ulan te çawa nekiriye….Te mezelê jinika cudaxwaz çêkir yan na?

- Min mezelê hunermendeka kurd çêkir û mezel çêkirin qedexe nîn e?
- Qedexeye, nîn e, tuyê bibînî. Tu li înternetê nivîsên cudaxwaziyê dinivîsî yan na?
- Ez nivîs dinivîsim, lê nivîsên min dîtinên min in û necudaxwazî ne, azadîxwazî ne.
- Tu cudaxwaz nîn î? Ji bo kurdan heq, tişt, mişt naxwazî?
- Ez azadiya kurdan diparêzim, ev jî cudaxwazî nîn e.
- Hûn cudaxwaz nîfaqê dixin nav civakê. Di vî welatî de yek al, yek millet, yek dewlet heye. Hemû hemwelatî li pêşberê zagonê wekhev in û tirk in.

- Hemû hemwelatî tirk nîn in. Ez kurd im û bi milyonan kurd hene. Kurd heqê xwe yên demokratîk û netewî dixwazin. Wekhevîtî û biratî bi înkarê pêk nayê, bi heqdayinê pêk tê. Ev heştê salin dîtina fermî a dewletê dibêje "hemû hemwelatî wekhev in, bira ne" lê, heqî birayekî ji bo hertiştî heye û heqê birayê din ji bo tu tiºtekî tune. Ma ev e wekhevî û biratî? Hûn azadî xwestinê jî weke sûc dibînin….
- Binêr tu bi van gotinên xwe cudayetî dikî, dîtinên cudaxwazan diparêzî. Ez ê te bidime mahkemê, bila dadgeh cezayê te bide.
- Min bide mahkemê. Lê, tu sûcekî min tune. Heger fikir parastin suce, ez ji bo cezayê sucê parastina fikrî amademe, çi ceza didin min, bidin.

Qumandar pêl li zîlê kir, leşkerek hat li derî xist û kete hundir. Qumandar jê re got : ''Vî bibe, îfadê wî bigrin. Paşê wî bikin nezaretê Sibê wî bibin dadgehê û derxin mahkemê.''

Wî birin, îfada wî girtin û wî kirin nezaretê. Ew şev li nezaretê ma, serêsibê ew birine dadgehê. Li mahkemê sawcî jê re got :
- Îxbara te kirine. Dibêjin tu piştgiriya terorîstan dikî. Tu li Înternetê nivîsên cûdabûniyê dinivîsî û te mezelê jineka stranbêj a cûdaxwaz çêkiriye. Ka tu ji bo van sucdariyan çi dibêjî?
- Diyare sixûran bi derewan ez kirim tawanbar. Ez bersîva hersê tiştên ku li hemberê min tên îdîakirin bidim.
1 – Ez piştgiriya -bi gotina we- yên terrorist nakim. Lê, li gor dîtina min ew hêza ku hûn dibêjin terrorist neterorîst in. Li gorî we hemû kurd terorîst in. Yên ku hûn ji wan re dibêjin terorîst neweke Bader Meînhhov yan Kizil Tugaylar in, ev ji gel alîkarî digrin, bi milyonan kurd piştgirên wan in.
2 – Di Înternetê de min bi kurdî nivîsiye. Bi kurdî nivîsîn cudabûnî nîn e, heqekî tebiî ye. Kurdî zimanê min e û min zimanê xwe bikar anîye. Heger ev sûce ez vî sûcî qebûl dikim.
3 – Stranbêja jin a kurd hunermendek hêja ye û min mezelê wê çêkiriye. Heger mezel çêkirin jî sûc e, ez vî sûcî jî qebûl dikim.

Li mahkemê îfada wî girtin û paşî mahkemê biryara domkirina mahkemê da û ji bo meheke din talûq avêt. Herwiha mahkemê biryar da, qedexe danî ser ku hetanî mahkeme bi encam nebe ew nikaribe biçe derve. Yanî mahkemê wî li Tirkiyê kire hepisxana vekirî. Erê wî berdan, lê divê herroj biçe qereqolê, îmze bavêje ku waye li vir e. Êdî wî nikaribû ji Tirkiyê derkeve û herroj diçû îmzekirinê û dihat.

Roja ku ew mahkeme bûbû, êvarê li malê temaşê televizyonê dikirin. Çend nas û dostên wî yên ku pê hesiyabûn ew hatiye girtin, hatibûn serlêdana wî. Wan bi hevre sohbet kirin û li televizyonê temaşe dikirin. Di televizyonê de programeke li ser Zekî Mûren hebû. Gelek pesnê Zekî Mûren didan û ji bo wî digotin ”Turklerin Sanat Guneşî – Roja hunera tirk”, wî ji mêvanên xwe re got :
- Binêrin pesnê Zekî Mûren didin û ji bo min mezelê Ayşe Şanê çêkiriye min sûcdar dikin, bi fermî – lê bi direw – dibêjin ”hemû hemwelatî li pêşberê zagonên tirkin û wekhev in. ” Ka wekhevî? Çima bi çavên wekheviyê li du hunermendên muzîkê nanêrin.

Mêvanekî wî got :
- Ev dewlet dewleteke derewçîn, înkarcî û nedemokratîk e. Wan tu car bi çavên biratiya gelan li hemwelatiyên Tirkiyê nenêriye.

- Na heyran, wekheviya çi halê çi. Esil yên cûdaxwaz dewlet e û hinek tirkên nîjadperest in.
- Roja ku komara Tirkiya kemalîst hatiye damezrandin hetanî niha hertim dewleta kemalîst bi çavên cûda li kurdan nêriye. Kurd înkar kirine, kuştine, zilm kirine. Di sala 1925-an de Diyarbekir bajara sêyem a mezin bû, niha pênce bajar jê mezintir in. Temamê fabrîqe li rojhilatê Tirkiyê hatine çêkirin. Jê hêla aborî ve herêma kurdan paşve maye. Bi riya asîmîlasyonê bi milyonan kurd zimanên xwe yên zikmakî ji bîr kirin û bi tirkî diaxifin, anku asîmîle bûn.
- Hetanî polîtîka dewletê wiha be di nav kurdan û tirkan de aşîtî û vekhevî pêk nayê.
- Aşîtî û demokratîkbûna Tirkiyê bi çareseriya pirsgirêka kurd ve girêdayî ye. Mesela kurdan hel nebe, heqê kurdan yên netewî û demokratîk nedin, kurd negîşin azadiya xwe, Turkiye nikare pêşve biçe û nikare bibe demokratîk.

Wî û mêvanên xwe ji xwe re wiha sohbet kirin, dîtinên xwe ji hevre gotin. Piştî mehekê ew dîsa derket mahkemê. Mahkemê ti biryarek negirt û dîsa meheke talûq avêt. Ew niha herroj diçe qereqolê û îmze diavêje. Dawiya mahkemê, dadgehê biryar girt, sal û nîv ceza da wî. Sedemê cezakirinê jî ev bû ku; Xwedêgiravî ”zilam propaganda cudaxwazan kiriye.”

## HECÎYÊ NESINETKIRÎ

Hecî Emîn mirovekî dewlemend bû. Rewşa wî ya aborî pir başbû, kaçaxî dikir û dirafan didan serhev. Li qeza kû ew têda rûdinîşt çend kesên din jî wekî Hecî bi rîya qaçaxîyê dewlemend bûbûn.

Gava 12'ê îlona 1980'an de sazumana eskerî hat ser hikim, di wê qezê –navçeyê - de hema bêje ji her malê şoreşgerek hat girtin û ew avitin zîndanan. Lê tenê neşoreşger, hin kesên qaçaxcî jî nasîbê xwe jê sitandin û ew jî hatin girtin. Ew jî avêtin zîndanan û eşkence bi wan kirin. Hikmê askerî qaçaxçî jî xwe re tehlîke diditin. Lewra digotin ew qaçaxcî çek difroşin şoreşgerên cudaxwaz.

Di mala Hecî Emîn de jî tiştên qaçax hatibûn girtin û li ser vê yekê Hecî Emîn jî girtin. Bi wî eşkence kirin da kû ew îtraf bike ku malê qaçax ji kê standîye û difroşê kê.

Polîsan çavê Hecî Emîn bi qirişekê potik girêdan û ew daxistin eşkencexanê. Heta kû ew birin eşkencexanê di rê de têr û tijî lêxistin. Di eşkencexanê de polîsan Hecî Emîn tazî kirin kû ceyranê bidin laşê wî. Polîsan mêze kirin kû Hecî Emîn ne sinetkîrî ye. Polîsekî ji hevalê xwe yên din re got: "Ev sekbava sinetkirî nîne, eva Ermenî ye." Û ketin ser Hecî Emîn, lêxe ha lêxe. Hecî Emîn ji ber lêdanê taqet nekir û ji xwe va çû. Piştra ew anîn û ava sar lêkirin. Paşê dîsa ew rakirin û polîs jê pirsî:

"De bêje ma tu Ermenî yan na?"

–Hecî Emîn: "Na, wella ez Ermenî nînim."

–Polîs: "Jibo çi tu hetanî niha sinet nebû?"

–Hecî Emîn: "Ez di bicûkîya xwe da pir tirsonek bûm, ji sinetkirinê ditirsîyam. Jibo vê yekê ez sinet nebûm."

–Polîs: "Tu derewan dikî. Jibo tirsê nîne. Tu ermenî, loma tu sinet nebû."

Polîsan bawerîya xwe bi Hecî Emîn nanî û dîsa dest bi eşkencê kirin û têra xwe li wî xistin. Qîrîn û nalîna Hecî Emîn diçû erd û ezman. Hecî Emîn dît ku çare tune; polîs dê wî bikujin. Tu çare nema, ji wan ra got: "Bisekinin, li min nexin, ezê ji we ra bêjim çira ez sinet nebûme."

- Polis sekinîn û gotin; "de ka bêje."

–Hecî Emîn: ”Elhemdûlîllah, ez jî wekî we misiliman im. Bavê min, dîya min, hemû malbata min misiliman in. Ez bi xwe pir dewlemend im û ez carek jî çûme hecê. Ma gelo mirovên Ermenî qet diçin hecê? Na. Sedema nesinet bûyûna min vîya ye: Ez gava ji dîya xwe bûme, bi terefa xwedê ve ez sinetkîrî bûme. Ji vî tiştî re dibêjin “sineta nebî Mihemed.”

Ser van gotinên Hecî Emîn, polîs hinekî şas man, li hev mêze kirin û polîsekî got ka em li postê ewkê wî mêze bikin. Li postê ewkê Hecî Emîn mêze kirin, na xêr sinetkirî nîne. Dîsa li Hecî Emîn xistin û gotin ”tu derewan dikî, dixwazî me bixapînî.”

Ev bûbû çend seat kû polîsan bi Hecî Emîn eşkence dikirin. Dev û pozê wî tijî wxîn bûbû. Her derê laşê wî dêşîya. Piştî ku polîsan têra xwe lê xistin ew girtin, birin, avêtin odek din. Hecî Emîn, çav girtî di odê da li erdê dirêj bûbû. Di odê de çend kesên din jî ku îşkence ditîbûn hebûn, û ew jî dinalîyan. Lê ji wan kesî nediwêrî bû dengê xwe bilind derxe. Bi tenê ji xwe re dinalîyan. Hecî jî, ji ber êşa laşê xwe deyax nekir û dest bi hawar û qîrînê kir. Bi dengekî bilind diqîrîya.

Ji wan kesên din yekî, ji Hecî Emîn re got: ”De megrî, ger tu wiha bi dengê bilind bigrî, dê bên te dîsa bibin û li te eºkence bikin.”

–Yekî din got: ”Tu qey mêr nînî! Mirov li ber dijmin nagrî.”

–Yê sîsîyan got: ”Megrî! kêfa dijmin li me xwe° neke. Tu çiqas bigrî, yê hîn zêde li te xin.”
Ser van gotinan êdî Hecî Emîn qîrîn û hawara xwe birî, edî nema digriye.

Demek şunda ew kesên ku di wê odê de bûn, çend car bi der û dor birin eşkencexanê û dîsa anîn avêtin wir. Gava ew dianîn hemû jî wek mirîyan bûn. Lê deng ji wan dernediket, qîrîn û zarîn nedikirin. Hecî Emîn jî çend car birin xistin bin eşkencê û anîn. Hecî Emîn edî wek berê hawar û qîrîn nedikir. Lewra, ji wan kesên din cesaret girti bû. Ji xwe re digot, ”ew çawa li berxwe didin ez jî wek wan li berxwe bidim.”

Ji wê şûnve polîsan kirin, nekrin nekarîbûn ji devê Hecî Emîn îfadê bigrin û tiştan pê bidin qebûl kirin. Polîsan nikaribûn ermenitiyê pê bidin qebûl kirin. Çiqas lêxistin, îşkence pê kirin jî bê fêde bû. Hecî digot: ”malê qacax malê min nîne û ez Ermenî jî nînim.”

Piştî ku polîsan bi Hecî Emîn eşkence dikirin û ew di avitin odê, Hecî Emîn li ser rewşa xwe pir difikirî. Polîsan, yê pir ne ji bo malê qacaxîyê, ê pirtir jibo Ermenitîyê li wî dixistin. Hecî, ji xwe şaş û ecêp mabû kû polîs ewqes neyarê Ermeniyan bûn.

Hecî Emîn difikirî, radikir û datanî û di dilê xwe de digot:

”Ez misiliman im lê, ez hewqas neyarê Ermeniyan nînim. Ev polîs, navê misilimanîyê li xwe dikin lê bê Xwedan in, bê wijdan in, kafirê mezin ew in.”

Biçûkîya Hecî dihat bîrê. Di zarokîya xwe de, ew û zarokek Ermenî ku navê wî Nubar bû, hevalê hev bûn. Ji hev pir hez dikirin, qedr û qîmet didan hevdu. Li kûçan bi hevre dilîztin. Bi hevre diçûn baxçan û fêkî dianîn, diçûn rezan tirî dianîn. Malbata wî û malbata Nubar kû hemû Ermenî bûn dostê hevdu bûn, ji hev ra digotin ”kîrîv”.

Di Qeza Hecî Emîn de tenê Ermenî xwedîye huner (senat) bûn. Das, çakuç, mahsek, qedûm û biviran wan çedikirin. Gundîyên dora qezê di hatin mehsek ji wan dikirîn û pê diçûn ji çîyê çilo jêdikirin. Ker, qatir û hespên gundîyan nal dikirin. Tim û tim feyda wan digihişt gelê qezê û gundîyan. Ermeniyan tu car zirar û zîyan nedabûn gel. Di qeza wan da Ermenî û Kurd wek xweşk û biran bi hev ra dijîyan. Hecî Emîn di van fikr û mitalan de bû, dît ku derîyê odê vebû. Dîsa ew girtin, birin eşkencexanê û lêdan.

Polîsan got : ” Me pir meewiqîne, bêje tu Ermenî an na?”

Hecî Emîn bi carekê ra got : ”Na. Ez Ermenî nînim. Ez Kurd im û misiliman im.”

Polîsan got:  ”Kurd tune, tirk hene li vir, gere tu bêjî ez tirk im.”

Hecî Emîn bersîva wan da û got: “Ez bi tirkî baş nizan im û ez tirk jî nînim. De ka tu karê we tune liminxin.”

Polîsan mêze kirin kû Hecî Emîn nayê rê. Hemû şêweyên eşkence bi wî kirin, lê fêde nekir. Ew girtin nava xwe, birin û avitin zîndanê kû tijî gû û pîsîtî bû.

Demekê şunda dîsa Hecî Emîn birin û ew avêtin nava gola gû û bi pînan li serê wî xistin, heya laşê wî daxistin binê gûwê. Hindik mabû ku Hecî Emîn di nav berma gûwê de bixeniqe.

Ew eşkenca gola gûwê jî tu fêde nekir. Vê carê polîsan gotin emê rapaşî(tecawizê) te bikin. Polîsekî pantorê xwe ji xwe danî penîsê xwe derxist û xwe da pey qûna Hecî Emîn. Wan dixwest bi vî awayî Hecî Emîn bitirsînin û wî bînin rê.

Hecî Emîn bi rastî jî tirsîya, û pêra jî kir qêrîn û xwe ji pêş polîs wêva avit û bi dengekî bilind kir qêrîn bi ser wan, têr û tîjî xeber li wan da û got:

“Hûn dixwezin rapaşî min bikin, hûn çiqes rezîl û bê namusin. Navê rûsan derketîye, lê hûn ji wan moskofan jî xeraptirin. Xwezî em di bin destên gavuran de bûna, lê nedibin destê we de bûna. Hûn qurbana gavuran bin.”

Ser van gotin û xeberên Hecî Emîn polîsan dîsa dest pê kirin û lê xistin. Polîsek ji hundir derket, çu hema mişkek mirî anî û ji Hecî Emîn re got; “vaya mişkekî mirî ye, divê tu wî buxwî.” Bi dîtina mişk va mehda Hecî li hev ket, xwe bi zorê digirt. Lê dîsa jî, ji wan re got:
“Hûn min bikujin jî ez mişkê mirî naxwim.”

Polîsek bi herdu destan devê Hecî Emîn ji hev vekir û yên din jî mişkê mirî kotan devê wî û ber bi alîyê qirika wî da dewsandin. Mehda Hecî Emîn ra nekir, lihevket û vereşîya.

Polîsan ew sosreta giran anîbûn serê Hecî Emîn, ew ji însanetîyê derxistibûn. Hecî Emîn bi nîv mirîtî birin avêtin zîndanê. Kesên kû di wê zîndanê de bûn bi Hecî re mijûl bûn; dil dan ber û gotin meraq meke, hinekî din berxwe bide. Girtiyan li ber dilê wî dan û ew teselî dikirin.

Hecî Emîn heşê xwe top kir û ji wan re got:
”Hedî ewqas dibe, taqetê min neman, pîsîtî û sosreta ku li tuderan çênebûbû û min nedîtîbû anîn serê mîn; heya mişkê mirî, bi min dan xwarinê.”

Girtiyekî got : “Ev wehşîtî ye, hovîtî ye, mêrikan bi vê kirinê hovîtîya (barbariya) xwe didin îspat kirin.”

Hecî Emîn got : ” Heta nûha limin dixistin, digotin; bêje ‘ez Ermenî me’, min got ez Ermenî nînim, Kurd im. Îcar dibêjin, Kurd tune, divê tu bêjî ez tirk im. Qeda û bela wana ez ketimê.”

Yêkî din ji wana got: “îcar şoventîya wan dest pê kir. Ji xwe ji me hemûyan re dibêjin, bêjin em kurd nînin, em tirk in.”

–Yê sîsîyan got: “Di şoventîyê de tu kes nagihije tirkan. Lê şoventîya wan jî wek wan tewş û mewşo ye. Mesele Ereb jî şovenin, lê ji milletê din re nabêjin hûn jî ereb in. Ereb ji xwe re dibêjin, em ”qawm-ûl necip”in. Yanî milletekî esîlin. Ji bo vê jî, ji kurdan re dibêjin hûn ereb nînin, hûn ekrad in (kurd in). Lê tirk ji bo ku milletekî esîl nîne û herhal xwe esîl jî nabînin, ji hemû milletên ku li tirkîye dijîn re, ji kurdan re, ji lazan re, ji çerkezan re, welhasil ji hemûyan re dibêjin hûn tirk in.”
Hecî Emîn : ”Xorto, ez ji te re rastîyê bêjim. Tirk jî asîl nînin, erebê qûn bi gû jî esîl nînin. Erebê Iraqê jî li kurdan pir zilmê dikin. Ez carekê tenê çûm hecê û min ereb di nêzda nas kirin. Li ser vê min hedî tobe kir, nema carekî din diçim hecê.”

Her roj bi lêdan û eşkence çil (40) rojên Hecî Emîn li cem polîs derbas bû. Ew derxistin dadgehê (mahkeme) û tewqîf kirin û birin kirin girtîxanê. Li wê dere girtîyên sîyasî pir bûn, çend kes jî qacaxcî di nav wan de hebûn. Ew kesên sîyasî di nav xwe de ”komûn” çêkiribûn, hemû tiştên xwe tev dikirin û tev dixwarin. Hecî Emîn jî di nav wan de bû.

Di nav wan kesê sîyasî de ebûqatek hebû; ew jî di salê Hecî Emîn da bû. Yên din piranîya wan xort bûn. Hecî Emîn bi ciwanan re pir nedida û nedistand. Lê navbeyna wî û abûqat pir xweş bû. Hecî Emîn lêdan û eşkenca ku dîtibû ji xortan û abûqat ra qalkiri bû.

Rojekê Hecî çû, li cem abûqat rûnişt û jê ra got:
”Tu mirovekî zana yî. Ka ji min re ji kerema xwe hinekî qala van ermenîyan bike. Gelo van ermînîyan çi bi serê tirkan anîye, bi wan çi kirine ku tirk ewqas neyarê (dijminê) ermenîyan in?”

Abûqat bersîva wî da û got: “Hecî, bi rastî jî ermenîyan tu tişt bi tirkan nekirî ye. Bileqis, tirkan bi wan xirabî kirine. Li wan zilm û tehde kirine. Di sala 1915’an da ermenî qir kirine, ji mîlyonekî zêdetir ermenî kuştin e. Gunahê ermenîyan ew bû ku ola (dîn) wan cuda bû. Tu zanî, ermenî xiristîyan in, xaçperestin, pêxemberê wan Muhamed nîne, Îsa Mesîh e. Ya duduyan jî, ji bo ku ew ne tirk bûn, milletekî din bûn.”

Hecî Emîn got: ”Xwedê tirkan bîstîne, bi misilimanîya wan ve. Di nav xirîstîyanan de jî misiliman hene, çira ew misilimanan nakujin. Tirk, ji Rûsan jî xerabtirin. Di nav welatê Rûs de, di Qafkasyê de bi milyonan misilman hene, rûsan ew nekuştin.”

Abûqat bersîva wî da û got: “Belê, wan nekuşt, lê tirk dikujin. Di aslê xwe de çavê tirkan di ax û welatê ermeniyan de bû. Ji bo ku axa wan di bin dagirkeriya xwe de bihêlin, wan ermenî kuştin û qirkirin.”

Hecî Emîn gote abûqat: “ Min bibore, ez hinek tiştan meraq dikime û dixwezim ji te pirs bikim. Ez zana nînim. Min dibistan nexwandiye. Gelo tu karî ji kerema xwe bi kurtayî tene behsî dîroka ermeniyan bikî.”

–Abûqat got: “Hecî, li ser dîroka ermeniyan, ez usa ji te ra îzah bikim. Kêmasîyên me şoreşgerên kurd yêk jî ev bû ku, em li ser pirsa ermeniyan nesekîn in û li ser wan me tu lêkolîn çê nekir. Me kovar û rojname derdixistin, me behsa hemû dinyayê (cîhanê) dikir; li ser Efrîqîyan, Latîn Emerîqîyan nivis dinivîsandin, lêkolîn çê dikirin, lê me li ser ermeniyan tiştek nenivîsand. Me di her hêjmara kovara xwe de behsî filîstînîyan dikir, lê me behsa ermeniyan, asuriyan, suryaniyan û çerkezan nedikir. Ji bo vê yêkê ez bi xwe li ser dîroka ermeniyan pir tişt nizanim. Lê qasî kû ez dizanim; kurd, ermenî,

faris û afxanî miletên birane, kokê wan yêke, aryan in. Lê, li gor bîrûbaweriya min hemû gelên cîhanê bira ne. Divê di nav wan de kîn, nefret û dijayetî çênebe. Divê di nav gelê cîhanê de aşîtî, vekhevî û biratî pêk bê."

–Hecî Emîn got: "De başe ku em û ermenî miletekî bira ne û koka me jî yeke, îcar, êdî li zora min naçe ku min ji bo ermeniyan ewqas lêdanê dît."

Hecî Emîn li ser vê axaftina xwe bi abûqat re êdî êşa laşê xwe jî, ji bîr kiribû, rabû ser xwe û xatir ji abûqat xwest û bi dilekî pak çû ser cîhê xwe, li ser nivîna direjket.

# RÊWÎTIYA REWŞENBÎREKÎ

Înternetê vekir, yekûyek li rojnamên rojane mêze kir. Wî pêşî çavên xwe li nûçan gerand. Nûçeya qedexekirina kovara hefteyî ya bi navê ”Lênêrîna Hefteyî” bala wî kişand. Wî nûçeyê xwend. Kovareke hefteyî ji bo ku aşîtiyê û wekheviyê parastibû, hatibû qedexekirin.

Dema wî vê nûçeyê xwend, gotinên fermandarê ordiyê ku ritba wî albay bû, kete bîra wî. Dema ew çûbû bajarê Sêrtê, wî bi polîsan re û bi qumandarê cendirman re minaqeşe kiribû. Wî li hemberê wan aşîtî, azadî, demokrasî û wekhevî û biratiya gelan parastibû, lê polîs û fermandar paşverûtiyê, nîjadperestiyê, şovenîzmê û asîmîlasyonê parastibûn. Polîs û qumandarê leşkerî kurdbûyinê, ji bo kurdan azadîxwaziyê bi cudaxwaziyê û terorîstiyê sucdar kiribû. Fermandar jê re gotibû :

- Wekheviyê ji bîr bikin. Aşîtî jî heger em bixwazin pêk tê.

Wî jî gotibû :
- Biratiya gelan li ser bingeha azadî, demokrasî û wekheviya gelan pêk tê. Herwiha dê aşîtî jî pêk bê. Hûn ê mecbûr bimînin û aşîtiyê pêk bînin. Hûn aşîtî nexwazin jî dê hinek we mecbûr bikin û dê aşîtî pêk bê.

Fermandar ji van gotinan aciz bûbû û bi hers gotibû :
- Di vî welatî de yek millet –netew-, yek al û yek dewlet heye. Yê ku hemwelatiyê dewletê ye hemû jî tirk in û li pêşberê zagonan wekhev in.

Wî jî gotibû :
- Nexwe yên netirk in tu heqekî netewî û demokratîk ji wan re tune. Ji xwe ji roja damezrandina komara tirk a kemalîst hetanî niha rewş wiha bûye.

Ew bîst û pênc sal li derveyê welat, jiyana sirgûniyê jiyabû. Piştî bîstûpênc salan vegeriyabû welatê xwe. Ew di salên sirgûniyê de bi karê nivîs nivîsînê û kar û xebata weşangeriyê û herwiha bi edebiyatê re mijul bûbû. Wî dixwest kar û şixulê weşangeriyê li welatê xwe jî bidomîne.

Di xeyalên wî de damezrandina weşanxanekê û derxistina du kovaran hebû. Wî dixwest kovareke çand û edebiyata kurdî, li ser bingeha rexnegiriyê ku têde berhemên edebî bê nirxandin, bê analîzkirin. Kovara duyem jî kovareke ramanî, îlmî/zanîstî ya lêkolînî be.

Pêwîstiya kovareke xwerû bi kurdî ya ''Kurdî Magazîn'' jî hebû, lê bila ew niha bimana.

Karê weşangêriyê bi xebata kolektîvî pêk tê û bi şêweyeke profesyonelî dighîje encamekî baş. Lewre jî wî dixwest bi kesên erbabê vî karî re bide û bistîne, dîtinên wan fêr bibe û daxwaza alîkariyê, piştgiriyê li wan bike. Loma jî ew çû bajarê Sêrtê. Li wir dostekî wî ê rojnamevan heye. Ev dostê wî di rojnamên mehelî de xebitiye û niha bûye muxabîrê – nûçegihanê – rojnama ”Evrensel” û ”Vatan”ê. Loma jî polîsên bajêr bi çavên rojnamevanê piştgirê terorîstan û komunîstan lê dinêre.

Wî biryara xwe da ku here bajarê Sêrtê. Ew çû, bilêta xwe kirî û li dolmîşê siwar bû. Wî xeber neda dostê xwe ê rojnamevan. Wî dixwest biçe wir û jê re suprîz bike ku waye ew li bajarê Sêrtê ye. Dolmîş birêket. Di rê de li cihekî ji bo bêhnvedanê, çay û qahwe vexwarinê û pêkanîna pêwîstiya tuwaletê sekinîn. Di nav mişteriyê dolmîşê de ew wek zilamekî xerîb xuya dikir. Wî bi mişteriyan re tim bi kurdî xeber didan. Yê ku pê re bi tirkî jî biaxifiya, wî bi wî re bi kurdî dipeyivî. Wî bala şofer jî kişandibû.

Di rê de li çend ciyan kontrola leşkerî hebû. Leşkeran areba didane seknandin, li nasnamên wan dinêriya û kontrol dikirin. Ê wî nasnama wî ya komara Tirkiyê tunebû. Paşaporta welatekî ewropayê pê re bû.

Paşaporta wî bala şofer, mişteriyan û leşkerê ku kontrol dikir, kişandibû. Leşker pasaporta wî girt û ji dolmîşê derket derve û li derve ji cihek re telefon kir, hinek axifî, dengî nedihat ku çi dibêje, lewre ew çûbû dûrê dolmîşê û diaxifiya. Piştî ku wî axaftina xwe qedand, hat pasaportê da wî û ji şofer re got ''temam, hûn dikarin herin.'' Dolmîş birêket, bi qasî saeteke çûn, şofer dolmîşê sekinand û hate xwarê. Wî jî ji cihek re telefon vekir, peyivî û paşî hat û birê ketin.

Welhasil hatin gihîştin bajarê Sêrtê. Dolmîş çû nav mahelê, mişteryan danî. Wî xwest ew jî were xwarê, şofêr got ''Tu li vir newe xwarê, ez ê te bibim cihê nêzîkê navenda çarşiyê.'' Ew nehat xwarê. Ji wir birêketin di nav mahlên bajêr de hinek geriyan û li ciheke xewle, şofer sekinî û got ''Li vir were xwarê, di vê kûçê de here, tuyê derkevî serê riya çarşiyê. Belediye nahêle ku dolmîşên ticarî bikevin nav çarşiyê, loma divê tu li vir werî xwarê.'' Ew hate xwarê. Çenta wî di destî de bû. Di çentê wî de kompîtureke biçûk a destan û kamerake biçûk hebû. Ew meşiya, hinek rê çû. Yekî çenta ji destî girt û reviya. Yekî din jî pê re bû. Ji paşve çawan hatin, jikur derketin wî nedît. Lê piştî ku çanta ji destî revandin, wî wan dît. Yên diz bazdan, lê ew li pey wan paz neda, neçû. Wî lez kir û xwe gihaşt serê riya çarşiyê. Li wir însan hebûn, qelebalix bû. Wî ji hevalê xwe re telefon vekir û got ku ew waye li bajarê Sêrtê ye. Keyfa hevalê wî hat. Wî cihê ku lêbû ji hevalê xwe re tarîf kir,

piştî deh deqîqan hevalê wî hat. Hevalê wî ji mahleyeke din ê bajêr dihat. Wan hevûdu dîtin. Hevalî xêrhatin lê kir, hev hemêz kirin û çûn li qahwê rûniştin ku çayeke vexwin û paşê biçine aşxanê, xwarin bixwin.

Li qahwê wî ji hevalê xwe re got ku, dema ji dolmîşê hatiye xwarê û meşiyaye, yekî çente destê wî revandiye û biriye. Hevalî got ”em biçine qereqola polîsan û şikayet bikin. Li vir bûyerên wiha ”qapqaç-bigreûbireve” çênabin, ev çiye.” Wî qebûl nekir ku ew biçine cem polîs û îxbar bikin. Wî ji hevalê xwe re got ”Runiştvanên vî bajarî hemû jî kurd û areb in. Yê ku çentê min bir yan kurd e yan areb e. Ez gilî bikim polîs dikare kesên bêguneh jî bigre binçav û li wan zilmê bike. Ji bo kompîturek û kamerayekê ez naçim gilîya kurd û areban nakim. Xem nîn e, tiştek nabe. Ez ê ji xwe re yên nû bikirim. Li cem me erzan in.”

Wî gilî nekir. Ew li qahwê runiştîbûn, hew dîtin polîsên sivîl û fermî hatin hundirê qahwê. Serekê polîsan got ” Bila herkes nasnama xwe derxe.” Yên li qahwê runiştî nasnameyên xwe derxistin. Wî jî dîsa pasaporta xwe derxist. Polîsan kontrol kirin. Dema polîs pasaporta wî dît û li hevalê ber wî rûniştî nêriya, mûrî tirş û tehl bû û jê re got :
- Nasnameya te ya turk tune?
Wî bersîv da û got :
- Na, tune. Vaye pasaporta min heye bes e.

- Tu hemwelatiyê turk nîn î?
- Na, ez hemwelatî nîn im.
- Tu tirk nîn î?
- Na, ez tirk nînim, ez kurd im. Lê, gelek kesên tirk hene ku li ewropayê ne û hemwelatiyê Tirkiyê nîn in.

Wan wiha xeber didan, polîsekî din di nav qahwê de bi dengê bilind got :
- Di vî bajarî de berê qapkaçtî tûnebûn. Niha li vir peyda bûne û çentên xelkê ji destên wan direvînin. Em li pey wan qapqaçvanan digerin.

Dema polîs wiha got, hevalê wî jî ji polîsê li cem wan bû re got :
- Çentê hevalê min jî ji destî revandine.
Polîs got :
- Nexwe çenteya wî revandine, çima gilî nekir?
- Hevalê min nexwest gilî bike.
- Çima nexwest? Ma hûn piştgirê dizanin. De heydê rabin, bi me re werin qereqolê. Divê em îfadê we bigrin. Ew aciz bû ku hevalî behsa revandina çentê kir û herî pir jî aciz bû ku polîs wan vexwende qereqolê. Wî ji polîs re got :
- Ez şikayetçî nîn im, gilîya kesekî nakim. Loma jî pêwîst nake em werin qereqolê.
- Nabe, divê hûn werin. Tu gilî nekî jî ”kamudavasî” heye, ji bo wê jî divê em îfadên te bigrin. Tu zilamekî bi

şik xuyayî. Divê em ji Ankarê pirsa nasnama te bikin û hêj te berdin.

Polîsan ew girtin û birin qereqolê. Wî kirine odekê û dostê wî kirine odeke din. Li qereqolê polis ji bo diziyê yanî ji bo qapqaçê tişteke nepirsin. Wan xeberê dan masa siyasî a polîsan. Ji masa sîyasî 3 polîsên sivîl hatin û di odek de dest bi lêpirsînê kirin. Pirsa polis a yekem ev bû :
- Çima tu hatî Sêrtê?
- Min Sêrtê nedîtibû, jib o ez bibînim hatim.
- Ma cih qehet bû ku te xwest tu Sêrtê bibînî. Evder bajarekî turîstik nîn e, cihê ku mirov lêbigere û bixwaze bibîne tune. Tu ji bo çiyê Sêrtê bibînî hatî vir.
- Min berê Sêrtê qet nedîtibû, loma min xwest ez bibînim. Ma hatina vî bajarî qey qedexeye?
- Na, lê tu bîlasebe nehatî vir. Tu vî zilamê rojnamevan likur nas dikî?
- Di înternetê de me hevûdu nas kir, em bûn dost û ez hatim serlêdana dostê xwe ku wî bibînim.
- Mirov ji bo dostekî xwe bibîne, pênc hezar kîlometre rê nayê. Dostên me jî hene, kes nayê. Dostan li cihek bêlin, bav û diya me ji ber dûriyê nayên. Ev dostaniya we çi şêwe dostanîye?
- Dostaniya me dostaniyeke rastîn e, dilsoziye.

- Ev zilamê rojnamevan mirovekî nesaxlem e. Ew piştgirê terorîstan e. Ew ji bo rojnama terorîstan rojnamevaniya muxabîrî - nûçegihanî - dike.
- Wî berê ji kîjan rojnameyê re muxabirî kiriye ez nizanim. Dema min wî nas kir, li gor gotina wî, ew muxabîrê rojnama ”Evrensel”ê û ”Vatan”ê bû.
- Na, ew muxabîrê ”Gundem – Rojev” a terorîstan e.
- Tu bêyî biryara dadgehê rojnameke wek terorîst didî nî°andan. Ev tiştekî nerast e û ne zagonî ye. Binêrin ez ji bo diziya çente xwe îfade bidim hatim vir, hûn pirsên din ji min dikin. Wisane, bihêlin ez xeberê bidime avûkatê xwe.
- Avûkatê te heye?
- Belê, heye.
- Li vî bajarî ye?
- Na, yek li Diyarbekir e û yek li Stenbolê ye.
- Çima te du avûkat girtiye?
- Ma çima ez negrim. Waye tu dibînî, li vî welatî tiştên ecêbmayî yên nedîtî têne serê mirov û ji ber xwe ve serê mirov dikeve teşqelê.
- Him…Fêm bû. Tu hatî vir ku li ser rewşa vir rapor amade bikî û li pêşberê Ewropayê Tirkiyê xerab bidî nîşandan.

Li ser van gotinên polîsê sivîl ew ji xwe re ma heyirî. Hersê polîsan weke ku bikevin dorê pirs jê dipirsiyan. Wî jî bêtirs û bêminet bersîva wan dida. Dema polîs behsa amadekirina raporê kir, ew keniya û ji polîsan re got :

- Bila dewleta tirk baş be, demokratîk be, tiştên nebaş pêk neyne ku yên wekî min jî neyên rapor, mapor amade nekin. Binêrin, bawer bikin ez ji bo rapor amadekirinê nehatime û ew kar û îşê min nîn e. Ez ji bo bajarê Sêrtê bibînim û hevalê xwe bibînim hatim vir.
- Tu wiha dibêjî. Ka em biçin ji hevalê te ê rojnamevan bipirsin, ka ew çi dibêje.

Polîsên sivîl ji odeyê derketin, polîsekî ku cilê fermî lêbû hate odeyê û runişt. Ew hinek bêdeng man, polîs got :
- Ev polîsên sivîl zalimin. Xwedê mirov nexe destê wan. Mesele çiye ji min re bibêj, ez ê li vir îfadê te bigrim û dîrek te bişînim cem nobetçî sawcî. Wê demê tu nakevî destê van sivîlan.
- Bi rastî hûn ecêbin. Tu bijî qey ez sucdarim ku tu îfadê min digrî û dişînî mahkemê. Here ji hevalên xwe bipirs bê ez ji bo çi hatime vir? Çima ez li vir im? Hêj were îfadê min bigire.
- Min pirsîye. Dibêjin tu zilamekî bi şik î. Tu yan zilamê ewropiyanî, hatî ji bo wan rapor amade dikî yan jî tu ji bo terorîstan ji hêla sîyasî û rêxistinî ve perwerde bikî hatî vir.
- Na lê…Ka îspata vê tawanbarîyê. Bi şikê ev tişt nabe. Binêr heger hûn bi rastî jî ji min şik dikin, min derxin mahkemê, bila dadgeh biryar bide ku ez sucdarim yan na. Ez ê we û mahkema we rezîl û riswa bikim û li mahkema ewropayê jî doz li we vekim û ji we tanzîmat bistînim.

Van gotinên wî polîs da tirsandin. Polîs rabû, tiştek negot, ji odê derket û çû. Piştî deh deqe derbas bû, hersê polîsên sivîl hatin hûndir û yekî ji wan got :

- Me bi dostê te ê rojnamevan re xeber da. Temam, gotinên we hevûdu digrin. Em ê çend pirsên din ji te bipirsin û dev ji te berdin.

- Bipirsin, lê ez mecbûr nînim bersîva her pirsên we bidim. Pirsên ku hesabê min neyê ez ê heqê xwe ê bêdengiyê bikar bînim.

- Li vir ewropa nîn e. Em çi bipirsin, dive tu bersîvê bidî.

- Ez nemecbûrim û bersîv nadim. Hûn dixwazin min tewqîf bikin û rêkin cem sawcî. Ji xwe bêyî xebera sawcî hûn tiştên weha dikin, ev jî bêqanûnîye.

Wî wiha got û hew dîtin zîla telefona polîsekî sivîl lêket. Polîs bersîv da û got :

- Ez Qomser Sînan. Kerem bike.

Yê telefon kiribû hinek tişt got. Qomser jî got :

- Baş e. Ser çavan Sawcî bey.

Polîs telefonê girt û ji wî re got :

- Xebera Sawcî jê heye ku em li vir bi te re diaxifin.

- Baş e, sawcî kêm bû, bila ew jî bihatana. Ka pirsên xwe bipirsin. Ez birçî me, divê ez biçim û xwarin bixwim.

- Tu li Ewropayê çi kar dikî?

- Ez di fabrîqeyeke de teknîker bum, niha kar nakim. Ez ji xwe re li cîhanê digerim.

- Baş e, biger lê here cihên din, newe wir.

- Çima neyêm? Ev der welatê min e.
- Ev der di bin ala dewleta tirk de ye. Yên ku di bin ala tirk de dijîn hemû jî tirk in.
- Hemû tirk nînin û ez jî tirk nînim. Ez kurdim û ev der welatê min e.
- Li gor yasayên –qanûnên - me kurd, mird tunin. Herkes li pêşberê yasan wekhevin û hemû hemwelatiyê komara Tirkiyê tirk in.
- Ev dîtina fermî ya heştê salan e û êdî îflas kiriye. Karê we tune bibêjin hemû tirkin. Bi gotina we kes nabe tirk.
Piştî minaqeşê, hersê polîsên sivîl rabûn û gotin "Em diçin. Polîsê fermî dê îfadê te bigrin û te berdin. Sibê here, vî bajarî terk bike."

Hersê polîsên sivîl çûn. Polîsê fermî hat û wî bir odek din.
Polîsê fermî got :
- Em ê zeptekî fermî bigrin û tuyê herî.
- Baş e, bigrin.
- Navê te çiye?
- Lokman
- Paşnavê te?
- Polat
- Çi karî dikî?
- Betalim, digerim.
- Tu şikayetçîyî? Yanê giliya yê ku çentê te revandiye dikî? Ew kesê diz were girtin tu jê dawacîyî?
- Na. Ez gilîya wî nakim û jê re dawacî nînim.

- Em ê bûyerê întîkalê sawcî bikin. Ew ê kamu dawasî veke. Encama mahkemê dê ji te re paşî bê şandin.

Polîs kaxizê zeptê nivîsî û pê da îmze kirin. Wî xwest ku nusxeke bidine wî. Lê polis neda. Polîs got :
- Sawcî gotiye îfadê wî ya ku li qereqola polis hatiye girtin, nedinê. Ew ê vê îfadê bibe li ewropayê weke belge li hemberê Tirkiyê bikar bîne.
- Hûn jî, sawciyê we jî ecêb in. Temam, bihêlin ez biçim lazimê tiştek nîn e.

Wî û hevalê wî ê rojnamevan berdan. Hevalê wî doza lêborînê kir û got :
- Xwezî min negotana çentê te revandin. Hindik mabû serê te bikeve teşqelê.
- Tiştek nabe. Êdî tiştê bû, bû, li pey nekev. Heydê em biçine aşxanê û xwarinê bixwin.

Ew çûn aşxanê û paşê çûn mala rojnamevan. Ew şev razan. Di berbanga sibê de deriyê ku ew lêbûn lêket. Ew û hevalên xwe şiyar bûn. Hevalê wî rabû û çû derî vekir. Asker bûn. Hundir tijî asker bûn. Li derûdorê mêze kirin. Fermandarê le°keran Albayek bû. Wî got :
- Îxbara vê malê hatiye kirin.
Hevalî ji Albay pirsî:
- Îxbar ji bo çi hatiye kirin?
- Gotine terorîst hatine vir û tu wan di mala xwe de dihewînî.

- Wisane herderî sah bikin, ka terorîst. Ji xeynê vî hevalî kesek li vir tune. Ew jî terorîst nîn e. Ew li ewropayê dimîne, hêj nû hatiye û ji xwe re digere.
- Ma cih nema ku tê li Sêrtê digere. Heydê em ê we bibine qereqolê û îfadê we bigrin.

Wan ew girtin û birin qereqolê. Li wir îfadê wan girtin. Albay li ser hatina wî ya vî bajarî disekinî. Hatina wî ya bajêr ew aciz kiribû. Di navbera wî û Albay de minaqeşeyeke tund derbas bû. Wî ji dîtinên xwe tawîz neda Albay. Piştê îfadegirtin û minaqeşê, Albay got :
- Divê tu vî bajarî terk bikî. Tu jikur hatî, vegere wir.
- Ez diçim kur naçim kur ez zanim. Heqê we tune hûn wiha bikin. Ev bêqanûnî ye.
- Em te ji vî bajarî dikine derve. Tu ji bo vir xeterî. Niha em ê te berdin. Du leşker hetanî ber dolmîş yan otobusê bi te re bên. Tuyê bilêta xwe bibrî û biçî. Tuyê ji vir biçî kur? Biçî Diyarbakirê?
- Na, ez naçime Diyarbekirê. Ez ê yan biçim Şirnexê yan jî biçime Wanê.
- Riya Şirnexê girtî ye. Tu nikarî biçî wir.
- Wisane ez ê biçime Wanê.
- Çi karê te li Wanê heye? Here Îstenbolê.
- Ez naxwazim biçime Stenbolê. Ez ê biçim li Wanê bimînim û li wan deran bigerim.

Wî û hevalê wî berdan. Du leşker weke mihafiz bi wan re hatin hetanî ber otobusa ku dice Wanê. Wî billet

kirî, xatir ji hevalê xwe ê rojnamevan xwest û li otobusê siwar bû. Ew ji Sêrtê çû bajarê Wanê. Ew li Wanê gelek geriya. Çû kela Xoşabê dît, paşê ew û du hevalên wî li texsiyê siwar bûn ku biçine navça Edremîtê û ji wir biçine girava ''Ax Tamara''yê. Ew li texsiyê siwar bû û texsî birê ket. Ji nav Wanê derketin, cihekî benzînfiroşê hebû. Li wir leşkerên fermî yên dewletê pêşiya wan girtin û ew dane seknandin. Cendirmekî ku ritba wî çawiş bû, li ber deriyê şofêrê texsiyê sekinî û daxwaza nasnameyan kir ku nasnameyên wan kontrol bike. Ew li alî pêş li keleka şofêr runiştîbû. Şofêr û hevalên wî nasnamên xwe derxistin ku bidine çawîş, wî dernexist û ji çawîş re got :
- Îcazeya we ya ku ji sawcî hatiye wergirtin ji bo kontrolê heye?

Dema wî wiha got, çawîş aciz bû û got :
- Erê, îcaza sawcî heye. De heydê nasnaman bidin.

Wî got :
- Ka kaxiza îcazê? Bi min nîşan bide. Hêj em ê nasnamên xwe bidin.

Çawîş dîsa aciz bû. Hevalên wî û bi taybetî jî şofêr gelekî tirsiye û şofêr lerizî. Çawîş ji cem wan çû. Li wî aliyê qumandarê wan sekinîbû. Çawîş ber bi fermandar ve çû. Şofêr got :

- Bavê min, te malik li me xerab kir. Ew ê me bibin, bikine nezaretê û hetanî serê sibê li me xin. Çima te weha kir. Me dê nasnamên xwe nîşan bidana û em biçûna.
- Wiha zirt û pirt kontrol nabe. Divê biryara mahkemê yan sawcî hebe ku hêj werin û kontrola nasnaman bikin.
- Yaw ev der ewropa nîn e. Kîngê keyfa wan bixwaze herderî sah dikin û kontrol dikin.

Çawîş û qumandar bi hevre hatin ber taxsiyê. Qumandar got :
- Kî îcaza sawcî xwest?
- Min xwest.
- Çima xwest?
- Çima nexwazim? Ez çi zanim hûn kîne? Bi rastî leşkerin yan nînin.
- Ma tu cil û lîbasên me nabînî.
- Li çarşiya rusî a bajêr cil û lîbasên leşkerî bi pênc lîran difroşin.

Qumandar lê mêze kir. Hevalên wî û şofêr tirsiyabûn, zerûzûwa bûbûn, lê qet xema wî nebû. Qumandar ji berika xwe kaxiza îcazê ya sawcî derxist û da destî. Wî kaxiz xwend û got :
- Temam. Gelî hevalan nasnamên xwe derxin, bila fermandar lê binêre.

Nasnama hevalên wî û ya şofêr ji xwe di destê wan de bû. Wan dane qumandar. Wî jî ji berika xwe pasaporta

xwe derxist û da destê qumandar. Çawa ku qumandar pasaporta ewropayî dît, got :
- Him…Anlaşildi (Him…Fêm bû.).


Qumandar qet paşaportê venekir û li nav mêze nekir. Nasnaman û paşaportê da wan û got :
- Tamam. Birêkevin! Herin!


Texsî birê ket.
Şofer got :

- Şikûr em ji destê wan xelas bûn. Heger ev pasaport nebûna, wan ê anebûyî, ecêba giran bianiyana serê me.

Wî jî got :

- Binêrin ev dewlet qîmeta ku dide ewropiyan û kesên li ewropayê dimînin, ewqas qîmet nade hemwelatiyên xwe. Dewleta ku xwedî vê mentalîteya şaş be, dê çawa di nav hemwelatiyên xwe de wekhevîyê pêk bîne û dê çawa bibe demokratîk..


Lokman Polat
Çîrokên Rengîn


Bayê Azadîyê
Lokman POLAT
Weşanên Çanda
Nûjen
(Modern Kultur Förlaget)